

AKADEMIYA ÎSMAÎL BEŞÎKCÎ

2019 PAYÎZ



iBV

AKADEMIYA ÎSMAİL BEŞİKCİ

Akademiya Îsmaîl Beşîkcî 2019 Payîz I
WEŞANÊN WEQFA ÎSMAİL BEŞİKCİ

Koordinatora Bernameyê û Amadekirina Bo Çapê:
Kübra Sağır

Redaksiyon:
Cumhur Ölmez

Berg & Mîzanpaj:
Şener Özmen

Çapa Yekem: 2021

ISBN: 978-605-9073-49-3

Çap:
Ege Reklam ve Basım Sanatları San. Tic. Ltd. Şti. Esatpaşa
Mah. Ziyapaşa Caddesi No:4/1 Ataşehir / İstanbul Tel: 0216
470 44 70 Faks: 0216 472 84 05 Sertifika No: 45604



WEQFA ÎSMAİL BEŞİKCİ
Kuloğlu Mah. İstiklal Cad. Ayhan İlk Sok.
ÎSMAİL No: 21 – Beyoğlu / İstanbul
BEŞİKCİ 0 (212) 245 81 43
VAKFI www.ismailbesikcivakfi.org

- f** [ismailbesikcivakfi](https://www.facebook.com/ismailbesikcivakfi)
- t** [@ibesikcivakfi](https://twitter.com/besikcivakfi)
- @** [@ismailbesikcivakfi](https://www.instagram.com/ismailbesikcivakfi)
- ü** www.youtube.com/user/ismailbesikcivakfi
- E-mail:** info@ismailbesikcivakfi.org

NAV E ROK

PÊŞGOTIN
Kübra SAĞIR / 5

REXNE, WEK NAVEROKEKA NÛJENÎYÊ
Li Ba Ronakbîrêñ Kurd ên Dewra Stenbolê Helwesta Rexneyî
Remezan ALAN / 7

TEVGERA KURD A LI STENBOLÊ DI DESTPÊKA SEDSALA 20AN DE
Tahîr BAYKUŞAK / 33

PERWERDE Ú ÎNŞAKIRINA NASNAMEYA NETEWEYÎ:
FRANSA Ú TIRKÎYE
Nurettin BELTEKİN / 51

NÎQAŞÊN KURDAN YÊN LI SER ALFABE Ú NETEWESAZÎYÊ
Mikail BÜLBÜL / 63

DU KELAMBÊJÊN JIN YÊN YARSAN: MAMA CELALE Ú REMZBAR
Sevda ORAK REŞİTOĞLU / 73

PÊŞGOTIN

Sosyolog Îsmaîl Beşîkciyê ku navê xwe daye Weqfa Îsmaîl Beşîkci, ji salên 1960î heta îro ji ber xebatê xwe yên akademîk ên li ser Kurd û Kurdistanê rastî gelek astengiyên azadiya derbirînê û azadiyên akademîk hatiye; ji zanîngehan hatiye dûrxistin û çend salên emrê xwe li girtîgehêna cuda derbas kiriye. Weqfa Îsmaîl Beşîkci, ya ku ji bo parastina mîrateyên wî yên maddî û manewî hatiye avakirin, parastina azadiya derbirînê, parastina azadiyên akademîk, û piştgiriya qada Xebatên Kurdî ji xwe re kiriye armanc. Bi salan e ku weqf bi panel, semîner û konferansan, bi weşandina pirtûk û kovaran hewl dide van mîsyonên xwe bi cih bîne. Di sala 2019an de jî weqfê biryar da ku salê du caran bernameyên bi navê “Akademyên Îsmaîl Beşîkci” yên bi zimanên tirkî û kurdî li dar bixe.

Weqfa Îsmaîl Beşîkci, ya ku ji sala 2019an vir ve, salê du caran bernameyên akademiyê li dar dixe, di mehêni biharê de “Akademyên Biharê” yên bi tirkî û di mehêni payîzê de jî “Akademyên Payîzê” yên bi kurdî pêk tîne. Akademî heta niha wekî bernameyên 7-8 hefteyî hatine amadekirin, xwendekar bi serîlêdanê hatine qebûlkirin û ji wan hatiye xwestin ku bi awayekî birêkûpêk besdarî hemû pêşkêsiyan bibin. Di van bernameyan de hatiye hewldan ku mijarêna qada Xebatên Kurdî yên li zanîngehan Tirkîyeyê cih nabînin, nayêna an jî nikarin werin nîqaşkirin, li derdoreke azad werin pêşkêskirin û nîqaşkirin.

Ev kîtêba li ber destê we di encama Akademiya Îsmaîl Beşîkci de derketiye meydanê ku di payîza sala 2019an de ji aliyê Weqfa Îsmaîl Beşîkci ve hatiye birêvebirin. Bernameya Akademiya Payîzê ya 2019an yekem akademiya bi kurdî ya Weqfa Îsmaîl Beşîkci ye. Bernameya akademiyê ji 8 hefteyan pêk hat; bi giştî 8 akademîsînan ders dan û 32 xwendekarên lîsans, lîsansa bilind û doktorayê bernâme bi rêkûpêk temam kirin. Di bernameyê de mijarêna cuda yên qada Xebatên Kurdî, yên bi sernavêna “Standardîzasyon û Netewebûn”, “Bawerî û Jinê Helbestvan”, “Arşîvên Farisî û Kurd”,

“Helbest û Netewe”, “Perwerdehî û Nasname”, “Rola Rexneyê”, “Netewesaziya Kurdan”, “Sînema û Nasname” cih girtin. Di dawiya akademiyê de ji akademîsyenan gotarêن li ser mijarêن wan hatin ricakirin û 5 akademîsyenan bo vê pirtûkê gotar nivîsandin.

Ji bo avakirina şertên bingehîn ên pêkanîna vê bernameyê spasiya mamoste Îsmaîl Beşîkcî û desteya mutewellî ya WÎBê; herwiha ji bo alîkarî û piştgiriyyê wan ên xurt spasiya desteya rêveberiyê û xebatkarêن WÎBê dikim. Di dawiyê de jî spasiya akademîsyen û xwendekarêن beşdar yên Akademiya Payîzê ya 2019an dikim ku me bi hev re demên gelek xweş derbas kirin û em gelek tiştan ji hev hîn bûn. Em hêvîdar in ku bernameyên akademiyan û ev pirtûk tevkariyekê girîng li qada Xebatên Kurdî bikin.

Kübra Sağır
Adar 2021, Stenbol

REXNE, WEK NAVEROKEKA NÛJENÎYÊ*

Li Ba Ronakbîrêñ Kurd ên Dewra Stenbolê

Helwesta Rexneyî

Remezan ALAN

1. Destpêk

Di navbera “serdema nû” û “rexne”yê de têkilîyeka nêzîk heye. Heta hin xebat di wê iddiayê de ne ku nûjenîyên vê serdemê bi xêra helwesteka rexneyî rû dane. Nerazîbûna ji dinyaya heyî gava di warêñ dîn, exlaq, sîyaset, huqûq, huner, felsefe, edebîyata kevin hwd. de bûne helwestek, jê dinyayeka nû çêbûye. Bo nimûne ji van xebatan *Childiren of the Mire*¹ di mehneya fireh de ji bo edebîyatê û di ya teng de ji bo helbestê îddia dike ku li ber tradîsyonên heyî, ew tebîetê “reddê mîrasê”, ji bo tradîsyon û meylên nû yên edebîyatê bûye faktorekî mezin.² Li gor Octavio Paz redkirin, zîrweya îhtirasên modernbûnê ye, ferqa serdema modern jî ji serdemên dîtir, di vê gavê de derdikeve meydanê, ji ber ku modern, ji rexnekirina rabirdûya nêzîk diwelide, bi vî awayî hunera modern tenê nabe zaroka serdema modern, di heman demê de dibe rexnegirê bi xwe jî.³ Jixwe bi vê riwangehê Paz ji romantîkan bigre heta avangardan, xwendineka hûr dike ser helbestê û wan rê û ekolêñ cuda yên helbesta modern, bi dîyardeya vê reddê mîrasê re têkildar dibîne.

Dîsa xebata *Critique de la Modernité*⁴ cihekî navendî dide rex-

* Ev gotar, ji notêñ semînera me ya Akademîya Payîzê ya li Weqfa Îsmaîl Beşîkcî ya Stenbolê (14.12. 2019) û ji hin notêñ teza me ya doktorayê hatîye hilberandin.

1 Bnr. Octavio Paz, *Çamurdan Doğanlar*, wer. Kemal Atakay, (İstanbul: Can Yay. 1996). Ev xebat ji bo tirkî wek *Çamurdan Doğanlar* hatîye wergerandin, lê bi kurdî mirov jê re bibêje “Zarokêñ Herîyê” dê şas nebe.

2 Ev fikir xasma di cerîbîna ewil a bi navê “Kendisine Karşı Bir Gelenek” [Nerîteka Li Dijî Xwe] de (13-27) tê ziman.

3 O. Paz, hb., r. 13, 14, 15.

4 Bnr. Alain Touraine, *Modernliğin Eleştirisî*, wer. Hülya Tufan, ç. 5, (İstanbul: YKY, 2004).

neyê. Gava ew serborîya modernîteyê ji alîyê dîroka çandî ve êwr bi êwr destnîşan dike, bi awayekî rasterast nebe jî di kêşeya newekhevî, bêedaletî, pûçbûna dêr, despotîzma monarşîyê, amraz û awayên hilberînê, rûdana şoreşan, çêbûna rêkeftinên civakî (makezagon) hwd. de rola itirazên rexneya civakî û sîyasî teslîm dike. Li gor Alain Touraine fikra modern, encameka redkirina huqûqa berê, redkirina adet, bawerî, rêveberî û bi kurtî dinyaya maddî û manewî ya kevin bû.⁵

Ger ji bo kurdan serê sedsala 20an, zemanê peydabûn û guftûgo-kirina fikr û meylên modern be, ku wisa ye, divê di nav ronakbîrên kurd de helwesteka ku ji dinyaya berê ne razî ye, hebe. Bi bawerîya me rexneyeka wisa li ba qelemşûr û ronakbîrên kurd ên sedalsa 20an heye û armanca gê gotarê jî destnîşankirina vê yekê ye. Em ê ji vê helwesta wan çend mînakân (rexneyê wan ên ji bo ulema û umeraya kurd; perwerde û elifbaya heyî; sistema merkezî û ceber-rût; békêriya edebîyata berê) destnîşan û guftûgo bikin.

2. Cih û Serdema Vê Rexneyê

Ger ji bo kurdan behsa serdemeka modern bê kirin, dê ew serê sedsala 20an be û dê cihê wê jî Stenbol be. Seba ku me bi xebatêñ cuda cuda çendîn caran vê dewrê û û vî mekanî teswîr û pêname kirîye,⁶ em ê cardin nekevin nav agahîyêñ hûr û ji bo mijara xwe niha bi kurtî wiha bibêjin:

Belê serdema modern ji bo kurdan -hinek derengmayî jî be- serê sedsala 20an e. Ji ber ku tezahûrên wê yên ketine nav rûpelên kaxêzan, bi çapemenîya kurdan re berbiçav dibe û dirûvê gotarekê (discourse) werdigire. Xwedîyê vê gotarê jî “ronakbîr” in. Yanî ew kes in ku bi mearifê/perwerdeyê hiş û bîra wî “ronî” bûye.⁷ Em dizanin ku di nav kurdan de ev kes berê “arîstokratêñ xwenda” û “ehlê medreseyê” bûn. Lê bi “mektebêñ cedîd”, yanî bi dibistanêñ nû re

5 Mirov dikare bibêje ku hevokêñ jorîn, kurteya beşen “Yıldızı Parlayan Modernlik” [Modernîteya Stérgeş] (23-105) û “Modernliğin Bunalımı” [Qeyrana Modernîteyê] (109-222) ya xebata Touraine in.

6 Bnr. Remezan Alan, “Qonaxa Stenbolê di Edebîyata Kurdî ya Modern de”, *Nûbihar Akademî* 3, (2017): 41-63; Remezan Alan, *Keşkûl*, (Stenbol: Peywend, 2019), 19, 20, 118, 119, 120.

7 Jixwe “ronakbîr” an “rewşenbîr” a kurdî wekî têgehêñ “enlightened” a ingilîzî, “éclairé” ya frensî, “munewwer” a erekî û “aydin” a tirkî li ser heman bingeha hevpar (ron/rewşen, light, éclair, nûr, aydinlik) e. Bi heman ferasetê ji wan jî têgehêñ wek “Ronakgerî”, “Enlightenment”, “Tenwîr”, “Aydinlanma” hatine dariştin.

(wek harbîye, tibbîye, mulkîye, darûlmuellîmîn) hinekêن dî li vê zumreyê zêde bûn û wan xwest ku li ber “esrêkî mutereqqî” (serdemeka pêşketî) miletê xwe hişyar bikin. Ji ber ku bi raya wan dem, dema hişyarbûna miletan bû. Belê ihtiyyatek heye di rengê “aman ji bo uxûuweta millî (biratîya neteweyî), biratîya dinî ji dest neçe” an “pêşî misilmanî, piştre ereb, tirk, kurd an ecembûn” de...⁸ Lêbelê di nav vê ihtiyyatê de dengên ku aîdîyetê, yanî hîssa millî, dikirin nav xîmê pêşketineka teknîkî ya ewrûpî jî hebûn. Bo nimûne kesê ku îmzeya Xarpütlî H.B. bi kar dianî, digot ku pêşverûbûna Protestanîyê û fikra azad a Voltaire şiklek daye fikra netewetîyê û her ku li Frense û Almanyayê hîssên frensî û elmanî rû dane, di zanist, teknîka şer, senayî û ticaretê de reqabet û pêşketineka mezin çêbûye di vana miletan de û niha ev hesta millî belavî nav mesihîyê Şerqê bûye û ber bi alema îslamê vê jî tê û eve li ba ‘erebê Misirê, teterê Rûsyayê guhertinêñ mezin çêdike û hêvî ew e ku ev hîssên han di nav kurdan de jî bibe sebebê hişyarîyekê.⁹

Di nava van “hişyarker” an de lewma piştî demekê naşîr û mesûlê rojnameyan (wek Suleymanîyelî Tewfîq/Pîremêrd, Ahmed Ramîz û Huznî Mukrîyanî, Mewlanzade Rifat, Hemzeyê Muksî); doktorê tibbê (Abdullah Cewdet, Şukrî Sekban, Fuad Berxo, Mustafa Şewqî); ji mulkîye û huquqê mezûn (Babanzade Ismaîl Haqqî, Ahmed Cemîl, Suleymanîyelî Mes’ûd, Silêmanî ‘Ebdulkerîm, Suleymanîyelî Tewfîq, Mewlanzade Rifat, Emîn Alî Bedirxan); herbîyyeyî (wek Memduh Selîm Beg, Îhsan Nûrî, Ekrem Cemîlpaşa); muhessîb û mamoste (wek Xelîl Xeyalî û Hemzeyê Muksî)... peyda bûn. Û van kesan jî ji bo pêdivîyêñ serdemê (bi gotina wan *ihtiyacât-i asriyye*) komele ava kirin, rojname û kovar derxistin. Ji kengê heta kengê? Ji derketina rojnameya *Kurdistanê* (1898) û heta şikestina Serhildana Şêx Seîd û qedexekirina hemû faalîyetêñ kurdan (1925).

Belkî sebeb pirr bûn ku ev kes li Stenbolê li hev kom bûbûn, lê dê jê du sebebêñ sereke têrî me bikin: Ya pêşî polîtîkayêñ merkezîperest in ku ji dewra Mehmûdê Duyem dest pê kiribû û heta Meşrûtiyete Duyem hatibû. Gava Dewleta Osmanî di warê idarî û aborî de merkezîbûnê kir polîtîkayek, ji bo reformêñ Tenzîmatê, çav berda

⁸ Bnr. Babanzade Ismaîl Haqqî, “Kürdlerin Tealisi”, *Rojî Kurd* 3 (1 Ağustos 1329/1913): 3, 4; Lutfî Fikrî, “Kurd Milliyeti”, *Rojî Kurd* 4 (30 Ağustos 1329/1913): 3,5; Kerkûklî Necmedîn, “Kurd Ulemasına”, *Hetawî Kurd* 1 (11 Teşrîn-î Evvel 1329/ 1913):13.

⁹ Xarpütlî H. B. “Garbla Şark, Millîyet Cereyanları”, *Rojî Kurd* 1 (6 Haziran 1329/1913): 8-9.

dahata erdêñ kurdan û bi demê re zemîna huqûqî ya navbera kurdan û tirkan (rêkeftina Îdrîsê Bedlîsî û Sultan Selîm) ji nav bir. Mîr û begêñ kurdan nerazîbûna xwe bi serhildanêñ lokal nîşan dan, lêbelê di tevan de jî kurd şikestin. Li Silêmanî mîrêñ Baban; li Rewandûzê, Soran; li Colemêrgê, Hekarî; li Amêdîyê, Behdînan, li Cizîrê, Azîzî ji holê rabûn... Piranîya van mîrektîyan tevî malbatêñ xwe sirgûnî Stenbolê bûn. Di encamê de ji wan û zarokêñ wan re meaşek hat girêdan, lê bi hemû dahatêñ xwe ve teserrûfa erdêñ wan ên otonom derbasî xezîneya osmanî bû. Bi vî awayî hem mekanê arîstokrasîya kurdî guherî û hem jî li Kurdistanê bajarek nema ku ew ji daxwazêñ îdarî û edebî re bibe navendek.

Sebebê duyem jî ew bû Stenbol mîna paytexteka emperyal, cihê çapemenî, dibistanêñ nû, ticaret, moda, nîqaşen fîkrî, hemû elîtên kêmar û heta stargeha sirgûnêñ bîyanî bû. Cihêñ wisa dibin derîyê îqbala şexsî û edebî jî. Hatina kesen wekî Koyî, Nalî, Mehwî, Suleymanîyelî Tewfîq, Keyfî ji bo Stenbolê, di vê çarçoveyê de dikare bê dîtin û şîrovekirin.

Em niha dikarin derbasî nav çend alîyêñ wê helwesta rexneyî bibin.

3. Çend Alîyêñ Vê Rexneyê

3. 1. Di Paşmayîna Kurdish de Rola Ulema û Umeraya Kurdish

Nerazîbûna ji dinyaya berê, xwe û kirinêñ xwe jî dihewîne. Lewma beşeka rexneyêñ kurdan derbarê wan bi xwe de ye. Cehalet sebebekî paşmayîna demê ye û di vê yekê de rola kurdan çi ye? Ev yek bi awayekî eşkere û reel ketîye nav ferhenga ronakbîran. Ji wan gelek kesan, cehaleta heyî bi kurdan ve girê dane, ya rast bi hinek zumreyêñ wan ve têkildar dîtine. Ev zumre, mîna du girseyêñ tradîsyonel, ulema û umera ne. Bi gotineka dî muxatebêñ van rexneyan, şêx û mela û mîr û begêñ kurdan in. Ev herdu zumre, heta destpêka sedsalâ 20an jî xwenda, xwedî û mesûlêñ miletê kurd dihatin dîtin û pînasekirin. Eve ev zumre, ji alîyê komek xwendayêñ nû ve, ji alîyê ronakbîren demê ve, ku ew bi perwerdeyeka “esrî” rabûbûn, di derceyâ tawanbarkirinê de dihatin rexnekirin. Lîbelê “derbasok”ek jî heye berîya vê rexneyê. Mirov dibêje wek rengekî muxalefeta dewra Abdulhemîd û helwestekî tîpîk ê dewra Meşrûtîyetê, sebebekî cehaleta nav kurdan diçû dibû para îstibdadê û îhmal û nîyetxirabîya bûrokrasîya osmanî jî. Şopa vê rexneyê bêtir di rojnemeyêñ vê derbasokê de (*Kurdistan û Kurd Teawûn û Teraqqî*) tê dîtin.

Bo nimûne, Suleyman Nazîfê ku piştre bûye îttihatçîyek, di vê

dewrê de bi dengekî gelek sert digot ku roja ku kurd bi tercîha xwe (çarsed sal berê) tevî osmanîyan bûne, çend îstisna ne tê de, tu car rûyekî dilovan nedîtine, ji xeynî zilm û heqaretê tiştek neketîye destê wan, hal ew e ku wan ji bo Dewleta Osmanî ne tenê ked dane, xwîdan û xwîn rijandine, serpêhatîyên herba ûris, cenazeyên wan ên li binê sûrêni Wienayê û keleha Girîdê îsbata vê yekê ne, de bila êdî Hikumeta Osmanî wezîfeya xwe bîne cî, mafêن wan ên insanî û ihtiyyacêن wan ên medenî dabîn bike.¹⁰

Bi raya Bedîuzzeman Saîdê Kurdî (ji nivîs û bîranînen wî yên rojnameya *Kurd Teawûn û Teraqqî* û ji hinek rîsaleyên wî yên wek *Nutuk*-1910-) kurd herî zêde ji îstibdadê zirarê dîtine; cehalet û wehşeta li nav wan, qebehetê hikumetê ye û ger li Kurdistanê ew medreseyên wêranbûyî cardin îhya nebin, dê ev yek berdewam be.¹¹ Seîdê Kurdî ji ber axaftin û daxwazên xwe yên ser vê istiqametê, ji alîyê rêveberîya demê ve wekî meczûbek sewqî tîmarxaneyê jî bûbû.

Dîsa bi raya Xelîl Xeyalî sebebê wêranbûna welat, sefaleta we-latîyan û têkçûna şahî û bextyarîyê, tev îstibdad bû. Îdareya mustebîd kurd ji xwendinê, ticaret û zîraetê mehrûm hiştibû û wan eşqîya nişanî dinyayê dabû.¹²

Li gor Seyyah Ahmed Şewqî zeîfbûna dîn û karêن dewletê, perişanî û feqîrî, tunebûna perwerde û xwendinê, hindikîya sen'et û ticaretê, hebûna zordestî û bêtifaqîyê, tev para îstibdadê bû.¹³

Lê ji bo texribatêن îstibdadê û burokrasîya osmanî, gotinêن Babanzade Ismaîl Haqqî (ku demekê bûbû wezîrê perwerdeyê) gelek teswîrker in. Li gor wî hatina meşrûtiyetê ji bo kurdan jî “berhemekî nûbûnê” (bir eser-i teceddûd) anîbû meydanê û divê kurd bi şev û roj bixebeitîna. Dê ji kû dest bi xebatê bikiranâ? Ismaîl Haqqî vê girîngîyê wiha dianî ziman: “Pêşî perwerde, piştre dîsa perwerde. Piştre? Elbet dîsa perwerde, dîsa perwerde, dîsa perwerde.”¹⁴ Lê berî

10 Suleyman Nazîf, “Kûrd ve Kûrdistan”, *Kûrd Teavün ve Terakkî Gazetesi* 2 (29 Teşrîn-î Sanî 1324/1908): 9.

11 Ji bo hûrgilîyêن van agahîyêن giştî bnr. gotar û bîranînen wî yên rojnameya navborî (wek “Bedîuzzaman Molla Saîd-i Kurdînin Nasayıhi”, “Kûrdler Neye Muhtac?”, “Îfade-i Meram”, “Nutk-ı Sabıkın Neticesi”, “Molla Saîd-i Kürdînin Timarhane Hatıratı”) û “Nutuk”, dnd. *Îçtimaiî Dersler*, (İstanbul: Zehra Yayıncılık, 2006), 9-35.

12 Xelîl Xeyalî, “Weten û Îttifaqa Kurmanca”, *Kûrd Teavün ve Terakkî Gazetesi* 8 (10 Kanun-u Sanî 1324/1909): 69.

13 Seyyah Ahmed Şewqî, “Gelî Welatîyan”, *Kûrd Teavün ve Terakkî Gazetesi* 2 (29 Teşrîn-î Sanî 1324/1908): 16.

14 Babanzade Ismaîl Haqqî, “Kûrdler ve Kûrdistan”, *Teavün ve Terakkî Gazetesi* 1 (22 Teşrîn-î Sanî 1324/1908): 3.

bigihîje vê encamê destnîşan dîkir ku dewra îstibdadê ji her kesî re, lê bêtir ji kurdan re xerabî anîbû; wan hem cahil û bêziman hiştibû û hem jî gelek îsnadên xirab li wan bar kiribû; îstibdad hem bûbû dijminê fikra kurdî û hem jî dijminê zimanê wan; vê rêveberîyê hewil dida ku pêşî zimanê kurdan û piştre jî serê wan jê bike. Bi vê guvaşê li hemû Kurdistanê cehaleteka bêhesab/fahiş rû dabû, gelek kurd ji insanîyetê derketibûn; ji ber wehşet, cehalet, bênesîbîya rêgezên mezheb û bawerîyê, ne tenê hebûna wan biketa metirsîyê, hindik mabû şeref, heysîyet û namûsa wan a millî jî lekedar bûbûya.¹⁵

Lê piştre di weşanên wekî *Rojî Kurd*, *Hetawî Kurd*, *Jîn*, *Serbestî*, *Kurdistan* (kovar) de em dibînin ku tîrên van rexneyan berê xwe dane ulema û umeraya kurdan. Gerçî berîya gotarê van rojname û kovarê kurdî, divê îstidradek ji bo naveroka hin helbestê Hacî Qadirê Koyî bê danîn. Lewra çi helbestê wî yên ku bi awayekî serbixwe çap bûne û çi yên ku di nav gotarê hinek ronakbîran de mîna referans cih girtine (Xelîl Xeyalî, M. Midhat Bedirxan) rexneyeka wiha dihewînin. Belkî Koyî hêj li Koyê dest bi rexnekirina vê zumreyê kiribû, lê wisa dixuye hatina wî ya li Stenbolê, dîtina pêşketina dinyayeka nû, di vê pêşketinê de pêşengîya zumreyêñ xwenda û gewremalan, dereceya rexneyêñ wî dijwartir kirîye. Em ji bo wan helbestan dikarin bibêjin ku Koyî di çarvoyeka teng de (neteweyî) gava li pratîka hinek şêx û melayêñ kurdan dinihêrî, didît ku xwedîyê fitûyêň şaş û sûdperest bûn; çavbirî, nezan, kedxwir û doxînsist bûn; aşê wan bi ava xelkê digeriya û ji alîyê ilm û merîfet û sermayeya kurdî ve reş û rût bûn. Alimên çak ji zû de bûbûn mîvanê mewtê, yên sax jî ustâdên farisi û tazi/erebî bûn, heta hinek jê gihiştibûnn şan û asta Razî, lêbelê seba ku sermayeya wan malê xelkê bû, wextê mirin çûn, ew sermaye jî bi wan re hîç û pûç bû çû.¹⁶ Di çarçoveya fireh de (ummetî) jî Koyî pratîka vê zumreyê musteheqî rexnekirinê didît. Ji ber ku bi vê halê xwe, ew ne tenê bûbûn felaketa qewmê xwe, ji bêferasetîya wan xaka islamê jî tarûmar bûbû ku di serdema heyî de Hindistan, Buxara, Daxistan, Qazan û Qirim û ehlê van bajaran ji barê kafiran re bûbûn ker.¹⁷

Herçî umeraya kurd, yanî mîr û begên kurdan bûn, ew jî di behsa mileti de gunehkar bûn li gor Koyî. Çinku ew ji pêşengîya miletê

15 Babanzade Ismaîl Haqqî, heman nivîs, 3, 4.

16 Ji bo halê têkûz ê çapa helbestê Koyî, bnr. Hacî Qadirî Koyî, *Dîwanî Hacî Qadirî Koyî*, (amd.) Serdar Hemîd Mîran&Kerîm Mustefa Şareza, (Sine: İntisaratî Kurdistan, 2012). Ji bo naveroka destnîşankirî bnr. 238.

17 Bnr. Hacî Qadirî Koyî, heman berhem, 203, 204.

xwe dûr ketibûn, cewherê wan kor bûbû. Hal ew e ku serdem, serdemâ hişyarbûna miletan bû, heta çend miletên ku ji alîyê kemîyetê ve bi qasî du sê eşîrên kurdan ançax hebûn, ji bo serxwebûna miletê xwe karên mezin kiribûn, lê umereya kurd di xeweka giran de bû. Tenê di vê meseleyê de wisa bûn? Nexêr sermayeya “kitêb û defte-ra kurdî” de jî têk çûbûn, lewra mîna ku me niha gotî ew jî wekî ulemaya kurd ummîyê zimanê xwe bûn. Dîrok bi mînakêñ kurdêñ mezin tije bû lêbelê ji ber “bêdefterîya zimanê xwe” eynî dîrok wan li goşeyekî winda û fanî qeyd kiribû, hal ew e ku şêx û mela jî tê de, wan mîr û emîran bi zimanê xwe mistûmel bikirana, heta roja mehserê nav û nîşanê wan dima.¹⁸

Bêguman rexnekirina ulema û umeraya kurdan, ji vê destpêkê heta roja me di nav xeteka domdar û seqamgîr de hatîye. Li vir ne wext têrî dike û ne jî peywenda me destûr dide ku em tevan destnîşan bikin. Lewma ez ê çend libêñ dî yên temsîlkar û destpêkê, bînin ziman û vê behsê temam bikim.

Mirov dikare bibêje piştî mirina Koyî du sal şûnde vê carê di rojnameya *Kurdistanê* de şopa vê rexneyê xuya dike. Xwedîyê van rexneyan vê carê Midhat Bedirxan e. Li gor wî ulema û umeraya kurd, ji pêşketinêñ dinyayê bêxeber in, nizanin ka di serdemâ wan de çerxa dinyayê çawa digere, li dinyayê çi dibe. Bi ser de ew pere xerc nakin ku li gund û navçeyan ji bo zarokêñ wan û feqîran dibistan û medrese vebibin. Li gund û bajarêñ misilmanêñ dî “mekteb, medrese û cerîde” hene, lê kurd ji vê yekê bêpar in, nikarin rojnameyekê bixwînin. Sebebê nezanîya nav kurdan, sersarî û bêxemîya mîr û axayêñ wan in. Tu qusûr tuneye ku zarokêñ wan hem xwendina mishefa şerîf û hem jî ya rojnameyan bizanibin.¹⁹

Kerkûklî Necmedîn bi du gotarêñ ku rasterast bangî ulemaya kurd dike, tev li vê rexneyê dibe. Di ya pêşin de dibêje ku ulema gava ji bo qewmê xwe bişixulin bi ser dikevin, çinku gava mirov waqîfi cografya, temayûlêñ siruştî û îtîqadêñ qewmê xwe be, xizmet çêdibe. Dê misilmanekî Bexdayî çawa halê yekî Buxarayî bizanibe? Ew bi delîlêñ neqlî û ‘eqlî ji bo bextewarîya miletê xwe bişixule, çêtir e. Eve xort û ronakbîrêñ kurdan bi vê hesîyane, bila ulemaya kurd jî bizanibe ku serdem, serdemâ medenîyetê ye. Madem ew dibêjin em “warisê nebîyan” in, bila doza wezîfeya rizgarkeriyê bikin, bila teblîxê bikin. Ger li Kurdistanê bi hemû mehneya xwe evîna

18 Koyî, hb.152, 153.

19 Mîqdad Midhat Bedirxan «Bîsmîlahîrrehmanîrrehîm», *Kurdistan* 1 (9 Nisan 1314/1898): 1-4.

neteweyî ava bûbuya, li nav xelkê şer û pevcûn çênedibûn û kurd ji alîyê aborî û ilmî ve ewqas bêpişt nediman.²⁰

Rexneya Kerkûklî di gotara duyem de tûjtir e. Lewra dibêje ku ger mirov ji kurdan bipirse ka li Kurdistanê çi xizmeta aliman çêbûye, dê bersiva wan “qet” be! Lewra yên herî jîr dema tehsîla xwe temam dikin berê xwe didin Stenbolê ji bo meaşekî, her wekî xizmeta wan tenê bi pereyan çêbibe. Dema roja ezabê hat, dê ew ji vî gunehî bêñ pirsîyarkirin. Dê ew jî poşman bibin ka çima xizmeta milletê xwe nekirine, lêbelê dê poşmanî fayde neke. Dîn dibêje pêşî xizmeta xism û eqrebayên xwe bikin, lê alimên kurdan vîya şaş fêm dikin. Tênaçihin ku miletê wan jî eqrebayên wan e.²¹

Li gor Qazîzade Mistefa Şewqî jî qet ne zehmet e ku reîs, ulema û dewlemendêñ kurdan bo mindalan mekteb ava bikin. Ger dewlemendêñ bajarê Seblaxê (Mahabad) her yekî salê du tumen bida, di nav salekê de bi wî pereyî dibistanek dirist dibû, mamosteyekî çak peyda dibû û kare xwendinê jî diçû serî, lêbelê ew reîs, ulema û dewlemend wisa nakin.²²

Xelîl Xeyalî jî di wê bawerîyê de ye ku gunehê paşmayîn û cehal-leta kurdan, di stûyê ulema û umeraya kurdan de ye. Di *Rojî Kurd* û *Hetawî Kurd* de bi nasnavêñ Modanî X. û M. X. nêzikî heft gotarêñ wî li ser vê şopê ne.²³ Di van herdu kovaran de, piçek jî di bin tesîra fikrêñ Hacî Qadirê Koyî de, Xeyalî rasterast berê xwe dida van her du zumreyan. Ji ber peywenda sînorkirî em naveroka gotara yekê, mesela ya “Bextreşî û Mehrûmîya Kurdish” neqil bikin meqsed hasil dibe. Li gor Xeyalî şêx, mela, feqe, mîr, serek û rîspîyêñ kurdan, nabînin ku îro agirekî çar alîyê kurdan girtîye, qenc û xirab herkesî dişewitîne, lê kes di hewara kurdan de nayê. Ewêñ ku kurdan xelas bikin dê dîsa pêşiyêñ kurdan bin ku ji miletê xwe re “medrese”yan çêdikin. Jixwe li ser rûyê erdê çiqas dewlet û milet hene hemî yekdil û yekrû, yekziman, bi şev û roj ji bo pêşcûna miletê xwe kar dikin.

20 Kerkûklî Necmedîn, “Kurd Ulemasına”, *Hetawî Kurd* 1 (11 Teşrîn-î Evvel 1329/1913): 10-13.

21 Kerkûklî Necmedîn, “Kurd Ulemasına-2”, *Hetawî Kurd* 2 (21 Teşrîn-î Sanî 1329/1913): 12.

22 Qazîzade Mistefa Şewqî, “Mekteb Çî ye?”, *Hetawî Kurd* 3 (29 Kanun-u Evvel 1329/1914): 30, 31.

23 Xeyalî di *Hetawî Kurd* de bi “Ji Mezinê Kurdish Ra Ye”, “Derdê Kurdish”, “Ji Qesîdeyê Hacî Rehmetî Têne Zanîn Ku” ev rexne û mijar domandîye. Heta navê du gotaran eynî ye. Seba ku nebe dubare me behsa yên *Hetawî Kurd* nekir. Di *Jînê* de jî bi navê Kurdishî Bitlisî li ser dîrok, mîtolojî û standardkirina ziman gotar nivîsîne.

Di vê rîyê de ji bo miletên xwe rojnameyan derdixin û tê de îhtiya-çen miletê xwe destnîşan dikin. Dê dîrok navê van qeyd bike û ji bîr neke. Her ku kurdan misilmanî qebûl kirîye û heta niha ji nav wan bi hezaran şêx û mela û mîr rabûne, ji bo dîn û dewletê, xizmetên mezin kirine, kitêbên qenc çêkirine, lêbelê bi qasî serê zilekê jî faydeya wan negihîştiye qewmê wan. Lewma ew tev bênav çûne. Hal ew e ku van kesan ji bo kurdan xizmet bikirana, kitêb û dîwan bi zimanê kurdî binivîsîna, iro nav û kitêbên wan winda nedibû. Elî Herîrî, Melayê Cizîrî û Ehmedê Xanî mînakêñ vê yekê ne.²⁴

Ne tenê di kêşeya perwerde, dibistan û sersarîya ji bo zimanê xwe de ev zumre xwedî-qebehet e, bi bawerîya M. Salih Bedirxan tunebûna rojnameyeka sîyasî jî ihmalkarıya wan e: Digel şes mîlyon nîfusa xwe ger iro li dinê navekî kurdan tunebe, kes ne hayedar be ka ji bo îslamê ci xizmet kirine; sebebê vê yekê tunebûna “cerîde”yên kurdî ne. İro her qewm xwedîyê pazdeh, bîst cerîdeyan e û qewmê bê cerîde mîna mirovekî lal e, kerr e, nikare derdê xwe beje. Belê cerîdeyên mîna *Rojî Kurd* hene lê ew cerîdeya ‘ilm û merîfetê ye, ew nikare behsa sîyasetê bike. Li gor qanûna dewletê, ji bo *cerîdeyeka sîyasî*, lazim e mirov pênzed zêr emanet deyne. Mixabin kurd ji tedarîka vî pereyî acîz in.²⁵

Elbet di nav kurdan de, bi vê tûndîyê rexnekirina zumreyeka xwedî-prestij, ji meyla serdemê ne xafil e. Dîyar e ku serdema nû, asoyeka wêrek çêdirik ku xwendayênu ku bi perwerdeyeka nû rabûne, van kevnezumreyan rexne bikin, ji bo pêdiviyê demê wan bînin ser rîyeka rast û acîl.

3.2. Daxwaza Perwerdeyeka Nû û Islehkirina Elifbaya Erebî

Tam bi vê xalê re têkildar, kêşeya perwerde û elifbayê jî hatîye rojevê. Ji ber ku xwende û ronakbîrên kurdan wisa bawer dikirin ku cehaleta heyî, bi “mektebên cedîd” ji holê radibe, hêsankirina elifbaya erebî ji bo kurdî, kêşeya xwendin û fîrbûna nivîsandinê berteref dike. Ev yek di gotarêñ şexsan û beyannameyên komeleyên sîyasî û çandî de her gav tê ziman. Li gor naveroka van gotar û beyanan, zarokên kurdan zîrek in û xwedî-behre ne, lê li ber destê wan kitêbên zanist û teknîkê tunene, ji tirkî fêm nakin û elifbaya heyî jî gelek zor e û li kurdî nayê, sebebê paşmayîn û dereng-kemilîna wan ew in.

24 M. X. “Bextreşî û Mehrûmîya Kurdan”, *Rojî Kurd* 3 (1 Ağustos 1329/1913): 29-31.

25 M. S. Azîzî, “Hişyar Bîn”, *Rojî Kurd* 2 (6 Temmuz sene 1329/1913): 23, 24.

Li ser vê xetê mesela Midhat Bedirxan gava di rojnameya *Kurdistanê* de pesnê gule, top û tifengên emerîkî, freng, rûs û japonan dia, digot divê kurd jî çekên vî zemanî bizanibin çêkin û biemilînin û ji bo vê yekê jî ji wan re “medreseyêni wisa şert in, divê ew medrese li gor ‘ilm û merîfeteka esrî bin ku zarokêni kurdan ji şivantî û rênberîyê xelas bibin.²⁶

Diyarbekirli Fikri Necdet şertê pêşketina çandinîyê (zîraet) di vekirina dibistanêni esrî de didît. Digot herçend erdê kurdan pir e, axa wê baş û ava wê boş e jî kurd bi qasî frengan dexil hilnaynin; ji ber ku frenk erdê xwe bi makîneyan cot dikan; yek diavêjin cil hiltînin û îro ji nav wan gelek arvan, cil û pêdivî têni nav memleketê osmanî; ewen dibêjin şixulandina makîneyêni gawiran guneh e, derewan dikan û bila ew ji halê xwe şerm bikin. Divê eşîren kurdan zarokêni xwe ji bo hînbûna vê cotyarîyê bişînin dibistanan, dema erd bi makîneyan baş hat kolan, dê bênder mezin û paşîl tije bibin.²⁷

Li gor Babanzade Ismaîl Haqqî, “ziman” di vê perwerdeyê de xwedîyê roleka kilidî ye. Ji ber ku ziman ne tenê amraza ragihan-dinê ye, bîdestxistina ‘ilm û fennê, pêşketin û medenîyetê bi wî çêdi-be. Miletik ku ji nivîsandinê mehrûm be, “bêziman” e. Mixabin ji ber karêni neqenc ên hikumeta mustebîd wekî pêkhateyêni misliman (çerkez, laz û arnawûd) kurd jî bûbûn qewmekî zimankuştî. Lewma îro ne kitêbêni wan ên rêzmanî, ne matbaa û ne jî berhemêni wan ên çapbûyî hene. Wisa ji edebiyatê, rîbazân zanist û teknîkê, berhemêni zanistî û hunerî jî mehrûm mane. Hêz û hikumranî di perwerdeyê de ye, perwerde jî bi ziman li ser pîya dimîne. Kurdêni ku sitûna herî girîng a osmanî ne, ger ne qewîn be, Dewleta Osmanî ya ku pala xwe dide vê sitûnê jî dê li ser pîya nemîne! Çare ne *tirkîkirin an erebkirina* kurd, laz û arnawûdan e. Çare ew e ku her qewm bi zimanê xwe perwerde bibîne. Erê di gundekî kurdîxâvîr de mirov pile bi pile dikare tirkî hinî zarokekî kurd bike û ew zarok jî di dawîyê de bi jîrbûna xwe dê were asteka baş, lê di ber vê hînbûnê de ew zarok dê ji ‘emrê xwe yê biqîmet çend salan winda bike. Li ber destê vî kurdî ger bi kurdî çend berhemêni derbarê zanist û teknîkê de hebûna û ew biçuya dibistaneka kurdi şik tuneye ku dê zûtir bikemiliya û perwerdeyeke bênoqsan wergirta. Hasîli bingeha yekem a selameta

26 Midhat Bedirxan, bnr. “Bîsmîlahîrrehmanîrrehîm”, *Kurdistan* 1 (9 Nisan 1314/1898): 1-4; “Bîsmîlahîrrehmanîrrehîm”, *Kurdistan* 2 (23 Nisan 1314/1898): 1-4; û “Fazilet’ul ‘Ilm”, *Kurdistan* 4 (21 Mayıs sene 1314/1898): 3-4.

27 Fikri Necdet “Cotkarî”, *Rojî Kurd* 1 (6 Haziran 1329/1913): 24-25.

miletî, perwerde ye, mifteya perwerdeyê jî ziman e, derîyê medenî-yetê jî bi vî zimanî vedibe.²⁸

Bi raya Seyyîd Muhammed Îsmetullah (ku ji nivîsa wî dîyar dibe ew yekî ereb e û li Kurdistanê heft sal nefî maye), osmanîyan her miletî ji zanîn û perwerdeyê mehrûm hiştîye, nehiştîye ew bi feyza zanîn û tekamûlê bijîn. Fezîletên heyî yên kurdan, bi xîret û xebata wan çêbûne, tê de tu para osmanîyan tune. Ew dibistanê ku li Kurdistanê vedibin ne faydeyekê didin kurdan û ne jî ji pêdiviyê wan re dîbin derman. Heta ku dersê wan dibistanan ne li gorî pêdiviyê herêmî û serdemî bin, pûç in. Kurd divê li gor zeka û behreyên xwe perwerdeyekê bibînin.²⁹

Herçend li gor pêdiviyê serdemê vekirina dibistanan, di wan dibistanan de îmkana perwerdeya bi kurdî û çareserkirina materyalên dersê (wekî rîzman, ferheng) ji dewra meşrûtiyetê heta destpêka şerê cîhanê di nav ronakbîrên kurdan de bûye cihê nîqaşê jî, ji ber şertên neguncaw, ji xeynî du carên emirkin, ev mesele ji quwweyê derbasî pratîkê nebûye. Belê kurd cara pêşî di dewra meşrûtiyetê de, li Stenbolê, di asta seretayî de be jî, bi navê wê “Kurd Meşrûtiyet Mektebî” bûn xwedîyê dibistanaka nû. Ev dibistan ji alîyê komeleya Kurd Neşri Maarif Cemîyetî ve di 1910an de, piranî bi alîkarîya kurdêñ dewlemend hat damezrandin. Ji beyannameya komeleya wê dîyar dibû ku di pêşêrojê de ji bo dibistanê Kurdistanê dê bûbûya mînakeka tetbiqî (pilot). Lîbelê ji ber zêdebûna tacîz û meylêñ tirk-perest ên ittihadîyan, ew heft heşt meh şûnde hatîye girtin.³⁰

Cara duyem li Xoyê komeleya Gehandinî, bi heman navî dibistanaka nû vekirîye. Mebesta wê avakirina matbaayekê, derxistina rojnameyeka heftane û vekirina dibistanê sin'et û zîraetê bû. Ev dibistana ku pol, dispanser, mifredat û cilûbergên wê “bi terzeka ewrûpî” hatibûn sazkirin, ji bo “neslê nû yê kurd” bû.³¹ Lîbelê ew jî bi destpêkirina şerê cîhanê re, di sala 1914an de belav bû.

Eve di van salan de, di ber behsa dibistanê nû, zû-xwendin û ni-vîsandinê de islehkirina elifbayê tê rojevê. Gotara ku agirê vê nîqaşê geş kirîye, aîdî Abdullah Cewdet e. Cewdet di wê bawerîyê de ye ku

28 Babanzade Ismaîl Haqqî, “Kürdceye Dair”, *Kurd Teavün ve Terakkî Gaze-tesî* 3 (6 Kanûn-ı Evvel 1324/1908): 18-19.

29 Seyyîd Muhammed Îsmetullah, “Kurdistanda Maarif”, *Kurd Teavün ve Terakkî Gazetesi* 9 (17 Kanun-u Sanî 1324/1909): 79.

30 Bo agahîyêñ berfirehtir bnr. Bahattin Demir, “Kurd Meşrutiyet Mektebi”, *Toplumsal Tarih* 200 (Ağustos 2010): 72-78.

31 Bo agahîyêñ berfirehtir bnr. Celîlê Celîl, *Kürt Aydinlanması*, (wer.) Arif Karabağ, ç. 2, (İstanbul: Avesta, 2013), 122, 124.

ji bo pêşveçûna kurdan, şertek jî ew e ku di nav wan de rêjeya kesên xwenda bilindi ji %40an bibe, ji bo vê yekê jî divê “herfêن nû” bêñ qebûlkirin da ku kurd di mehekê de bi wan herfan zarokêñ xwe yên 7-8 salî hînî xwendin û nivîsandinê bikin.³²

Derhal kesên wek Suleymanîyelî Mes’ûd, M. S. Azîzî (M. Salih Bedirxan), Silêmanî Ebdulkerîm, Modanî X. (Xelîl Xeyalî) û Babanzade Ismaîl Haqqî tevî vê nîqaşê dibil. Me got li rexê vekirina dibistanan ji bo zarokêñ kurdan, hêşankirina elifbaya heyî jî mîna karekî elzem dihat dîtin. Li gor xwedîyê van nivîsan, sebebê sereke yê paşmayîna zarokêñ kurdan, elifbaya heyî bû. Bo nimûne Suleymanîyelî Mes’ûd di wê qenaetê de bû ku ilmên dînî ne tê de, di hemû warêñ zanistêñ serdemî de tekane sebebê paşmana alema îslamê, curbecurîya şiklêñ herfan ên elifbayê bû. Ji ber ku ji bo hînbûna 6 tîpan divê mirov 80 şiklêñ cuda hîn bûbûya. Mesela şiklêñ tîpêñ bê, (), tê (), sê (), nûn (), yê () û têya sitûr () herdem diguherîn. Ji bo 32 tîpan, hînbûna 200 şiklêñ bêhereke, hem xwendekaran û hem jî mamosteyan bêşewq dikir. Eve cehaleta heyî ji vir dest pê dikir. Çare ci bû? Çare ew bû ku di dibistanê seretayî de ji bo her herfê mirov tenê yek şiklî hilbijarta û wê bi kar bianîya.³³

Li gor M. S. Azîzî (M. Salih Bedirxan) ger elifbaya ‘erebîbihata islehkirin, dê ji her qewmî bêtir kurd jê fayde bidîtana. Belkî kesê herî cahil û bêqabilîyet jî di sê çar mehan de xwendin û nivîsandinê hîn bûbûya. Piştî islehkirina elifbayê, karê nivîsandina rîzimana kurdî û pêdiviyêñ dî hêasantir dibû.³⁴

Gotarêñ Modanî X. (Xelîl Xeyalî) û Silêmanî Ebdulkerîm, li ser ferqêñ navbera zarokêñ kurdan û ewrûpîyan, “berawirdkirinek” tîne nav vê nîqaşê. Bo nimûne Xelîl Xeyalî di wê bawerîyê de ye ku zarokêñ îngilîz, frensiz, elman, rûs û italyanan di nava şes heyvan de xwendin û nivîsandinê hîn dibil lêbelê yê kurdan di nava deh salan de du herfan jî hîn nabin. Sebebê vê yekê ne jîrbûna zarokêñ ewrûpî û ne jî bêxîretî û kêm-aqilîya zarokêñ kurdan e. Di “zûxwendin” û “zûnivîsandin”ê de kêşeyek heye. Lewma divê kurd ji şêx û melayêñ Mûsil, Dîyarbekir, Bi(t)lis, Wan, Erzerom, Bexdad, Sinê, Silêmanî, Kerkûk û Xarpûtê bipirsin ka li ser vê behsê ci difikirin, belkî piştî

32 Abdullah Cewdet, “Bir Xitab”, *Rojî Kurd* 1 (6 Haziran sene 1329 /913): 3-4.

33 Suleymanîyelî Mes’ûd, “Hurûfumuz ve Teshîl-i Kırâati”, *Rojî Kurd* 1 (6 Haziran sene 1329/1913): 18.

34 M. S. Azîzî, “Hurûfumuz ve Teshîl-i Kırâat” *Rojî Kurd* 2 (6 Temmuz 1329/1913):13.

sê-çar mehan ji bo xwendin û nivîsandinê çareyek çêbe.³⁵

Silêmanî Ebdulkérîm bi şewazeka mizahî hem kêseya elifbayê û hem jî rîbaz û helwesta mamosteyan rexne dike. Li gor wî ji ber elifba û rîbaza hînkirinê mindalên kurd zû hînî xwendin û nûsînê nabin û hewesdariya wan a bo tehsîlê zû vedimir. Ji ber ku piştî çend salên xwendinê mindalên kurd nû hîn dibe ka “dal” a () Zeyd bi ci bûr e, “ra” ya () Omer bi ci mensû ye, “we” () bi ci û xulamê Bekir bi ci meksûr e, ta ku ev hemû piştî bîst salan bi kêrî xwendina *Babu'l-Fera'îdê* bêt. Îcar gava li dibistan û hucreyên medreseyan feleqe, lêdan û sîleya muellim û melayan jî dikeve ser vê bobelatê, bêhewesî zêdetir dibe. Axir mindal di heft salan de Qur'anê xetim dike. Qebehet elbet ne yê wî ye, ger ew mindalê frengekî bûya, di heft salan de dibû musteşarê nazirê xaricîyê. Lewra mamosteyê wan hiş û fîkrê zarokan bi elîf ser a, hê zenne eh, mîm ser ma, dal zenne med, ku dibe “Ehmed” meşxûl nake. Tîpan nîşan dide, paşê ji şekir tîpan dirist dike, bang dike mindal, were navê xwe, ku Ehmed e, peyda bike, ger te peyda kir, ev şekirê ha ji bo te, dibêjê. Ew mindal wisa tê reqs û semayê, di maweyê du deqîqan de ji wan şekiran navê xwe dirist dike, yanî hem navê xwe dixwîne û hem jî dinivîsine. Mamosteyê kurdan feqîro bi du saetan de encax “elîf ser a” hîn dike. Freng du rojêñ hefteyê, zarokan dîbin çolê, fêrî ilmê çandinê (zîraet) dîkin ka ji du ribe genim çawa sed ribe genim tê hilanîn. Mixabin yên kurd û osmanîyan ji ‘ilm û feneka wisa jî mehrûm in.³⁶

Li gor Babanzade I. Haqqî di vê rîyê de wezîfeya pêşîn ew e ku mirov kurdî bike zimanekî rasteqîn ê nivîsê. Ev ziman jî dê “bi tîpêñ nû yên ‘erebî’” çêbibe. Jixwe di vê behsê de çend teşebîs çêbûne ku divê ji nav wan mirov ya herî baş bineqîne û li gor pêdivîyêñ kurdî bêteredût wan bi kar bîne. Dê tîpêñ kurdî bi ‘erebî bin. Bes bila elifbaya nû, ji ya berê ne tevlihevtir be, bila ji tîpêñ basît pêkhatî be. Lewra di dawîya dawîn de kurd aîdî malbata Şerqê ne, bila nedîn pey arnawûdêñ latînparêz.³⁷

Di nav van guftûgoyan de çareserkirina kêseya elifbayê, carina digihîje naverokêñ balkêş. Ji bo vê yekê nivîseka Mewlanzade Rifat temsîkar e. Li gor wî gava kurd şîyar bû û ketin ser rîya teraqqîyê,

35 Modanî, X., “Ziman û Nezanîya Kurdan”, *Rojî Kurd* 2 (6 Temmuz 1329/1913): 29-30.

36 Silêmanî Ebdulkérîm, “Tal û Şîrîn”, *Rojî Kurd* 1 (6 Haziran 1329/1913): 21, 23.

37 Babanzade Ismaîl Haqqî, “Kürdlerin Tealisi”, *Rojî Kurd* 3 (1 Ağustos 1329/1913): 3-4.

dor tê ser ziman. Ji ber ku ji bo hemû pêşketinan ziman lazim e. Islehkirin û pertkirina (ta'mîm) ziman jî bi nivîsandinê çêdibe. Ji bo ku mirov bi heq kurdî binivîse û bi hêsanî fêm bike û bide fêmkirin, vejandin û islehkirina tîpêن wî yên qedîm şert e. Kurd wekî ermenîyan qewmekî "urdû"yî ye û jê re tîpêن "urdûyî" divê. Bi tîpêن heyî zeptkirina zimanê kurdî ne mimkûn e. Ger kurd bikaribin tîpêن xwe yên qedîm vejînin û isleh bikin, bi wan qewmê xwe bînin nav daîreya şêwazeka nû û pê kitêbên xwendin û rêziman û herwiha ferhengekê binivîsin, dê armanca wan biçe serî.³⁸

Ev cure lêgerîna elifbayekê li gor taybetîyen zimanê xwe, heta nifşê Hawarê jî didome. Ji ber daxwaz û pratîkên cuda bêñ amadekirin jî *Elîfbayê Kurmancîya Xeyalî*, (1909), *Hînkerê Zimanê Kurdiya* komeleya Hêviyê (1921), parçeyekî vê lêgerînê ne. Herçend piştî şerê cîhanê (1918) bala kurdan bêtir dikeve ser "huqûqa millî" jî di vê maweyê de hebûna du gotarêن Kamiran Alî Bedirxan, dîyar dike ku çareserkirina kêşeya hêsinkirina elifbayê berdewam e. Di gotara *Serbestîyê* de Bedirxan eyan dike ku demeka nêzik de xebata Kurd Neşrî Maarif Cemîyetî dê semereya xwe bide, wek gava pêşîn dê ev komele kitêbên elifba û rêzimana kurdî saz û çap bike.³⁹ Di gotara *Jînê* de jî Bedirxan dibêje qencîya elifbayeka sivik û hêsan pirr e; ew mileten ku zimanê xwe isleh dikan, qaîdeyêن zimanê xwe sererast dikan, tîpêن sade û sivik bi kar tînin, astengîyen li pêşîya serxwebûna xwe jî radikin. Lewma elifbaya ku tê amadekirin, divê di demeka kin de xwendin û nivîsandinê hînî gundîyan jî bike. Di vê rîyê de "bi feraseteka nû" mirov tevbigere, dev ji wan bawerî û îctihadêñ batil berde çêtir e. Bi şertê ku ne li dijî hukmê İlahî be, li gor pêdivîyen demê divê mirov elifbayekê (yeka ji milê rastê ber bi milê çepê ve an yeka ji milê çepê ber bi yê rastê ve tê nivîsîn) peyda bike ji bo kurdan.⁴⁰

Bi rastî jî heman rojan elifbaya cemîyeta ku Kamiran Bedirxan behsê dike, di jimareñ 17, 18, 19, 20 û 22an a *Jînê* de çap dibe. Heta ji bo pratîkê, di Jimara 23an a kovarê de helbesteka Nalî bi vê elifbayê tê weşandin. Elifba wekî "herfîn sewtîye" û "herfîn sabite" hatîye dabeşkirin, lê jê dîyar dike ku bêtir ji bo çareserkirina kêşeya

38 Mewlanzade Rifat, "Muhterem 'Hetawî Kurd' Gazetesi Muessîslerine", *Hetawî Kurd* 2 (21 Teşrîn-î Sanî 1329/1913): 3.

39 Kamiran Alî Bedirxan, "Kürd Lisânının Tedvini", *Serbestî* 480, (29 Nisan 1919): 1.

40 Kamiran Alî Bedirxan, "Kürd Lisâni", *Serbestî* 486 (5 Mayıs 1919): 1.

dengdêrên kurdî (a, e, ê, i, î, o, u û) hewl û xîretek heye.⁴¹ Halê hazir bi vê elifbayê kurdan çiqas mistûemel kir em nizanin lê em dizanin ku îmkana elifbaya *ji milê çepê ve tê nivîsin*, di sala 1932an de bi kovara *Hawarê* pratîze bû.

3.3. Rexne Li Rêveberîya Berê û Merkezîperestîyê

Em dibinin ku elametekî mezin ê dewra modern, qebûlkirina makedzagonekê, yanî rêkeftineka civakî (social du contrat) ye û bi vê rêkeftinê sînorkirina hikumranîya keyfî ye. Li ser vê behsê Touraine dibêje ku sînorkirina hikmê hikumdar û bi şoreşeka neteweyî (mîna Şoreşâ Frensi) dewirkirina vî hukmî bi temamî ji bo gel, rewşeka dewrên nû ye. Ji alîyêن cuda cuda ve tesîra fîkrêن Descartes, Locke, Rousseau, Voltaire, Diderot çêbûye heta ku “di şûna qanûna îlahî de faydeya civakî binecî bûbe”. Li ser vê yeke mesela li Îngilîstanê îlankirina Danezana Mafan/Bill of Rights (1689) û li Frenseyê Danezana Mafêن Mirov û Welatîyan/La Déclaration des droits de l'Homme et du citoyen (1789), bûne xîmên qanûnên huqûqî yên rejîmên wek meşrûtîyet û cumhûrîyetê, bi van rejîman re rûdana *meclîs û qanûna esasî* jî bûne temsîla îradeya gel li hemberê rêvebir û dewletê.⁴²

Navê rengvedana vê dîyardeyê ji bo Dewleta Osmanî jî -du carêñ emirkin- çêbûna rejîma Meşrûtîyetê (1876 û 1908) û qebûlkirina Qanûna Esası ye. Li taxa kurdan bi kîf û coşeka mezin pêşwazîkîrina van herdu dîyardeyan, fikrek dide me ka ronakbîrêñ kurdan çiqas meyyalê dinyayeka nû ne. Ji bo dîtina vê yeke, çavlîgerîneka basît li çend nivîsêñ rojnameya *Kurd Teawûn û Teraqqîyê* têra me dike. Bo nimûne Dîyarbekirî Ahmed Cemîl ji bo Meşrûtîyeta Du-yem digot *şahîya yekem a bûka hakimîyeta millet û cejna mezin a azadîya millet*, ji bo betalkirina Meşrûtîyeta Yekem jî digot têkçûna mafêن welatîyan û ketina taca azadîyê.⁴³ Seîdê Kurdî wesfekî pêşketî dida rêveberîya meşrûtî û digot meşrûtîyet cinsekî meşwereta îslamî ye, bi vê idareyê re êdî hikim ne ya kesekî ye û madem meşrûtîyet ji ruhê îslamê ne dûr e, nexwe ji bo ku gunehêñ îstibdadê û demêñ borî dîn û şerî'etê lekedar neke, zarûret e ku mirov Meşrûtîyetê di

41 Bnr. Jimara 23an a kovara *Jînê*, helbeta Nalî ya ku bi peyvîn “Em taqime” dest pê dike.

42 A. Touranine, hb. r. 51-73.

43 Bnr. Ahmed Cemîl, “Milletin İlk Şehrayîn-i Arûs-i Hakimiyeti”, *Kûrd Teavün ve Terakkî Gazetesi* 2 (29 Teşrinî-Sanî 1324/1908): 11; “Milletin İd-i Ekber-i Hürriyeti”, *Kûrd Teavün ve Terakkî Gazetesi* 3,(6 Kanun-u Evvel 1324/1908): 17.

libasê şerî'etê de nîşan bide û tetbiq bike. Awrûpayê jî esas bi xêra vê hêzê ji xwe re pêşketin û perwerdeyeka harîqulade ava kirîye.⁴⁴ Bi raya Xelîl Xeyalî bi Meşrûtiyet û Qanûna Esasî re ew karên xirab (cehalet, sefalet, feqîrî, pevçûn û ixtilaf) tev pûç û betal dibûn.⁴⁵ Seyyah Ahmed Şewqî digot madem bi Meşrûtiyet û Qanûna Esasî re ji bo her kesî wekhewî, azadî û biratî dabîn bûye, divê di navbera gel û pekhateyên dewletê de tu ixtilaf nemînin. Meşrûtiyet rûdana azadîyê, pêşketinê, hînbûna sen'et û pîşeyên demê, geşbûna perwerde û xwendinê ye û dê ew bi xwe re xweşderbaskirina welatîyan û azadîyê bîne. İstibdad li dijî şerî'etê bû, ji ber wê tebaya osmanî paş ma û lêbelê niha bi saya azadîyê dê hemû xirabî def' bibin.⁴⁶ Di he-man rojnameyê de Mihemed Tahir Cezerî ji bo Qanûna Esasî digot ew xwedîyê çar ruknên bingehîn e: *Hurrîyet* (azadî), *edâlet* (dadî), *uxuuwwet* (biratî) û *musawet* (wekhevî) û ev rukin li gor emrê Xwedê û şerî'eta pêxember e...⁴⁷

Lêbelê bi destpêkirina desthilatdariya partîya Îttîhad û Teraqqîyê re ev hêvî berhewa dibin. Ji ber ku karakterê wê yî tirkperest û yek-perest (çawa ku bi provakasyona 31 Mart Waq'asî re hemû muxalefetê tesfiye dike) atmosfera xweşbîn a vê maweyê diguherîne. Ji ya Abdulhemîd xirabtir rêveberîyeka mustebîd ava dibe (wekî dewra iro). Belkî jî li ser kirinê mustebîd ên vê rêveberîyê, çar sal şûnde Midhat Bedirxan gotarek dînivîse. Gotara wî ya ku hûrgilî behsa zarûreta “cudabûna hêzên rêveberîyê» dike, bi fikra me iro jî aktûel e û bi ders û ibretan tije ye. Ji ber ku Midhat Bedirxan dibêje ku demokrasîya heyî iro di rêveberîya meşrûti de tecessûm kirîye, bingeha dewletên medenî li ser vê rêveberîyê ava bûye. Hêzên weke quwweyî îcraîye (yürütme) û quwweyî qanûniye (yasama) di dewletên medenî de cuda ne, di destê yekî de nînin. Dema ev hêz ji hev cuda ne-bin, rêveberîyeka mustebîd rû dide. Ev revêberî ji her cure kontrolê dûr dibe û bi keyfî tevdigere. Îradeya milet rastî tecawûzêñ derveyî

44 Said-i Kurdî, “İfade-i Meram”, *Kurd Teavün ve Terakkî Gazetesi*, 6, (27 Kanun-u Evvel 1324/1909): 43, 44.

45 Xelîl Xeyalî, “Weten û Îttifaqa Kurmanca”, *Kurd Teavün ve Terakkî Gazetesi* 8 (10 Kanun-u Sanî 1324/1909): 69, 70.

46 Seyyah Ahmed Şewqî, “Ey Gelî Kurdan”, *Kurd Teavün ve Terakkî Gazetesi* 1, (22 Teşrîn-î Sanî 1324/1908): 7, 8; “Gelî Welatiyâ”, *Kurd Teavün ve Terakkî Gazetesi* 2 (29 Teşrîn-î Sanî 1324/1908): 16.

47 Mihemed Tahir Cezerî, “Gelî Birakên Ezîz û Gelî Kurmanca”, *Kurd Teavün ve Terakkî Gazetesi* 6 (27 Kanun-u Evvel 1324/1909): 37, 38.

û navxweyî tê.⁴⁸ Heta di vê behsê de Midhat Bedirxan serî li *Ruhu'l Qavanîna* [Kanunlarin Ruhu] Montesqieu dide û jê vê referansa ha dide: “Li welatekî ku prensîba cudabûna van qanûnan tuneye, ne mimkûn e li wir azadîyeka esasî hebe.” Û piştî van gotinan jî bi ques-ta pratîka Îttîhatçîyan dibêje ku me jî ev gotina mezin tecrûbe kir, hem jî bi awayekî tahl.⁴⁹

Herçî rexnekirina polîtikayên merkezîperest e, ev yek jî herî baş û tîpîk di gotareka Abdullah Cewdet de xuya dibe. Gotara wî çiro-kekê jî dihewîne ku ew çîrok jî ji bo refleksa dewleta tirk û piştgirên wî yên “dewletlu” bi têra xwe îzehker e. Li gor Cewdet qaşo dostekî wî yê muhterem gava li ser maseya wî jîmaraka kovara *Rojî Kurd* dîtiye, jê pîrsîye ka ev çi ye? Cewdet gotîye ew weşaneka “kurdo-lojî”yê ye, derbarê kurdîtiye de ye. Wê gavê vî kesî rûpeleka kovarê vekirîye û gava rastî nivîseka kurdî hatîye, gotîye “madem ne tirkî ye û madem kurdî ye, ev weşana tefrîqayê (parçebûn) ye” û kovar avêtiye ser masê. Eve Cewdet herwekî vê helwesta şaş û xwe-dîyê felsefeyeka sexte rexne bike, gotarek nivîsiye.⁵⁰ Lîbelê fîkrîn Cewdet ên ser cudabûn û bihevrebûna miletan û herwiha sîstemeka ademî-merkezî gelek balkêş in û ji bo roja me jî dîsa aktûel in. Bi kurtî wiha ye naveroka vê gotarê:

Turkiya, herçend axa Ewrûpaya Osmanî (Balkan) winda kiribe, ew hêj jî ji gelek unsûran pêk tê û hêj jî hêvîya yekîtiyê heye an hêvî heye ku mirov van unsûran nêzîkî hev bike. Ji bo vê yekê jî rîya herî bitesîr a yekîtiyê, di cudabûnê de ye (Tevhîdin en mues-sîr çaresi tefrîddir.) Lewra Xweda jî di Qurana pîroz de gotîye me insanın mîna qewm û şûbeyên cuda cuda afirand da ku hev nas bikin. Nexwe eşkere ye ku her milet di nav derdora xwe ya serbest û siruştî de, li gor meylîn xwe yên mileti bijî û tenê ji bo hevnasîn û dostanîyê werin ba hev. Nexwe tiştekî minasîb nîne ku mirov “yek ziman”, “yek qanûn” û “yek muemele”yê li ser van miletan ferz bike. Ji bo ku unsûrên osmanî di nav yekîtiyekê de bin, lazim e li gor xasyetên xwe bijîn. Ji bo vê yekê li Ewrûpayê mînaka Swîsrayê heye. Ev dewlet ji 22 kantonan pêk tê ku her kanton ji alîyê milkî û idarî ve serbixwe ye û digel ku ji sê qewmîn cuda (frensiz, elman

48 Midhat, “Kuvâ-yı Umûmiyye-i Hükûmet Sûret-i Zuhûru, Lüzûm-ı Tefrîk ve Muvazenetî ve Bu Husûsdaki İhtilafat-ı Efkâr ve Bu Bâbda Olan Nazariyyât”, *Rojî Kurd* 1 (6 Haziran 1329/1913): 14, 15.

49 Midhat, heman nivîs, r. 16.

50 Abdullah Cewdet, “Îttihad Yolu”, *Rojî Kurd* 2 (6 Temmuz 1329/1913): 8-10.

û ìtalyan) pêk tê û pir-mezhebî ye jî (katolîk, protestan, ortodoks û kalvenîst) di nava xwe de xwedîyê yekîtîyekê ye. Serdem, serdema millîyetan e û tu dewlet û hikumet nikare pêşîya vê cereyanê bigre. Îro kurd jî dixwazin bi zimanê xwe biniwîsin, dîroka xwe hîn bibin û şexsiyeta xwe ya neteweyî fêm bikin. Bila rêvebirêne dewletê viya fêm bikin û tu astengîyan dernexin. Kî yêkîtîya unsûran dixwaze, divê cudabûna wan jî bixwaze.⁵¹

Ji van gotaran jî xuya dibe ku ronakbîrêne kurd, di meseleya rê-veberîya mustebîd û zîhnîyeta merkezî û monolîtîk (yekceleb) de, xwedîyê helwesteka rexneyî ne û ev rexne li ser zemîneka ku ji din-yayê xeberdar e, rû daye.

3.4. Rexnekirina Edebîyata Kevin

Di nava vê tabloyê de, rexneyek jî derbarê edebîyatê de ye. Ya rast rexneya heyî, gazindan ji konvansiyonên edebîyata heyî dike. Ji vê edebîyatê dixwaze ku li gor dinyaya ku bi awayekî radîkal guherîye tev bigere, êdî dev ji bedewîya yarê, ji pesnê bejnûbal, zilf û işsweyên wê berde, behsa tiştekî bifayde û civakî bike. Elbet muxetabê van rexneyan naveroka helbesta heyî ye.

Di rûdana vê rexneyê de bêguman rola serdemê gelek e. Em dibînin ku li dinyayê (bi medreseyâ Romantîk re) meylek çêbûbû ku berê hunerê dida ser meseleyên civakî û digot lazim e “huner ne ji bo hunerê be, huner ji bo civakê be”. Tê zanîn ku ev nîqaş di nav edîbên tirk ên vê serdemê de jî hebû. Em dibînin ku mîna qeydeka nivîskî gotareka Baban Abdulazîz (“Edebîyyâtımız ve Udebâmızdan Bir Ricâ”) li ser vê îstiqametê bangî edîb û şairan dike.⁵² Bi raya Baban Abdulazîz, ku wî bi îmzayê wekî Azîz Yamulkî û Yamulkîzade Abdulazîz jî nivîsiye, niha hêzeka mezin a medenî li Ewrûpayê rû daye û ev hêz ji top ûtifeng û çekan zêdetir, aîdê ilm û hunerê ye; ewên ku bi ilm û hunerê mucuhhez nebin, hem li Şerqê hem li Xerbê dê li ber pêlên dijwar ên vê medenîyetê çemûçem herin; ev heqîqet divê bêtir ji alîyê ronakbîran ve bê zanîn; xelq ji vê medenîyetê bêxaber e; xelq ji gotinên alim, waîz, muderrîs, edîb, şair û ji wan xortêne xwedî-tehsîleka ewrûpî bibawer in; di nav van kesan de ewên ku baş weşangerî û propagandayê dikan, şair û edîb in. Lêbelê bila ew li quisûrê nenêrin gava mirov li berhemêne wan dinêre, mirov dibîne ku di armanca wê de teorîya “huner bo hunerê” heye; ev rîyeaka şaş e;

51 Abdullah Cewdet, heman nivîs, heman cî.

52 Baban Abdulazîz “Edebîyyâtımız ve Udebâmızdan Bir Ricâ”, *Rojî Kurd* 4 (30 Ağustos 1329/1913): 13-14.

di naveroka vê hunerê de pevcûnên seksî; ji bo bexşîşan pesnê şah û wezîr û mîran û rindîya carîye û horîyan heye; tê de fayde û iqazek nîne ji bo qewm û derdora wan; herçend ev taybetî li ba wan miletên dî jî hebe, ev çaryek esr e an belkî esrek e ku jîyan guherîye û li gor vê yekê lazim bû ku heta niha mecraya edebî jî biguherîya, yanî lazim bû teorîya “huner bo civakê” dest pê bikira; wan bi vê armancê helbest û dîwan binivîsîna, gel ji xewê şîyar kirana, tiştên sûdewer û kîrhatî nîşana gel bidana; bereksê edebîyata kevin, dê mijar jî ne şexsî, lê civakî bibûya; wê demê dê ev halê xemgîn rû neda, dê kur-dîti bibûya xwedanê uzw û azayêن heqîqî; dê hêza belaxatê zêdetir nifûzî ruhê insan bikira, lê mixabin ev nebûye⁵³

Xwedîyê nivîsê di dawîya gotara xwe de şairekî ku hunerê ji bo armanceka sûdewar bi kar anîye jî destnişan dike û dixwaze ku yên îro bidin pey wî. Li gor Baban Abdulazîz ev kesê payebilind Hacî Qadirê Koyî ye ku di nav tarîyeka tîr de mîna cirayekê geş bûye û vê heqîqetê (hüner ji bo civakê) teqîb kirîye. Lê çawa ku bi gulekê bihar nayê; bi şîret û xîreta du-sê kesî ev kar naçe serî; lewma Baban Abdulazîz ji edîb û şairan ricayek dike ku rewşa qewmîn xwe, têkçûna misilmanan, felaketên wan ên rojane bînin li ber çavêن xwe û li gor icraya pêdivîyêن vî zemanî bangî xwendevanêن xwe bikin.⁵⁴

Her wekî ev ricaya Baban Abdulazîz şes sal şûnde ji alîyê Qazî Letîf ve pratîze bibe, helbesteka balkêş heye di kovara *Jînê* de. Der-barê jîyana wî de zêde malûmatêن me nînin, tenê em dizanin ku ew kurdekî Mahabadê ye û bavê şair û ronakbîrê vê serdemê Qazîzade Mistefa Şewqî ye. Gava ew ji bo serdana kurê xwe Mistefa Şewqî hatîye Stenbolê, wî ev helbest daye rêvebirên *Jînê*. Ji naveroka “xezel” a wî dîyar dibe ku li vê derê çend kesayetên kurd nas kirîye û jê re coşek çêbûye ku fîkrêن xwe yên ser yekîtî, azadî û rewşa xeternak pêşkêş bike. Helbesta wî bi van beytên radikal dest pê dike:

*Şairî kurdan!.. meken behsî uzar û zulfî yar
Behsî behsêkî biken bo kurd leme-w paş bête kar!..*⁵⁵

Yanî Qazî Letîf rexneyek tund li şairêن kurdan dike û dibêje bes behsa cemal û zulfê yarê bikin, behsa mijarêن wisa bikin ku ji vir pê de karê kurdan biçîte ser. Jixwe di berdewama helbestê de mîna me gotî ew birrek mijarêن civakî tîne rojevê û dibêje ku miletê kurd

53 B. Abdulazîz, heman nivîs, heman cî.

54 Baban Abdulazîz, hn. 14.

55 Qazî Letîf, “Xezel”, *Jîn* 7 (2 Kanun-u Sanî 1335/1919): 14-15.

ji ehlê Gurcistan û Ermenistanê pirrtir e, malmezinên wan xwedîyê qesr, sifre û ni'metan in, lê mixabin *ew ne hakimê xwe ne*, malê wan ji îslam, tirk û tetaran re maye; çak e ku ji nav wan kesên mezin ên mîna Rustem, Bermek, Meen Zaîd, Mistefa Beg, Şêx Reza, Nalî, Wefayî, Seîdê Teftazanî, Melayê Hekar, Muftî Zehawî, Şêxulîslam Heyderîzade Îbrahîm Efendî, Ebdussemet Melayê Kerkûkî, melayê welatbar bedîî rûy zeman Mela Seîdê Kurdî derketine, lê ger gire-girê roja îro meclîsekê ji bo kurdan teşkil nekin dê tarûmar bibin biçin; ger ji bo milkê xwe yekîtiyek saz kirin jî dê iranîyan wek qitarê (trên) sef sef bikin, bidin ber xwe.⁵⁶

Lê eger em çavêن xwe li qeydeka dîtir a pir-hêl (digel rexneya edebî rexneyêni siyasi û civakî jî) dihewîne bigerînin, bêguman em ê herin li ber deriyê helbesteka Koyî. Mixabin ev helbesta ku bi yekûna xwe dibe “nimûneya helbesta nû” di rojname û kovarên vê serdemê de ne bi awayekî serbixwe û ne jî di nav nivîs û gotara ronak-bîrekî de mîna referanseke (bi vî awayî 11 helbestêni Koyî hene) çap nebûye. Ger dîwana Koyî ya ku Abdullah Cewdet di sala 1919an de mîzgînîya çapa wê dide⁵⁷ pêkbihata, em ê rastî wê zûtir bihatana, lê piştî mirina Koyî gelek sal şünde (1986) di cihekî *Dîwana* wî ya li ber destan de mîna “Xakî Cezîr û Botan” em rastî wê têñ.⁵⁸ Ji naverok û hin remzên helbestê dîyar e ku dîroka nivîsîna wê dikare heta sala 1881an biçe.⁵⁹ Çi dibêje helbesta wî ya ku berî semînerê me tewsiye kiribû ku bê xwendin û roja dersê jî li ber destêne we be?*

Koyî bi dengekî şexsî û zimanekî rojane, bal dibe ser metirsîya Peymana Berlinê (1878) ku vê peymanê qismekî mezin ê axa kurdan ji ermenîyan re dihişt⁶⁰ û digot ku ger ew peyman *cîbîci bibe an pêşîya vê metersîyê neyê girtin dê “tofan”ek rû bidin di nav kurdan de: Ger hin eşîrên kurdan ji german bimrin jî dê nikaribin herin zozanan; dê mescîd ciyê xwe bide dêrê, dengê naqosê şûna bangê bigre, qazî dê cihê xwe bide metran, rehban jî li ciyê miftî rûne...*

56 Piştî şerê cîhanê gava Dewleta Osmanî parce bû, iranîyan jî doza axa Kurdistânê kirin, ev yek di nav nifşê Kurdistan Tealî Cemîyetî de nerazîbûnek çêkir, eve di beyteka vê metnê de rengvedana wê nerazîbûnê heye.

57 Abdullah Cewdet, “Kürdçe Yeni Bir Eser”, *Serbestî* 485 (4 Mayıs 1919): 1.

58 Ya ku me jê îstifade kir ev e: *Dîwanî Hacî Qadirî Koyî*, (amd.) Serdar Hemîd Mîran&Kerîm Mustefa Şareza, Sine: İntisaratî Kurdistan, 2012.

59 Bellkî ji ber vê Baban Abdulazîz di gotara xwe ya navborî de digot “25 sal berê Hezretê Hacî Qadirê Koyî şî'rên huner bo civakê dinivîsand”. Bnr. gotara “Edebiyyâtımız ve Udebâmızdan Bir Ricâ”.

60 Di vê peymanê de xala “wilayetên sitte” şes bajaran Erzirom, Wan, Elezîz, Diyarbekir, Bedlîs û Sêwas ji Ermenistanê re dihişt.

Lewma Koyî ulema û umeraya kurd gazî xebat û xîretê dikir, rexne li tiralî û bêferasetîya wan dibarand û xweziya xwe bi wan demên ku kurd azad û serbixwe bûn dianî; di serxwebûn û rizgarbûna miletî de çareyê didît û te'nan dida van zumreyan ku zemanê berê yên mireffeh, azad û aram bi bîr *bînin* û ji “musteqîlbûn” a mileten piçûk (bulxar, sirb, yonan, ermen, qeretax, heta sûdanî) dersek wer-girin û bes pişta xwe jî bidin osmanîyê ku iro mîna “benê mû” zeif bûne. Ji bo dermanê nexweşiyê jî Koyî digel “qelem”ê (xwendin û serwextbûn), “şûr” jî (artêseka modern a ku xwedîyê top û tifeng û hawanê ye) şert didît, lêbelê gava halê heyî yê gewremalên kurd dihat ber çavêن wî jî hêvîşkestî dibû. Herçend wî ermenan rexne dikir jî di doza yekîtî û tifaqê de wan xîretkêş didît û digot ji bo ku ew fenê herb û sin'etê hîn bibin, wan bi piçûk û mezinê xwe ve berê xwe dane Ewrûpayê.⁶¹

61 Bnr. helbesta “Xakî Cezîr û Botan”, *Dîwanî Hacî Qadirî Koyî*, 94-100.
Xakî Cezîr û Botan ye’nî wilatî kurdan/Sed heyf û sed mixabin deyken be Ermenistan

Wa rêgetan debesrê ‘êlatî Caf û Bilbas/Ger mirdûn le germên memnû’ e biçine kwêstan

Kamî kiç û hetîwî şîrîn bê, ray dekêşen/Hawar debene ber kê? Peş me dexîl û aman

Mescîd debête dêre, naqosyan muezzîn/Metran debête qazî, muftî debête rehban
Hîç xeyretêk nemawe sedcar qesem be Qur'an/Peyda bê Ermenistan namênê yek le kurdan

Sertan le kur helênin, ewhalman bibînin/Çonîn le destî zulmî bêdîn dûr le îman
Wellahî summe bîllah, tellahî em bela ye/Her hêndî pê dezanî iqlîmî kirde tofan

Tofanî ew nîye hîç, derçi kêwî Cûdî/Behrî tifeng û top e, însan e behrî ‘Ummân
Em qîsseyey ke kirdim nagate çend salî tir/Em halete debîne yek yek be çawî xotan

Hal êstêke weha ye meger Xuda be sûkî/Têkyan bida we îlla dûr e le ‘eqîlî însan
Herçî wekû beyanim bo kirdûn bê tehqîq/Peyda debin segane, kam qur bikeyin be serman

Lem beyne îttîfaqê peyda biken be merdî/Ferqî nebê şivan û cûtyar û mîr û gavan

Suêndîş biçon be dîn û îman û sê telaqe/Bo hîfzî dîn û mîllet xotan biken be qurban

Rûmî wekû benî mûn, kes piştyan pê nebestê/Kewtûne dawî xoyan, sergeşte mawin û heyran

Kiwa walîy Senenduc, begzadeyî Rewanduz/Kiwa hakimanî Baban, mîrî Cizîr û Botan

Ev ayetey “fe sîru'l fî-l erzî” Xuwa ke fermûy/Îcray deken segane “bî-n-nefs” şâhî xoyan

Kiwa ew demey ke kurdan azad û serbexo bûn/Sultanî mulk û mîllet, sahîbî ceyş û ‘îrfan

Eve di nava vê helbestê de ev beyta ha (29) ji alîyê rexneya edebî ve nûweyekî dihewîne:

*Sed qa'îme û qesîde kes naykîrre be pûlê
Rozname û cerîde û kewtote qîmet û şan*

Yanî Koyî gava dibêje êdî di vê serdemê de kes qaîme û pulek jî nade qesîdeyê, lewra rojname/cerîde qîmet û şan wergirtine, hem li gor ruhê serdemê qîmeta rojname û matbûatê fêm kiribû (ku wê demê hêj tu rojnameya kurdan tunebû) û hem jî didît ku li hember pexşanê, helbesta kevin (ku temsîla wê “qesîde” ye) bêrewac û bêqîmet dibe. Bi gotineka dî beyta wî gava cureyekî nû (nesra nû) payebilind dikir û vemirîna stêrka cureyekî kevin (nezma berê) destnîşan

Coşêk biden wekû heng tegbîr biken be bêdeng/Esbabî şer peyda ken top û tifeng û hawan

Parranewe û tewekkul lem ‘esre pare nake/Tîr e du’ay cewşin peykan e hîrzî meydan

Bo çî beşîrî ême ye’ní Resûlî Ekrem/Hîç ed’iyey nezanî rojê ke deşûwe meydan Wek Xêwa û Buxara bela narwa be hîmmet/Ref’î biken meşayix, def’î biken melatan

Her şêxî kewte şwêni yek dû kesî reş û rût/Xelkî be mûr dezanî, xoy hezretî Suleyman

Yektan neçûne gerdiş wa têdegen le dinya/Her padîşahî rom e û şahî ‘ecem le Taran

Qutbî zemane Xalîd aware bû wekû min/Bê qedr û qîmet û şan, xan û man û bênan

Şîr û qelem şerîk in lem <esre da dirêxa/Şîrim qelemtraş e û kalanî ye qelemdan Em mesele meşhûr e ger qur dekey be sertâ/Iksîr e xak û xolî dermalî gewrema-lan

Tenha ême weha nîn, dîbaçey Mem û Zîn/Halît deka çilo ne ewhalyan suxandan Xotan dellên: Egerçî meşhûrî xas û ‘am e/Her rêuwyek gerabê azatir e le şêran Sed qaîme û qesîde kes naykirê be pûlê/Rozname û cerîde kewtote qîmet û şan Binware se’î û xîret êsta le dewletî Rom /Xoyan xezênedar in, xoyan tebîb û sultan

Her diwênenê ehlî Sûdan hestane pê wekû şér/Êstêke musteqîll in mahsûdî kullî edyan

Bulxar û Sîrb û Yonan, hem Ermen û Qeretax/Her pêncyan be te’dad nabin be quedî Baban

Her êke musteqîll in kullêkî dewletêk in/Sahîbî ceyş û rayet, erkanî herb û meydan

Hem heqqayne ermen xîretkêşî yektir in/Wek ême nîn legel yek de’wa biken be şîran

Bo fennî herb û sen’et, bo zept û reptî mîllet/Deynêrine Urûpa gewre û biçûkanî xoyan

Hacî kesêke bêkes bo êwe qur depêwe/Gwêy lê degrin zerîf e, nagirin bela le xotan.”

dikir, dibû pratika rexneyeka edebî jî.

4. Encam

Hasilî kelam, wekî gelek pêkhateyan di nav kurdan de jî fîkr û meylên nû, di serê sedsala bîstan de li bajarê Stenbolê peyda bûne. Kurdên xwenda yên ku bi kurdbûna xwe hesîyane, di rojname û kovarê kurdî de li pey sebebêna paşmayîna kurdan ketine û di vê çarçoveyê de “rexne”yê wekî nerazîbûnek ji fîkr, meyl, adet, war, sazî û dezgehê berê/kevin/ne-esrî, bi kar anîne. Ew helwesta rexneyî ya ku Paz û Touraine dikir nîşaneyeka serdema modern, li taxa kurdan jî icra û pratîze bûye. Çend rexneyên wan ên ser alim û giregirênu ku ji xema miletê xwe dûr in; fîkrênu wan ên ser perwerdeya bi kurdî û di vê çarçoveyê de islehkirina elifbaya erebî ji bo xwendin û nivîsandina kurdî; daxwazên wan ên ji bo rejîmeka meşrûti, huqûqnas û ademî merkezî û herwiha rexneyên wan ên ser bêkêriya edebîyata kevin a ku ji kêşeyên civakî dûr e, mînakêne vê pratîkê ne.

Çirîya Paşîn-Kanûn 2019/Dîyarbekir

5. Çavkanî

Abdullah Cewdet. “Bir Xitab”. *Rojî Kurd* 1 (6 Haziran 1329/19 Hezîran 1913): 3-4.

Abdullah Cewdet. “İttihad Yolu”. *Rojî Kurd* 2 (6 Temmuz 1329/19 Tîrmeh 1913): 8-10.

Abdullah Cewdet. “Kürdçe Yeni Bir Eser”. *Serbestî* 485 (4 Mayıs 1919): 1.

Ahmed Cemîl. “Milletin Îd-i Ekber-i Hürriyeti”. *Kurd Teavün ve Terakkî Gazetesi* 3 (6 Kanun-u Evvel 1324/19 Kanûn 1908): 17-18.

Ahmed Cemîl. “Milletin İlk Şehrayîn-i Arûs-i Hâkimiyeti”. *Kurd Teavün ve Terakkî Gazetesi* 2 (29 Teşrîn-î Sanî 1324/12 Kanûn 1908): 11-12.

Alan, Remezan. “Qonaxa Stenbolê di Edebîyata Kurdî ya Modern de”. *Nûbihar Akademî* 3, (Cild 2, Sal 4, 2017): 241-263.

Alan, Remezan. *Keşkûl*. Stenbol: Peywend, 2019.

Baban Abdulazîz. “Edebîyyâtımız ve Udebâmızdan Bir Ricâ». *Rojî Kurd* 4 (30 Ağustos 1329/12 Îlon 1913): 13-14.

Babanzade Ismaîl Haqqî. “Kürdceye Dair”. *Kurd Teavün ve Terakkî Gazetesi* 3 (6 Kanun-u Evvel 1324/19 Kanûn 1908): 18-19.

Babanzade Ismaîl Haqqî. “Kurdler ve Kurdistan”. *Teavün ve Terakkî Gazetesi* 1 (22 Teşrîn-î Sanî 1324/5 Kanûn 1908): 3-4.

Babanzade Ismaîl Haqqî. “Kurdlerin Tealisi”. *Rojî Kurd* 3 (1 Ağustos 1329/14

- Tebax 1913): 2-4.
- Bediuzzaman Said Nursî. *İçtimaî Dersler*. İstanbul: Zehra Yayıncılık, 2006.
- Celîl, Celîlê. *Kürt Aydinlanması*. wer. Arif Karabağ. ç. 2. İstanbul: Avesta, 2013.
- Demir, Bahattin. "Kurd Meşrutiyet Mektebi". *Toplumsal Tarih* 200 (Ağustos 2010): 72-78.
- Fîkrî Necdet. "Cotkarî". *Rojî Kurd* 1 (6 Haziran 1329/19 Haziran 1913): 24-25.
- Hacî Qadirî Koyî. *Dîwanî Hacî Qadirî Koyî*. (amd.) Serdar Hemîd Mîran & Kerîm Mustefa Şareza. Sine: İntisaratî Kurdistan, 2012.
- Kamiran Alî Bedirxan. "Kurd Lisâni". *Serbestî* 486 (5 Mayıs/Gulan 1919): 1.
- Kamiran Alî Bedirxan. "Kurd Lisânının Tedvini". *Serbestî* 480 (29 Nisan 1919): 1.
- Kerkûklî Necmedîn. "Kurd Ulemasına". *Hetauwî Kurd* 1 (11 Teşrîn-î Evvel 1329/24 Çırıya Pêşîn 1913): 10-13.
- Kerkûklî Necmedîn. "Kurd Ulemasına-2". *Hetauwî Kurd* 2 (21 Teşrîn-î Sanî 1329 /4 Kanûn 1913): 10-13.
- Lutfî Fîkrî. "Kurd Milliyeti". *Rojî Kurd* 4 (30 Ağustos 1329/12 İlon 1913): 2-5.
- M. S. Azîzî. "Hişyar Bîn". *Rojî Kurd* 2 (6 Temmuz 1329/19 Tîrmeh 1913): 23-24.
- M. S. Azîzî. "Hurûfumuz ve Teshîl-i Kirâat". *Rojî Kurd* 2 (6 Temmuz 1329/19 Tîrmeh 1913): 12-13.
- M. X. "Bextreşî û Mehrûmiyyâ Kurdan". *Rojî Kurd* 3 (1 Ağustos 1329/14 Tebax 1913): 29-31.
- Mewlanzade Rıfat. "Muhterem 'Hetawî Kurd' Gazetesi Muessîslerine". *Hetauwî Kurd* 2 (21 Teşrîn-î Sanî 1329/4 Çile 1913): 2-3.
- Midhat Bedirxan. "Bîsmîlahîrrehmanîrrehîm". *Kurdistan* 1 (9 Nisan 1314/21 Nîsan 1898): 1-4.
- Midhat Bedirxan. "Bîsmîlahîrrehmanîrrehîm". *Kurdistan* 2 (23 Nisan 1314/5 Gulan 1898): 1-4.
- Midhat Bedirxan. "Fazîlet'ul 'Ilm". *Kurdistan* 4 (21 Mayıs 1314/2 Haziran 1898): 3-4.
- Midhat. "Kuvâ-yi Umûmiyye-i Hükûmet Sûret-i Zuhûru, Lüzüm-i Tefrik ve Muvazeneti ve Bu Husûsdaki İhtilafat-ı Efkâr ve Bu Bâbda Olan Nazariyyât". *Rojî Kurd* 1 (6 Haziran 1329/19 Haziran 1913): 14-17.
- Mihemed Tahir Cezerî. "Gelî Birakên Ezîz û Gelî Kurmanca". *Kîrd Teavün ve Terakkî Gazetesi* 6 (27 Kanun-u Evvel 1324/9 Çile 1909): 37-38.
- Modanî, X. "Ziman û Nezanîya Kurdan". *Rojî Kurd* 2 (6 Temmuz 1329/19 Tîrmeh 1913): 29-30.
- Paz, Octavio. *Çamurdan Doğanlar*. wer. Kemal Atakay, İstanbul: Can Yayınları, 1996.
- Qazî Letîf. "Xezel". *Jîn* 7 (2 Kanun-u Sanî 1335/2 Çile 1919): 14-15.
- Qazîzade Mistefa Şewqî. "Mekteb Çî ye?". *Hetauwî Kurd* 3 (29 Kanun-u Evvel 1329/11 Çile 1914): 30-31.
- Said-i Kûrdî. "Îfade-i Meram". *Kîrd Teavün ve Terakkî Gazetesi* 6 (27 Kanun-u

- Evvel 1324/9 Çile 1909): 43-44.
- Seyyah Ahmed Şewqî. "Gelî Welatîyan". *Kürd Teavün ve Terakkî Gazetesi* 2 (29 Teşrîn-î Sanî 1324/ 12 Kanûn 1908): 16.
- Seyyah Ehmed Şewqî. "Ey Gelî Kurdan". *Kürd Teavün ve Terakkî Gazetesi* 1 (22 Teşrîn-î Sanî 1324/5 Kanûn 1908): 7-8.
- Seyyîd Muhammed Îsmetullah. "Kurdistanda Maarif". *Kürd Teavün ve Terakkî Gazetesi* 9 (17 Kanun-u Sanî 1324/30 Çile 1909): 78-79.
- Silêmanî Ebdulkérîm. "Tal û Şîrîn". *Rojî Kurd* 1 (6 Haziran sene 1329/19 Hezîran 1913): 21-23.
- Suleyman Nazîf. "Kürd ve Kürdistan". *Kürd Teavün ve Terakkî Gazetesi* 2 (29 Teşrîn-î Sanî 1324/12 Kanûn 1908): 9-10.
- Suleymanîyelî Mes'ûd. "Hurûfumuz ve Teshîl-i Kırâati". *Rojî Kurd* 1 (6 Haziran 1329/19 Haziran 1913): 18.
- Touraine, Alain. *Modernliğin Eleştirisî*. wer. Hülya Tufan, ç. 5, İstanbul: YKY, 2004.
- Xarpûtlî H. B. "Garbla Şark, Millîyet Cereyanları". *Rojî Kurd* 1 (6 Haziran 1329/19 Haziran 1913): 8-9.
- Xelîl Xeyalî, "Weten û Îttîfaqa Kurmanca», *Kürd Teavün ve Terakkî Gazetesi* 8 (10 Kanun-u Sanî 1324/23 Çile 1909): 69-70.

TEVGERA KURD A LI STENBOLÊ DI DESTPÊKA SEDSALA 20AN DE

Tahîr BAYKUŞAK

Destpêk

Têkiliya Kurdan û Dewleta Osmaniyan ji nîveka sedsala 16an dest pê dike. Rêvebirên Osmanî baş dizanin ku xaka Kurdistanê di navbeyna wan û Safewîyan de heremeke tampon e.¹ Lewre jî ji bo aramiya desthilatiya xwe li vê heremê rêvebireyeke cuda dipejirînin: *Hikûmet û Yurtluk-Ocaklık*. *Hikûmet* beramberiya Mîrekiyêñ *Kurdan* tê ku ji xeynî wextên şerî bi tevahî serbixwe ne.² Hin akademisyenên tirk hewl dane û hê jî hewl didin da ku destnîşan bikin rêvebiriyyêñ *Hikûmet û Yurtluk-Ocaklık* tenê ne li Kurdistanê ne.³ Her çiqas di vî warî de hewl bidin jî, di xebatêñ wan bi xwe de tê dîtin⁴ ku rêvebiriyyêñ *Hikûmetan* tenê li Kurdistanê hebûne. Seyyah û peywirdarekî navdar ê osmanî, Evliya Çelebî ku di sedsala 17an de çend neqil çûye Kurdistanê, hejmara Hikûmetan 12, a Yurtluk-Ocaklıkan jî derdora 200î destnîşan dike.⁵ Yurtluk-Ocaklık di mijara serbixwebûnê de dereceyek ji Hikûmetan kêmîtir in ango tesîra Osmaniyan li gorî Hikûmetan li ser wan zêdetir e.

Têkiliya Dewleta Osmanî û kurdan ji destpêka sedsala 16an heta sedsala 19an mirov dikare bibêje ku bi awayekî stabil domiyaye. Her çiqas di vê dewrê de midaxeleyêñ Dewleta Osmanî li ser Mîrekiyêñ Kurdan hebin jî ev mudaxele mudaxeleyêñ esasî nînin û ar-

1 Evliya Çelebi , Yücel Dağlı, *Evliya Çelebi Seyahatnamesi*, c. 10 (İstanbul: Yapı Kredi Yayınları, 1996), 38.

2 Ahmet Akgündüz, *Osmanlı kanunnameleri ve hukuki tablilleri*, FEY Vakfı Yayıncılık; İlimi araştırmalar serisi, v. 4. pt. 1 (İstanbul: FEY Vakfı, 1992), 463.

3 Orhan Kılıç, “YURLUK-OCAKLIK VE HÜKÜMET SANCAKLAR ÜZERİNE BAZI TESPİTLER”, OTAM(Ankara, 1999, 125, https://doi.org/10.1501/OTAM_0000000425.

4 Kılıç, 125.

5 Evliya Çelebi, Yücel Dağlı *Evliya Çelebi Seyahatnamesi*, c. 10 :37-38.

manc ne ew e ku desthilatdariya mîrekiyan bi tevahî ji holê bêrakirin.⁶ Lê ev yek di destpêka sedsala 19an de tê guherîn. Dewleta Osmanî di sedsala 19an de polîtikayên navendîkirinê esas digire û li gorî vê yekê jiholêrakirina hêzên periferiyê dide ber xwe. Dema di nîveka sedsala 19an de Mîrekiya Botanê jî ji holê tê rakirin, li Kurdistanê dewreya Mîrnişînê Kurd jî diqede.

Dewleta Osmanî dema mîrektîyekê ji holê radike sirgûnê li mîr, malbata wî û rêvebirêne mîrnişînê ferz dike. Dewlet di vê dewreya sirgûniyê de ji qabiliyeta van kesan a rêvebiriyê sûd werdigire û di nav burokrasiya xwe de wan bi cih dike. Bi vê yeke hewl dide ku entegrasyona van kesan bi dewletê re pêk bîne. Li gel vê yekê zar û ziçen van kesan jî di dibistanê modern ên împaratoriyê de perwerde dibin. Her çiqas armanc entegrekirina wan be jî hin ji wan zarakan li van dibistanan rastî fîkrîn modern ên vê serdemê têr û di nav tevgera neteweperwer a kurd de cih digirin.

Ji ber van sedemên jorîn mirov dikare bêje ku tevgera kurd a modern ji ser axa xwe bêtir li paytexta Osmaniyan, li Stenbolê teşe girtiye.

Stenbol

Stenbol ji sala 330an heta sala 1922an bênavber bûye paytexta împaratoriyan, lewre jî her tim bala nivîskar, zana û aliman kişandîye. Her wiha împarotoran jî hewl dane ku zana, şair û alimên serdemâ xwe li paytexta xwe bi cih bikin⁷. Wekî Nabiyyê Rihayî dibêje, neqş û teswîr, xet û tezhîb li Stenbolê dibin zêr û zîv⁸ ango qedr û qîmeta hunermend, zana û aliman li vî bajarê tê girtin. Dîroka hebûna zana û alimên kurdan li Stenbolê kevn e. Kesêن wekî Molla Goranî û Îdrîsê Bi(d)lîsî hê di sedsala XV û XVIan de hatine vî bajarî û li vir çûne ser dilovaniya xwe. Hebûna alim û zanayên kurd ya li vir di sedsala 19 û 20an de jî berdewam kiriye. Mirov dikare kesêن wekî Nalî, Şêx Riza Telebanî, Keyfî, Koyî, Seîdê Kurdî, Mihemmed Mîhrî û hwd. ji bo vê yekê mînak bide. Lê sirgûniya mîrektiyê kurdan a sedsala 19an li vî bajarî derdoreke kurdewar pêk anije.

6 Evliya Çelebi vd., *Evliya Çelebi Seyahatnamesi*, Yapı Kredi Yayınları 1228, 1536 (İstanbul: Yapı Kredi Yayınları, 2006), 147-48.

7 Judith Herrin, *Bizans: bir ortaçağ imparatorluğunun şâşîrtıcı yaşamı =: Byzantium: the surprising life of a medieval empire*, 1st ed, İletişim Yayınları ; Tarih Dizisi, 1463. 59 (İstanbul: İletişim, 2010), 39.

8 Mahmut Kaplan ve Nabi, *Hayriyye-i Nâbî: inceleme-metin*, Üçüncü baskı, Atatürk Kültür Merkezi Yayıncılık: 447. Araştırma - İnceleme Dizisi: 109 (Ankara: Atatürk Kültür Merkezi, 2015), 100.

Ligel malbatên mîrektiyan mirov li Stenbolê dikare behsa sê komên din jî bike: karmend, xwendekarêن dibistanê bilind û hemal. Piştî politikayêن navendîkirin û modernizasyonê pêdiviya borukrasiya Osmanî bi karmendên nû çêdibe û di nav van karmandan de karmendên kurd jî cihê xwe li navenda burokrasiyê ango li Stenbolê digirin. Dibistanê di asta zaninehê de hemû li vî bajarî ne, lewre ji Kurdistanê ji bo xwendina bilind xwendekarên kurd têن vî bajarî. Ligel malbatê arîstokrat, karmend û xwendekaran di warê nifûsê de rîjeya herî zêde mirov dikare bi hêsanî bêje ku rîjeya hemalan e. Hatina hemalên kurd ji bo vî bajarî di dawîya sedsala 19an de, bi taybetî piştî êrîşa Bankaya Osmanî zêde dibe.⁹

Piştî ku bi kurtasî min behsa Stenbolê kir ez ê hewl bidim ku di sê serdeman de tevgera kurd a li Stenbolê binirxînim: A-Berî Meşrûtiyeta II. B- Dema Meşrûtiyeta II. C-Serdema Mutarekeyê.

A. Berî Meşrûtiyeta II.

Bêguman piştî ku mîrektiyyên Kurdan ji holê têن rakirin li Kurdistanê gelek serhildanên biçûk û wekî serhildana Şêx Ubeydullahê Nehrî serhildanên mezin pêk tin.¹⁰ Lê belê ji ber ku di vê nivîse de armanca me tevgera Kurd a li Stenbolê ye em ê li ser wan serhildanan nesekinin.

Berî Meşrûtiyeta II. pirtûka *Emîr Bedirxan* ku Kurdîzade Ahmed Ramîz nivisiye, her çiqas li ser navê *Kurd Azmî Kavî Cemiyetî* hatîbê belavkirin jî mixabin di derbarê vê saziyê de em ne xwedî agahiyêن zêde ne.¹¹ Ji ber ku di desthilatdariya dûvûdirêj (1876-1909) a Eb-dulhemîdê II. de li Stenbol an jî li nav sînorêñ împarotoriyê avakirina saziyêñ netewî û weşanêñ netewî ne pêkan e, rewşenbîrêñ Kurd berê xwe didin derveyê împaratoriyê. Cihê ku zêdetir derdikeve pêş

9 Rohat Alakom, *Eski İstanbul Kürtleri, 1453-1925*, 2. baskı, Şehir 1 (Beyoğlu, İstanbul: Avesta, 2012), 177.

10 Hans Lukas Hieser, *İskalanmış Barış: Doğu Vilayetleri’nde Misyonerlik, Etnik Kimlik ve Devlet 1839 - 1938*, 2005, 169;

Yener Koç, *Bedirxan Pashazades: power relations and nationalism (1876-1914)*, 2012, 58; Bogaziçi University Graduate Program in History, Celile Celil, *1880 Şeyh Ubeydullah Nehri Kürt Ayaklanması* (İstanbul, 2014). https://www.youtube.com/watch?v=YM_ksWGaYV8

11 Lütfi (Ahmed Ramiz), *Emir Bedirhan, 20.yy’ın Başlarında Kürt Milliyetçi Söylemine Bir Örnek*, Osmanlı Kaynaklarında Kürtler Çalışma Grubu (İstanbul: BGST yayınları, 2007), 20.

Qahîre ye. Berî meşrutiyetê du weşanên kurd Ûmîd¹² û *Kurdistan*¹³ li vir têن weşandin. Her du rojname jî ji alîyê endamên malbata Bedirxaniyan ve tên weşandin. *Umîd* ji alîyê Salih Bedirxan ve di sala 1900an de li Qahîreyê tê belavkirin lê mixabin ji hêjmarekê pê ve li ber deste me nîne. *Kurdîstan* ku di 22 Avrêla 1898an li Qahîreyê tê belav kirin di heman demê de wekî destpêka dîroka rojnamegeriya Kurdî jî îro tê qebîlkirin. *Rojnameya Kurdistanê* heta 1902an bi rêk û pêk nebe jî weşana xwe didomîne. Her çiqas piraniya nivîsan di serî de ji aliye Mikdat Midhad Bedirxan, paşê jî ji alîyê Abdurrahman Bedirxan ve hatibin nivisîn jî bêguman berhemeke girîng a berî serdema Meşrûtiyeta II. e.

B. Îlankirina Meşrûtiyeta II.

Hin serbazên Artêşa Sêyemîn ku ev artêş li Balkanan bi cih e, dema li hember Abdulhamîtê II. derdikevin ser çiyan û serî hildidin, Abdulhamîdê II. jî neçar dimîne ku 23yê Tirmeha 1908an Meşrûtiyeta II. ilan bike.¹⁴

Huseyin Kamî Bey¹⁵ ku Kurdîzade Ahmed Ramîz pirtûka wî ya bi navê *Divançe-i Dehri* diweşîne û ji ber vê yekê tê sircûnkîrin îlankirina Meşrûtiyeta II. bi vî hawayê teswîr dike:

...Welat piştî ji istibdata 33 salan filitî ji nişka ve xwe di nav azadiyekî de dît Me teva hiş avêtibû.. Mele, xaxaman; keşeyan erd maç dikirin. Qet ji bîra min naçe li baxçeyê Tepebaşiyê min daxuya-niyeq dida.. Hemalekî ermen min hemêz kir, rûyê min û çavên min maç kir û bi îskeîsk got şikir ku me van rojan jî dît.¹⁶

Di serdema pêşîn a meşrûtiyetê de, di derbarê kurdan de, di weşanên cûrbicûr de agahî derbas dîbin. Bi taybetê ji ber ku di vê serdemê de hewldana çareserkîna pirsgirêkên di navbera kurd û ermenan de heye, çapemeniya ermenan di derbarê kurdan de ge-

12 UMMID, Pazdeh rojan carekî tê weşandin, Xwedî û nivîskarê wê, Bedirhan Paşazade Mehmed Salih, 1 September 1900, Mısır

13 *Kurdistan*, Pazdeh Rojan carekî têt nivîsandin, Xwedî û nivîskarê wê, Bedirxan Paşazade Mikdad Midhat, 22 Nisan 1898, Mısır

14 Enver Paşa ve Halil Erdoğan Cengiz, *Enver Paşa'nın anıları (1881-1908)*, Genel yayın 1016 (İstanbul: Türkiye İş Bankası Kültür Yayınları, 2006), 90.

15 Ahmet Tanyıldız, son erişim 15.12.20 <http://teis.yesevi.edu.tr/madde-detay/kami-huseyin-kami-bey>

16 Dehri, *Divançe-i Dehri*, 2. Baskı (İstanbul: Kürdizade Ahmed Ramiz, 1330), 2.

lek nûçeyan diweşîne.¹⁷ Her wiha çapemeniya Osmanî jî di derberê kurdan de nûçeyen balkêş diweşîne. Yek ji van weşanan *Tanîn* e ku weşana fermî ya Îttihat Terakkîyê (İT) tê qebûlkirin. Di 1909an de nûçeyek bîçûk di vê rojnameyê de çap bûye. Li gorî vê nûçeyê dê li Stenbolê *Bankaya Kurd* bi 200.000 qurûş sermaye ava bibe. Her wiha di nûçeyê de tê destnîşankirin ku li Stenbolê 35.000 kurd dijîn.¹⁸ Li gorî agahiya rojnameyê di 1909an de bajarê herî zêde lê kurd dijîn wekî iro jî Stenbol e.

II. Komeleya Kurd A Alîkarâ û Pêşketinê

Piştî îlankirina meşrûtiyetê li Stenbolê sazî û dezgehêwan millestan jî vedibin ku heta wê demê di bin banê dewleta Osmanî de ne.¹⁹ Her wiha ev bayê azadiyê li ser weşangeriyê jî tesîreke erênî dike û bi sedan rojname û kovarênu li Stenbolê têne weşandin. Yekser piştî îlankirina meşrûtiyetê komeleya “*Kurd Teavun ve Terakki Cemiyeti*” (*Komeleya Kurd a Alîkarû û Pêşketinê KKAP*) tê avakirin û bi heman navî rojnameya komeleyê jî (*Rojnameya Kurd a Alîkarî û Pêşketinê RKAP*) derdikeve. Her wiha di vê serdemê de bi navê *Kurdistan*²⁰ ji alî malbata Berdirxaniyan ve, û bi navê Şark ve *Kurdistan*²¹ ji alîyê Bedriyê Meletî ve du weşan têne weşandin û di nava çapemeniya kurdan a wê serdemê de cihênxwe digirin.

Mezinên Kurdan ên ku xwedî paşxaneyên cûrbicûr in, bi avakirina *KKAP*ê fersenda xebata bi hev re bi dest dixin. Seyîd Evdilqadîrê kurê Şêx Ubeydullahê Nehrî wekî serokê komeleyê derdikeve pêş, ligel wî Malbata Berdirxaniyan û Babanan jî wekî malbatên mîrnişinan di komeleyê de cihênxwe digirin. Bedîuzzeman Seîdê Kurdi, Xelîl Xeyalî, Pîremêrd û Ehmed Cemîlê Diyarbekirî wekî kesayetên serbixwe derdikevin pêş.

Rojnameya *Kurdistanê* ku berî *RKAP*ê hatîbû weşandin pirayî xwedî nivîskarek tenê bû û ji xeynî helbestek bîçûk a Hacî Qadirê Koyî tenê bi zaravayê kurmancî nivîs tê de hebûn. Lê *RKAP* him xwedî gelek nivîskar e him jî bi du zaravayên kurdî, kurmancî û soranî nivîs tê de hene. Di neh hejmarêni *RKAP*ê de ku li ber destêni

17 Celilê Celil, *Kürt Aydınlanması*, I. Baskı (İstanbul: Avesta, 2001), 59-60,

18 Tanin, Hejmar 161. 12 Kanunusani 1909, Stenbol, 4

19 Tarık Zafer Tunaya, *Türkiye'de siyasal partiler*, Genişletilmiş 2. baskı, c. V.1 İkinci Meşrutiyet Dönemi (İstanbul: Hürriyet Vakfı Yayınları, 1984), 3.

20 Koç Yener, *Kürdistan Gazetesi* (1908-1909) Üzerine Birkaç Not, *Kürt Tarihi Dergisi*, no 8, (2013).

21 Bozkurt Serhat, Bir II. Meşrutiyet Gazetesi Olarak: Şark Ve Kurdistan, *Kürt Tarihi Dergisi* no:8, (2013)

me hene, mirov dikare kar û xebatên komeleyê û fikr û ramanê rewşenbîrêñ kurd bişopîne.

Di nav rûpelên rojnameyê de gelek agahî di derbarê çareserkirina pirsgirikêñ di navbera kurd û ermenan de hene. Her wiha agahiyâ ya avakirina baskêñ komeleyê li Kurdistanê dide xuyakirin ku armanca komeleyê ya li Kurdistanê birêxistin bibe, heye. Agahiyêñ rojane yên ji Kurdistanê û Stenbolê di hemû hejmarêñ rojnameyê de li ber çavan dikevin. Ji ber seqaya germ a meşrûtiyetê, vegotina Osmanîtyê û baweriya bi İttihat Terakkî û artêşê xurt e²². Lê ev yek nayê maneya ku di derbarê kurdayetiyê de ti tiş nîne.

II. Komeleya Kurd A Belavkirina Perwerdeyê (Kurd Neşr-i Mâarif Cemiyeti)

Yek ji komeleyêñ kurdan ên piştî Meşrûtiyetâ II. avabûye ev komele ye. KKAP zêdetir wek komeleyeke siyasi derdikeve pêşberê me lê ev komele bêtir wekî komeleyeke rewşenbîr xuya dike. Kar û xebata vê komeleyê a herî li ber çav û girîng vekirina *Dibistana Kurd a Meşrûtiyetê* ye. Di sala 1910an de destûra vekirina vê dibistanê tê dayin.²³ Mixabin bi eseyî em nizanin ku çend salan vekirî maye lê sala 1911an navê dibistanê di lîsteya dibistanêñ ku ji wezareta perwerdeyiyê alîkarî digrin de dertê hemberî me Kesêñ ku di avakirin û rêvebirina vê komeleyê de dertêñ pêş, kesêñ wekî Abdullah Cevdet, Abdurrahman Bedirxan, Xelîl Xeyalî, Seîdê Kurdi û Ahmed Ramîzê Liceyî ne.

III. Bûyera 31 Adara 1909an

Piştî çend mehan li dû ïlankirina Meşrûtiyetê, di 31ê Adara 1909an de li Stenbolê li dijî meşrûtiyetê bûyer pêk tên. Li ser vê yekê Artêşa Tevgerê ji Balkanan bi rê dikeve û tê Stenbolê. Li Stenbolê “orfi idare” tê ïlankirin û Adulhemîdê II. ji têxt tê daxîn. Piştî bûyerêñ 31ê Adarê gelek sazî û weşan tên girtin. Di nav van sazî û weşanan de yên hatî girtin, KKAP û weşana wê jî heye. Girtina sazî û weşanan di baweriya bêsinor a bi meşrûtiyetê û Osmanîtyê de sikestinek peyda dike.

Fikra Osmanîtyê di serdema Tanzîmatê de li hember fikra neteweperwerîyê ji alîyê rêveberêñ dewletê ve tê sazkirin. Armanç ew

22 Bozarslan, M. Emîn, çev., *Kurd Teavün ve Terakki Gazetesi : kovara kurdi-tirkî/kurdî* (Uppsala: Deng, 1998), 392.

23 Demir Bahattin, Devlet Destekli Eğitim-Kurd Meşrûtiyet Mektebî, Toplumsal Tarih, 200, r,75 (Ağustos 2010).

e ku bi saya fikra Osmanîtiyê pêşî li rôexistinê netewî bê girtin. Bingeha fikra Osmanîtiyê ew e ku ol û netewe cuda bin jî hemû gel û bawerî bikarin di bin sîwana Osmanîtiyê de bi hev re bijîn. Ji 1839an ku ferma Tanzîmatê tê îlankirin û heta 1876an, wekî dewreya Tanzîmatê tê binavkirin û fikra Osmanîtiyê fikra bingehîn a dewletê ye. Abdulhamît II. di 1876an derdikeve ser textî û heyâ 1909an li ser textî dimîne. Di dewra Abdulhamît II. de fikra Osmanîtiyê paş dikeve dêlva wî fikra Îslamîtiyê derdikeve pêş û ev serdem wekî serdema Abdulhemîd II. tê binavkirin. Helbet di vê dewrê de jî fikra Osmanîtiyê heye lê êdî ne fikra dewletê ya esasî ye. Fikra Osmanîtiyê êdî ji alîyê kesên muxalîfê Abdulhamît II. ve tê bikaranîn û dibe alava yekgirtina mixalefeta li hember Abdulhamît II.²⁴ Di dewreya Meşrûtiyetê de jî vegotina Osmanîtiyê fersend dide tevgerên neteweyî da ku kar û barêن xwe bi hêsanî bikin. Helbet ev yek ji bo destpêkê derbasdar e.

Di 23.01 1913an de dema fedaiyêن ÎTyê êrîşê dibin ser Bab-i Alîyê û dest datînin ser desthilatdariyê, dewreya netewerestiya Tirk a bi destê dewletê dest pê dike. Bêguman dema neteweperestiya Tirk dibe dewletî di bîr û baweriya wan gelan de yên ku heyâ wê demê di bin banê dewleta Osmanî de dijîn, şikestinek esasî çê dike.

IV. Komeleya Xwendekarêن Kurd Hêvî

Di sala 1912an de ji alîyê xwendekarên kurd yên xwendina xwe ya bilind li Stenbolê pêk tînin, bi navê *Komeleya Xwendekarên Kurd Hêvî* komeleyek tê avakirin.²⁵ Hêvî her çiqas komeleyek xwendekaran be jî hewldana wê ya vekirina şubeyan heye.²⁶ Wekî KKAPê rasterast kar û xebatên siyasi nameşîne lê belê him di wê dewrê de him jî paşê kesên ku di derbarê komeleyê de dinivisînin eşkere qala armancêن wê yên siyasi dikan.²⁷

Nêrîna li weşanêن *Hêviyê* di derbarê rêç û baweriya vê komeleyê

24 M. Şükrü Hanioğlu, *A Brief History of the Late Ottoman Empire* (Princeton: Princeton University Press, 2008).

25 Malmisanij, *İlk legal Kürt öğrenci Derneği, Kürt Talebe-Hêvî Cemiyeti, 1912-1922*, 1. baskı, Araştırma: 121 / 14 (Beyoğlu, İstanbul: Avesta Basın Yayın, 2002), 50.

26 Kadri Cemil Paşa, *Doza Kurdistan =: (Kürdistan davası): Kürt milletinin 60 yıllık esaretten kurtuluş savaşı hatıraları*, 2. basım (Ankara: Öz-Ge Yayınları, 1991), 30.

27 Kadri Cemil Paşa, 27; Mehmet Emin Bozarslan, *Jîn (1918-1919) - I*, c. I (Uppsala: Deng yayınları, 1985), 304-5, <https://bnk.institutkurde.org/catalogue/detail.php?pirtuk=1244&l=en>.

de agahiyêñ baş dide mirov. Dema mirov li *Rojî Kurd* û *Hetawî Kurd* dinêre û van her du weşanan bi *RKAPê* re miqayese dike mirov dibîne ku ev her du weşan zêdetir bi kurdayetteyê re têkildar in. Ango mijarêñ zimanê kurdî, edebiyata kurdî, dîroka kurdan bêtir bala nivîskarêñ her du kovaran kişandiye.²⁸ Wekî me berê jî behs kiribû *RKAP* ji ber tesîra îlankirina Meşrutiyetê û rewşa wê demê di rûpelên wê de vegotina Osmanîtyê xurt e. Lê serdema *Rojî Kurd* û *Hetawî Kurd* tên weşandin êdî ne germahîya meşrûtiyetê ne jî pêbawerî maye. Weşanêñ Hêviyê piştî Bûyera 31 Adarê, Şerê Balkanan û desteserkirina desthilatdariyê ji alîyê İttihat û Terakiyê ve dertêñ. Arnawidêñ ku di destpêka Meşrûtiyetê de pesnê wan tê dayîn êdî navê wan nayê hildan, ji ber ku serî hildane û serxwebûna xwe bi dest xistine. *KKAPê* komeleya yekemîn a fermî ya kurdan e, caran

28 Gülseren Duman ve Nadir Özbek, “The formations of the Kurdish Movement(s) 1908-1914: Exploring the footprints of Kurdish nationalism” (2010), 130. like their contemporaries in the Ottoman Empire that a regime based on democracy, equality, libertyand the rule of law had been inaugurated. With this beliefKurdish intellectuals, who came from Kurdish notable families, opened many organizations in Istanbul to revive Kurdish culture, language and history, upon two of which this study focused. The journals of these two organizations together with archival documents were utilized to understand the agendas of the Kurdish intellectuals of the era. The first organization after therevolution, Kürd Teavün ve Terakki Cemiyeti was opened in Istanbul in 1908. As this organization was founded immediately after the 1908 revolution, it depicts not onlythe program of Kurdish intellectuals for the development of Kurdish people, but also their agendas developed for “Ottoman citizenry” as it is called in this study, which was appropriate to the atmosphere of the era. The circle of this organization one the one hand, by opening branchesin Kurdish provinces worked for the reception of the new regime by the local Kurds, which was not a smooth process.On the other hand, they collaborated with some Armenian organizations in Istanbul to achieve a reconciliation between Kurds and Armenians in the Anatolia. The second main organization this study focuses on was opened in 1912and proposed a more compact agenda for construction of a Kurdish national identity, which released in a set of parameters like emphasis on language, culture, history andhistorical figures as a way of creating a common bond among Kurds. Therefore a discursive analysis between the Kürd Teavün ve Terakki Cemiyeti and Kürd Talebe Hêvî Cemiyeti portrays the shifts between the two organizations; a discursive shift from “Ottoman citizenry” to “Kurdism,” which this study finds very important for the periodization of Kurdish Movement. Basedon this analysis, this thesis argues that the first seeds of Kurdish nationalism can be traced in this discursive shift”, ”call-number”:”HTR 2010 D86”, ”number-of-pages”:”180”, ”source”:”seyhan.library.boun.edu.tr Library Catalog”, ”title”:”The formations of the Kurdish Movement(s) Zaninehe Bogaziçiyê Teza Masterê

ewil e ku saziyek hewl dide kurdan di bin banê xwe de bicivîne. Lewre jî dema mirov li agahî û nivîskarên rojnameyê dinêre leqayê kesên wekî Seîdê Kurdî, Pîremêrd, Ziya Gokalp, Suleyman Nazif, Seyîd Abdulqadir, Xelîl Xeyalî û Kor Huseyin Paşa tê ku xwedî paşxane û fîkr û ramanên cûrbicûr in. Pişti Bûyerê 31 Adarê KKAP û RKAP hatine girtin, ligel wê her çiqas em dîroka wê ya teqez nizanibin jî Dibistana Kurd a Meşrûtiyetê hatiye girtin, di ser de jî İTYa ku baweriyek xurt pê hebû dest bi neteweperestiya tirkîtiyê kirîye. Ji ber van sedeman mirov dikare bêje ku baweriya bi Osmanîtiyê bi tevahî şikestiye. Tenha di mijara şerê Balkanan û koçberên Balkanan de mirov xemxwariyeke olî û Osmanîtiyê dibîne.²⁹ Mirov vê yeke jî bi hêsanî bi pir-nasnameyiya wê deme re dikare girê bide.³⁰ Dema Dewleta Osmanî tevlî Şerê Cihanê yê yekemin dibe hemû kar û barêni siyasî û çandî radiwestin û çar salêni bêdengiyê dest pê dike.

C. Dema Mutarekeyê (1918-1922)

Pişti çar salêni Şerê Cihanê yê Yekemin, Dewleta Osmanî daxwaza agirbestê ji împaratoriya Brîtanyayê dike. Li ser vê daxwazê peymana ku 30 Cotmeha 1918an tê imzekerin wekî Agirbesta Mondrosê an jî Mutarekeya Mondrosê tê bênavkirin. Ji imzekerîna Agirbesta Mondrosê heta 1 Sermaweza 1922an wekî serdema mutarekeyê tê binavkirin. Hilweşîna împaratoriya Osmanî êdî teqez e, Stenbol jî di bin hikmê hêzên hevpeymanîyê de ye. Di van şert û mercan de rewşenbîr û siyasetmedarên kurdan ên li Stenbolê dest bi kar û xebatêni siyasî û çandî dikan. *Prensibên Wilson* di vê serdemê de tesîrê li hemû derdorêni siyasî dike û pirî caran çarçoveya vegotina wan a siyasî diyar dike.³¹¹⁴ prensîbêni serokdewletê DYAyê Woodrow Wilson ku berî şer kuta bibe di Kongreya Amerîka de dixwîne, tesîrê li pêvajoya li dû şerî jî dike. Xala dozdemîn ku bi mijara me ve girêdayî, destnîşan dike ku gelên heyâ wê deme di bin banê Osmanî de jiyane wê fersenda ku li ser axa xwe azad bijîn, bi dest bixin. Lewre hemû tevgerêni neteweperwer ên wê demê daxwazêni xwe dispêren

29 *Rojî Kurd*, Koma Xebatêni Kurdolojiyê, Kürdoloji Çalışmaları Grubu (İstanbul: Weşanîn Enstituya Kurdî ya Stenbolê, İstanbul Kürt Enstitüsü, 2013). 163-164

30 Bülent Bilmez, "Modern ve geleneksel Kolektif Kimlikler ve Osmanlı Vatandaşlığı Arasında; Osmanlı Aydını Üzerine Notlar", *Toplumsal Tarih*, 20, no. 182, (2009).

31 Nesim Şeker, "Ethnic Conflicts in Anatolia and the Establishment of the Turkish Republic" (P.h.d, Ortadoğu Teknik Üniversitesi, 2002), 52.

prensîbêن Wilson.³² Konferansa Parîsê ya Aştiyê ya 18ê Rêbendana 1919 û Peymana Sewrê ya 10 Tebaxa 1920ê³³ jî di bin tesîra van prensîban de bi rê ve diçin.

I. Komeleya Berzbûna Kurdistanê, (KBK)

Komeleya esasî ya Kurdan a vê serdemê KBK ye û 17 Berfanbara 1918an de bi awayekî fermî hatiye vekirin³⁴. Wekî KKAPê dîsa di bin serokatiya Seyid Evdilqadir de tê avakirin. Malbata Bedirxaniyan û Babanan baskên xurt ên komeleyê ne. Her wiha karmend, leşker, esnaf û hemal jî di komeleyê de cih digirin. Rewşenbîrên ku di komeleya KKBPWê (Komeleya Kurd a Belavkirina Perwerdehiyê û Weşanê) de dixebeitin wek endamên xwezayî tên qebûl kirin.³⁵ Di kovara Rojî Kurdê de nivîsek bi mexlasê Xezal hatiye nivîsandin. Li gori Xezalê ji ber ku rêvebirên KKAPê ketine li dû dewa meznatiyê û li hev nekirine ji hev belav bûnê. Dewr hatiye guherîn lêbelê civatên ku her du komele ava kirine mirov dikare bêje heman civat û şexsîyet in. Helbet kesên wek Ziya Gokalp, Arif-Feyzi Pirinçcioğlu û Süleyman Nazîf, di nav avakarên KBKê de nîn in lê malbatên mîrnişinan, hin rewşenbîr û şexsîyetên wek Seyit Evdilqadir berdewama KKAPê ne.

Du fîkrêن ku di vê serdemê de derdikevin pêş azadîxwazî û otonomîxwazî ne. Baskê ku Emîn Alî Bedîrxan û zarokên wî Celadet û Kamûran, Memdûh Selimbegê Wanî û Necmeddin Huseyin Kerkûkî pêşengî lê dikin baskê azadîxwaz; baskê ku serokê komeleyê Seyîd Evdilqadir pêşengî lê dike wekî baskê otonomîxwaz derdikeve pêş. Lê ev her du bask heyâ Konferansa Parîsê bi hev re komeleyê bi rê ve dibin. Şerîf Paşa ku bavê wî Said Paşayê Xandan e demeke dirêj wekî wezîrê xariciyê di burokrasiya Osmanî de cih girtibû û di Konferansa Parîsê ya Aştiyê de serokatiya şandeya kurdan kiriye. Şerîf Paşa li wir bi serokê şandeya ermenan Bagos Nubar Paşa re li ser nexşeyekê li hev dike. Lê belê dema di derbarê vê lihevkirinê de rexneyên tund li Şerîf Paşa tên kîrin, Şerîf Paşa dev ji berpirsiyariya şandeyê berdide. Rexneyên ku li Şerîf Paşa tên kîrin û hevpeyvîneke Seyîd Evdilqadir ku di vê hevpeyvîne de destnişan dike ku daxwaza

32 Nesim Şeker, 115-16.

33 Nihat Erîm, "ANKARA ÜNİVERSİTESİ HUKUK FAKÜLTESİ YAYINLARI", t.y., 523.

34 Bilal Altan, "Kurdistan Teâli Cemiyeti: Kuruluş, Amaç ve Faaliyetleri" (P.h.d, Mardin, Mardin Artuklu Üniversitesi, 2017), 56.

35 Bilal Altan, 80-92.Aytepe, Oğuz, "Yeni Belgelerin Işığında Kurdistan Teâli Cemiyeti", *Tarih ve Toplum Dergisi*, Cilt: 29, Sayı: 174, Haziran 1998, s. 9-16

kurdan otonomî ye û di rewşeye wiha nexweş de nabe ku kurd dev ji tirkan berdin, dibe sedem ku KBK ji hev belav bibe.³⁶ Baskê ku Emîn Elî Bedirxan pêşengiyê lê dike daxwaza serxwebûnxwazîyê dikin û ji KBKê vediqetin. Bi navê “Teşkîlat-ı İctimaiye Cemiyeti” saziyek nû ava dikin û weşana *Jînê* jî ji aliye vî baskî ve tê weşandin. Di serdema mutarekeyê de her çiqas hewldana sîyasetmedarêñ kurd ku li welat bi rêxistin bibin hebe û heya radeyekê jî di vê armanca xwe de bi ser ketibin jî³⁷ sazî û dezgehêñ kurdan ên esasi li Stenbolê ava bûne û kar û xebatêñ xwe li vir domandine.

II. Weşanêñ Vê Serdemê: *Jîn Û Kurdistan*

Kurd Tamîm-î Maarif û Neşriyat Cemiyetîyê (KKBPW) bi navê *Jînê* 7ê Sermaweza 1918an de kovarekê diweşîne ku hê hefteyek di ser mutarekeyê de derbas bûye. Piştre *Kurdistan Tealî Cemîyeti* tê avakirin. Kovara *Jînê* mirov dikare bêje ku weşana fermî ya Cemiyetê ye, ji ber ku pirî nivîskarêñ kovarê wek endamên xwezayî yên komeleyê hatine qebûlkirin.³⁸ Li gel *Jînê* mirov dikare behsa Kovara *Kurdistanê* jî bike. Kovara *Kurdistanê* di 30 Berfanbar 1919an de dest bi weşanê dike. Agahiyêñ destpêkirina vê weşanê mirov dikare ji kovara *Jînê* bişopîne. Di van agahiyan de Kovara *Jînê* Kovara *Kurdistanê* wek rêheval bi nav dike. Lewre mirov dikare bibêje ku her du kovar ji heman çavkaniyê dizên. Di warê weşanê de mirov dikare behsa *Serbestiya* Mevlanzade Rifat û İctihada Abdullah Cevdet jî bike. Xwediyê her du rojnameyan jî kurd in û di vê serdemê de di derbarê Kurd û *Kurdistanê* de gelek gotar û nûçeyan diweşînin.

Vegotina Kovara *Jînê* di pirî aliyan de ji rojname û kovarêñ pêşîya xwe vediqete. Wekî ku me berê jî gotibû êdî diyar e ku ew ê împaratoriya Osmanî ji holê rabê. Lê belê hê ne diyar e ku ew ê li dêlva wê ci were. Sê tevgerên neteweperwer ên kurd, ermen û tirk daxwaza heman axê dikin di vê serdemê de. Lewre dema mirov Kovara *Jînê* dixwîne dibîne ku li hember van her du tevgerên ku daxwaza axa wan dikin rewşenbîrêñ kurd bi tundî li hember wan radiwestin. Lê bi heman argumanan dijberiya tevgerên ermen û tirkan nayê kirin. Dema li hember daxwazêñ tevgera tirk derdikevin alloktioniya tirkan derdixin pêş û diyar dikin ku ji Nuh Pêxember ve kurd li ser

36 İkdâm, “Kürdler ve Osmanlılık, Âyândan Seyyid Abdülkadır Efendi’nin Beyânâtı”, [27 Şubat 1920]

37 Bilal Altan, “Kurdistan Tealî Cemiyeti: Kuruluş, Amaç ve Faaliyetleri”, 80-92.

38 Aytepe, Oğuz, “Yeni Belgelerin Işığında Kurdistan Tealî Cemiyeti”, *Tarih ve Toplum Dergisi*, Cilt: 29, Sayı: 174, Haziran 1998, s. 9-16

axa xwe otokton in. Lewre jî li gorî wan ti mafê tirkan nîn e ku daxwaza desthilatdariya li ser vê axê bikin. Lê wexta nivîskarêni *Jînê* li hember daxwazên tevgera ermenan derdi Kevin meseleya otoktoniyê nayê rojevê. Ji ber ku ermen jî wekî kurdan otoktonê vê axê ne, lewre jî ji dêlva otoktoniyê mijara nifûsê tînin rojevê û dibêjin ji ber ku nifûsa kurdan ji ya ermenan zêdetir e mafê kurdan e ku li ser vê axê desthilatdar bin.

Ji rojnameya *Kurdistanê* heyâ Kovara *Rojî Kurde* rewşenbîrêne kurd her tim di nav hewldanekî de ne ku esl û neslê kurd û ermenan bigihînin hev. An jî wek lehengê netewî Selahaddin Eyyubî derdixin pêş ku bi tirk an ereban re hevparyekê ava bikin. Di serdema mutarekeyê de êdî lehengê neteweyî Kawayê Hesinkir e angò ne lehengekî olî ye. Her wiha hewldana ku kurd û ermenan jî bigihînin hev di nav rûpelên kovaran de naxuye. Êdî dem dema “em û ên din” e. Pêdivî bi hevkariyê nîne, bi cudabûnê ye.

III. Komeleya Kurd A Belavkirina Perwerdehî û Weşanê (Kürt Tamim-i Maarif Ve Neşriyat Cemiyeti- KKB PW)

Him di serdema Meşrûtiyetê de him jî di serdema Mutarekeyê de wexta piçek hilma kurdan hatiye ber wan saziyên sîyasî û rewşenbîrî bi hev re ava kirine. Di serdema Mutarekeyê de her çiqas komeleya esasî KBK be jî komeleya herî zû vedibe û dikeve nav kar û xebatê ev komele ye. Her çiqas avakirina komeleyê di fermiyetî de 19 Rêbendana 1919ê³⁹ xuya bike jî hefteyek li dû îlankirina mutarekeyê dest bi weşana Kovara *Jînê* dike û hewl dide ku kar û barê rewşenbîrîye bi rêxistin bike. Di rêziknameya wê de ji armanca vekirina dibistanekî ji bo gihadina mamosteyên kurd bigire heya amadekirina ferhenga pir-zaraveyî û nivisandina pirtûkên rêzimanî heye. Her wiha ji bo zarokên bêkes dibistanek şeviyan û ji bo hemalan jî vekirina hin polan, di nava armancê saziyê de cih girtine.⁴⁰ *Mem û Zîn* a Ehmedê Xanî bi saya vê komeleyê di sala 1919an de, cara ewil tê çapkiran û ji bo diwana Hacî Qadirê Koyî jî bê çapkiran hewl didin lê mixabin ji heq dernakevin.⁴¹ Piştî KBK dibe du hîzb sazî qels dibe di nav demê de jî bi tevahî bêdeng dibe.

39 Bilal Altan, “Kurdistan Teâli Cemiyeti: Kuruluş, Amaç ve Faaliyetleri”, 345.

40 Mehmet Emin Bozarslan, *Jîn (1918-1919) - II*, c. II (Uppsala: Deng yayinları, 1985), 487-88, <https://bnk.institutkurde.org/catalogue/detail.php?pir-tuk=1245>.

41 *Serbestî*, No: 285, 04 Mayıs/Gulan 1919

IV. Komeleya Bilindbûna Jinêñ Kurd (Kürt Kadınları Teâlî Cemiyeti KBJK)

Li gorî agahiyê fermî 22 Gulan 1919an, li Kadikoyê komele ava bûye. Avakarêñ komeleyê jinêñ Bedirxanîyan in.⁴² Lêbelê di Kovara *Jînê* de mirov leqayê hin agahî û çalakiyêñ komeleyê tê û ji van agahiyân têdighîje ku komele tenê ji jinêñ Bedirxaniyan pêk nehatiye.⁴³ Mirov leqayê du çalakiyêñ komeleyê di Kovara *Jînê* de tê: Yek bi xwendina mewlûdê vekirina komeleyê ye, ya din jî sinneta zarokên bêkes e.⁴⁴

V. Komeleya Xwendekarêñ Kurd Hêvî

Wekî me li jorê nivisibû di sala 1912an de Komeleya Hêvîyê vedi-be û weşanêñ wekî *Rojî Kurd* û *Hetauwî Kurd* derdixe. Qedrî Cemîl-paşa di bîranînêñ xwe de behsa van weşanan dike û dibêje heqê çapa van kovaran Seyîd Abdulqadir ji hemalêñ kurd berhev dikir û dida me. Ev serdema ewil a Komeleya Hêvîyê ye. Piştî ku Şerê Cihanê yê Yekemîn dest pê dike hemû kar û xebatêñ komeleyan radiwestin û xwendekarêñ zaningehan jî tevlî artêşê dixin. Lewre çar salêñ ku şer didome çar salêñ bêdengiyê ne. Serdama duyemîn di dema mutarekeyê de pêk tê. Kurdzade Fevzî pêdiviya ji nû veavakirina Hêvîyê di 25 Berfanbara 1918an de di Kovara *Jînê* de destnîşan dike.⁴⁵ Yek ji endamê Hêvîyê yê serdema ewil Doktor F. Berxo nameyekê ji Kovara *Jînê* re disîne û destnîşan dike ku di wê serdemê de rexneyêñ ku ew miletêñ misilman ji hev vediqetînin, li wan dihat kirin û di şert û mercêñ dijwar de kar û xebat dimeşandin. Belavokêñ komeleyê yêñ di Kovara *Jînê* de derdi Kevin destnîşan dikin ku *Hêvî* wê kar û barêñ zanistî bide ber xwe û bi karêñ siyasetê re mijûl nebe. Hewldana wan a ku li her deverê welêt baskêñ Hêvîyê vekin û di mijara ilm û zanînê de ciwanêñ kurd bigihînin, heye. Mirov dikare bibêje ku heta sala 1922an jî vê komeleyê kar û xebatêñ xwe domandine, ji ber ku *Hînkerê Zimanê Kurdi*⁴⁶ weşana Hêvîyê ya serdema duyemîn e ku di vê salê de hatiye çapkirin.

42 Bilal Altan, “Kürdistan Teâlî Cemiyeti: Kuruluş, Amaç ve Faaliyetleri”, 345.

43 Mehmet Emin Bozarslan, *Jîn (1918-1919) - V*, c. V (Uppsala: Deng yayinları, 1988), 932-33, <https://bnk.institutkurde.org/catalogue/detail.php?pir-tuk=1274>.

44 Mehmet Emin Bozarslan, V:1061.

45 Mehmet Emin Bozarslan, *Jîn (1918-1919) - II*, II:341.

46 Serhat Bozkurt ve Sezen Bilir, ed., *Hînkerê zimanê kurdi Kürt talebe hevi cemiyeti: İlk pratik Kürtçe öğrenme kitabı*, Bgst yayınları ; Kültürel çoğulculuk dizisi, 24. 3 (İstanbul: Bgst yayınları, 2008).

VI. Komeleya Kurd A Rêxistinê Civakî (Teşkîlat-i Îçtimaiye Cemiyetî KKRC)

Wekî li jor hatîbû destnîşankirin piştî di KBKê de li ser mijara serxwebûnxwazî û otonomîxwazîye li hevkirinek çenabe, baskê serxwebûnxwaz bi pêşengiya Emîn Elî Bedirxan ji KBKê vediqetin û KKRCê ava dikan. Emîn Elî Bedirxan û zarokên wî Celadet û Kamûran, Necmeddin Huseyin û Memdûh Selîm Begê Wanî pêşengên baskê serxwebûnxwaz in. Van navan di heman demê de wek pêşengên Partiya Kurd a Gel (Kürt Millet Fîrkası PKG 1919)⁴⁷ jî derdikevin pêş. Kovara *Jînê* ku wekî weşana fermî ya KBKê bû piştî vejetînê, ji aliyê baskê sexwebûnxwaz ve wekî rojname weşana xwe domandiye.

D. Encam

Fikr û ramanê li ser jiyana rewşenbîrî ya împaratoriye ji sedsala 19an heta destpêka sedsala 20an osmanîtî, îslamîtî û neteweperwerîne. Fikra osmanîtiyê li hember tevgerên neteweperwer ên balkanan wekî alavekî yekgirtinê tê sazkirin û heta împaratorî ji holê radibe jî di wateyên cuda de tê bikaranîn.⁴⁸ Îslamîtî, di serdema Abdulhemîdê II. de dema neteweyê xeyrîmuslîm ên li Balkanan serxwebûnên xwe bi dest dixin, dikeve dewsa osmanîtiyê. Neteweperwerî jî bi taybetî piştî Şerîn Balkanan cihê îslamîtiyê digire. Rewşenbîr û siyasetmedarên kurd ên vê serdemê jî kêm zêde di bin tesîra van fikr û ramanan de dimînin.

Tevahiya sedsala 19an û destpêka sedsala 20an dîroka têkoşîna kurdan, dîroka xwebûnê ye. Heta nîveka sedsala 19an mîrnişînên kurd têkoşîna xwe li hember Împaratoriya Osmanî domandine. Lê piştî mîrnişînên kurd dişkên û ji welat ber bi Stenbolê ve têr koçkîrin êdî navenda têkoşîna modern a kurdan dibe Stenbol.

Piştî îlankirina Meşrûtiyeta II. li Stenbolê sazî û dezgehêñ fermî yên kurdan ava dibin. Sazî û dezgehêñ kurdan ên vê serdemê li ser du rehan ava dibin. Rehê siyasi û rehê rewşenbîrî. Rehê rewşenbîrî vekirina dibistanan û belavkirina weşanên kurdî dide ber xwe, rehê siyasi hewl dide ku pirsgirêkên siyasi, bi taybetî pirsgirêkên di nav kurdan û ermenan de çareser bike.

Alavên modern ên wekî rojname û kovar her çiqas derfeteke baş bide rewşenbîr û siyasetmedaran da ku fikr û ramanê xwe bigihî-

47 Bilal Altan, “Kurdistan Teâli Cemiyeti: Kuruluş, Amaç ve Faaliyetleri”, 97.

48 Şükrü Hanioğlu, “Osmanlıcılık”, Tanzimattan Cumhuriyet'e Türkiye Ansiklopedisi, 5. Cilt, (İletişim Yay.), Ayhan Matbaacılık, İst., 1985, s. 1393

nin raya giştî jî, divê neyê jibîrkirin ku di bin çavdêriya dewleta modern de ev kar têñ kirin. Mijara sansûr û lêpirsînê her tim li pêş wan e. Wekî mînak Salîh Bedirxan ku yek ji nivîskarê *Rojî Kurdê* ê jêhatî ye, di nîvîseke xwe de ji dîbacea *Mem û Zînê* çend beytan bi kar tîne. Ev yek dibe sedem ku bê binçavkirin û sirgûnê Kayseriyê bibe. Helbet Salih Bedirxan dizane beytên dîbacea *Mem û Zînê* çi dibêje, her wiha ji sirgûnê jî dîyar e ku berpirsîn dewleta Osmanî jî dizanin ku Salih Bedirxan dixwaze çi bêje.⁴⁹ Lewre li gorî min nêrîna ku kurd di dewra Meşrûtiyetê de fikra Osmanîtiyê diparêzin ne di cih de ye.⁵⁰

Hebûna sazî û weşanên cûrbecûr li gorî rewşenbîrên destpêka sedsala 20an nîşaneyâ pêşketina wê civakê dida destnişankirin. Lewre jî dema mutarekeya Mondrosê tê ìmzikirin tevgera kurd dikeve nav kar û xebatêñ avakirina sazîyan û weşandina rojname û kovaran. Komeleyên cûrbecûr û weşanên cuda di vê serdemê de têñ avakirin. Êdî dîyar e ku wê ìmparatorî hilweşê lê ne dîyar e ku wê kî valahîya desthilatdariyê dagire. Vegotina rewşenbîrên kurd ên vê serdemê ji pirî alîyan ve ji ya beriya xwe vediqete. Êdî bi tirkan re an jî bi ermenan re hewldana avakirina hevparîyekê cihê xwe dide cûdabûnê. Vegotina siyasetmedar û rewşenbîrên kurd bi zelalî daxwaza sexwebûnxwazîye ye. Çardeh Prensîbêñ Wilson fersenda vê yeke dide kurdan. Konferansa Parîsê, li dû wê jî Peymana Sewrê avabûna Kurdistaneke serbixwe tîne rojeva qada navneteweyî. Lîbelê di nav Komeleya Bilindbûna Kurdistanê de ku komeleya esasî ya vê serdemê ye, dubendî derdikeve. Baskê komeleyê yê Seyîd Abdulkadir pêşengiyê lê dike otonomîxwaz e û baskê ku Emîn Alî Bedirxan jî pêşengiya wî dike serxwebûnxwaz e. Dema baskê serxwebûnxwaz ji KBKê vediqete KBK qels dibe, komeleya ku nû ava dikin jî, KKRC jî kêm dimîne. Her çiqas hewldana her du aliyan bidome jî ti carî wekî destpêka serdemâ mutarekeyê bi coş û xurt nabe.

Siyasetmedar û rewşenbîrên kurdan ên vê serdemê piştî ku bi ser nakevin rîyêñ cuda didin ber xwe. Kesêñ wekî Abdulaziz Yamulkî, Mustafa Paşa Yamulkî û Pîremêrd vedigerên Başûrê Kurdistanê û vê mirata li Stenbolê ava bûye digihînin nivşen nû. Emîn Elî Bedirxan û zarokêñ xwe diçin Qahireyê, xerîbiyê. Seyîd Evdilqadir,

49 Tercüman-1 Hakîkat, No,11687,9 Teşrin-ievvel 1329

50 Hakan Özoglu, *Osmanlı Devleti ve Kürt milliyetçiliği* (İstanbul: Kitap Yayınevi, 2005), 102; Djene Rhys Bajalan ve Burcu Yalçınkaya, *Jön Kürtler: Birinci dünya savaşımdan önce Kürt hareketi(1898-1914)*, Avesta/Kürt araştırmaları 330/13 (İstanbul: Avesta, 2009), 85.

Kemal Fevzî, Xalit Begê Cibrî û Fuad Temo piştî serhildana Şêx Seîd têr dalîqandin. Şairê netewî ye vê demê Evdirehîm Rehmî Hekarî û Şefiq Arvasî tevlî mixalefeta îslamî dîbin. Kesên wekî Xelîl Xeyalî jî bi tevahî dikevîn nava bêdengiyekê.

Çavkanî:

Akgündüz, Ahmet. *Osmanlı Kanunnameleri ve Hukuki Tablilleri*. FEY Vakfı yayınları ; İlmi araştırmalar serisi, no. 1. no. 1. İstanbul: FEY Vakfı, 1990.

Alakom, Rohat. *Eski İstanbul Kürtleri, 1453-1925*. 2. baskı. Şehir 1. Beyoğlu, İstanbul: Avesta, 2012.

Bajalan, Djene Rhys, ve Burcu Yalçınkaya. *Jön Kürtler: Birinci dünya savaşından önce Kürt hareketi(1898-1914)*. Avesta/Kürt araştırmaları 330/13. İstanbul: Avesta, 2009.

Bilal Altan. "Kurdistan Teâli Cemiyeti: Kuruluş, Amaç ve Faaliyetleri". P.h.d, Mardin Artuklu Üniversitesi, 2017.

Bozarslan, M. Emîn, çev. *Kürd Teaviün ve Terakki Gazetesi : kovara kurdî-tirkî/kurdî*. Uppsala: Deng, 1998.

Bozkurt, Serhat, ve Sezen Bilir, ed. *Hinkere zimane kurdi Kürt talebe hevi cemîyeti: İlk pratik Kürtçe öğrenme kitabı*. Bgst yayınları ; Kültürel çoğulculuk dizisi, 24. 3. İstanbul: Bgst yayınları, 2008.

Bülent Bilmez. "Modern ve geleneksel Kolektif Kimlikler ve Osmanlı Vatandaşlığı Arasında; Osmanlı Aydını Üzerine Notlar". *Toplumsal Tarih*, 2009.

Celil, Celile. *1880 Şeyh Ubeydullah Nehri Kürt Ayaklanması*. İstanbul, 2014.

Celilê Celil. *Kürt Aydinlanması*. I. Baskı. İstanbul: Avesta, 2001. <https://www.kitapyurdu.com/kitap/kurt-aydinlanmasi/32267.html>.

Dehri. *Divânge-i Dehri*. 2. Baskı. İstanbul: Kürdizade Ahmed Ramiz, 1330.

Duman Güleren, "The formations of the Kurdish Movement(s) 1908-1914: Exploring the footprints of Kurdish nationalism", Boğaziçi Üniversitesi 2010. Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi

Enver Paşa, Halil Erdoğan Cengiz. *Enver Paşa'nın anıları (1881-1908)*. Genel yayın 1016. İstanbul: Türkiye İş Bankası Kültür yayınları, 2006.

Erîm, Niâzî Hat. "ANKARA ÜNİVERSİTESİ HUKUK FAKÜLTESİ YAYINLARI", t.y., 169.

Evliya Çelebi, ve Orhan Şaik Gökyay. *Evliya Çelebi Seyahatnamesi*. C. 1. İstanbul: Yapı Kredi Yayınları, 1996.

Evliya Çelebi, Seyit Ali Kahraman, Yücel Dağlı, ve M. Sabri Koz. *Evliya Çelebi Seyahatnamesi*. Yapı Kredi Yayınları 1228, 1536. İstanbul: Yapı Kredi Yayınları,

2006.

Hanoğlu, M. Şükrü. *A Brief History of the Late Ottoman Empire*. Princeton: Princeton University Press, 2008.

Herrin, Judith. *Bizans: Bir Ortaçağ İmparatorluğunun Şaşırtıcı Yaşamı =: Byzantium: the surprising life of a medieval empire*. 1st ed. İletişim Yayınları ; Tarih Dizisi, 1463. 59. İstanbul: İletişim, 2010.

Hieser, Hans Lukas. *İskalanmış Barış: Doğu Vilayetleri'nde Misyonerlik, Etnik Kimlik ve Devlet 1839 - 1938*, 2005.

Kadri Cemil Paşa. *Doza Kurdistan =: (Kürdistan davası): Kürt milletinin 60 yıllık esaretten kurtuluş savaşı hatıraları*. 2. basım. Ankara: Öz-Ge Yayınları, 1991.

Kaplan, Mahmut, ve Nabi. *Hayriyye-i Nâbî: inceleme-metin*. Üçüncü baskı. Atatürk Kültür Merkezi Yayıncılık: 447. Araştırma - İnceleme Dizisi: 109. Ankara: Atatürk Kültür Merkezi, 2015.

Kılıç, Orhan. "YURLUK-OCAKLIK VE HÜKÜMET SANCAKLAR ÜZERİNE BAZI TESPİTLER". OTAM(Ankara, 1999, 119-37. https://doi.org/10.1501/OTAM_0000000425.

Koç, Yener. Graduate Program in History. *Bedirxan Pashazades: power relations and nationalism (1876-1914)*, 2012. Boğaziçi Üniversitesi, Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi

Lütfi (Ahmed Ramiz). *Emir Bedirhan, 20.yy'ın Başlarında Kürt Milliyetçi Söylemine Bir Örnek*. Osmanlı Kaynaklarında Kürtler Çalışma Grubu. İstanbul: BGST yayınları, 2007.

Malmisanij. *İlk legal Kürt öğrenci derneği, Kürt Talebe-Hêvî Cemiyeti, 1912-1922*. 1. baskı. Araştırma: 121 / 14. Beyoğlu, İstanbul: Avesta Basın Yayın, 2002.

Mehmet Emin Bozarslan. *Jîn (1918-1919) - I. C. I. 5 c.* Uppsala: Deng yayınları, 1985. <https://bnk.institutkurde.org/catalogue/detail.php?pirtuk=1244&l=en>.

———. *Jîn (1918-1919) - II. C. II. 5 c.* Uppsala: Deng yayınları, 1985. <https://bnk.institutkurde.org/catalogue/detail.php?pirtuk=1245>.

———. *Jîn (1918-1919) - V. C. V. 5 c.* Uppsala: Deng yayınları, 1988. <https://bnk.institutkurde.org/catalogue/detail.php?pirtuk=1274>.

Nesim Şeker. "Ethnic Conflicts in Anatolia and the Establishment of the Turkish Republic". Ph.d, Ortadoğu Teknik Üniversitesi, 2002.

Özoğlu, Hakan. *Osmanlı Devleti ve Kürt milliyetciliği*. İstanbul: Kitap Yayınevi, 2005.

Rojî Kurd. Koma Xebatên Kurdolojiyê, Kürdoloji Çalışmaları Grubu. İstanbul: Weşanê Enstituya Kurdi ya Stenbolê, İstanbul Kürt Enstitüsü, 2013.

Tunaya, Tarık Zafer. *Türkiye'de siyasal partiler*. Genişletilmiş 2. baskı. C. V. 1 İlkinci Meşrutiyet Dönemi. İstanbul: Hürriyet Vakfı Yayınları, 1984.

PERWERDE Ü ÎNŞAKIRINA NASNAMEYA NETEWEYÎ: FRANSA Ü TIRKÎYE¹

Nurettin BELTEKİN²

Destpêk

Di dîroka însaniyetê de sazgehêن cuda cuda yên perwerdehîyê derketine holê. Her civatê li goreyî fam, asta zanîn û ihtiyyacîya xwe sazgehêن xwe yên perwerdehîyê ava kirîne. Di serî de sazgehêن perwerdehîyê zêdetir di destê sazgehêن dînî yan jî di bin banê patronaja sultanan de bûne. Dîsa ev sazgehêن perwerdehîyê pir kêm bûn û tenê ji bo kur û keçen çîna bilind/hilbijartî ya civatê bûn. Wan deman xwendin bi xwe bi qîmet bû. Armanca vê perwerdehîyê hînbûna sira alemê, dîyarkirina sedemên bûyeran, elimîna mirada Xwedê û wergirtina exlaqê xweş bû. Helbet perwedehiya sen'atan jî hebû, lê ew cureyê perwerdehîyê li ber destê hostayan, bi rêberîya wan û ceribandinê dihat wergirtin. Wan deman di dewletekê de her civatekê dikarî sazgehêن xwe veke û zarokêن xwe perwerde bike. Bi taybetî her gruba bawermend, xwedîyê xwendingeha xwe bû. Bi gotineka din di perwerdehîyê de “yekdestî” tune bû.

Lê rewşa perwerdehîyê ya ku li jorê hatîye gotin piştî serdema modern guherîye. Guhertinêن sîyasî û aborî ku sedsala 17an de li Ewropayê dest pê kirîne bûne sedemê guhertinên mezin. Sazgehêن ku piştî van guhertinan hatîne holê di serî de warêن sîyasî, aborî, civatî û perwerdehîyê, seranser hemû jiyan ji nû ve ava kir. Di nav van saziyan de netewe-dewlet ya yekem e. Bi rastî jî netewe-dewletan, ku li gorî imparatoriyan avahiyêن pir fermî ne, serwerî û têki-liyêن xwe li gorî armancêن xwe formule kirin. Şerif Mardin³ tequez

1 Hinek zanînêن vê gotarê ji xebata min a Okul ve Öteki Yurttaşlar tê girtin. Di vê gotara min a kurmancî ya yekem de Dr. Şehmus Kurt ji alîyê serrastkirinê alîkarfya min kirîye, sipasiya wî dikim.

2 Dr. Zanîngeha Mardîn Artukluyê.

3 Şerif Mardin, Türk Modernleşmesi (İstanbul: İletişim, 2008), 355

dike ku tiştê ku gelek serdestan nekarîn bikin, bûrokrasiya dewleta neteweyî ya nûjen bi artêş, pergala xwe ya perwerdehiyê, dadgeh, polîs û rêxistinê ragihandinê pêk anî.

Netewe-dewletê nûjen civakên piçûk xistine bin siya xwe, an jî ew ji holê rakirine. Hebûna taybetmendiyên herêmî yên civakan û komên xwedî taybetmendiyên çandî yên cihêreng ji hêla dewletê ve nehatine pejirandin.⁴ Berevajî pergala neteweya împaratoriyan, ku dihêle civakên etnîkî û olî ji hev cihê werin rêxistin, pergala netewe-dewletan sêwirana civakeke homojen e. Mirovên ku berê di bin zagona civaka xwe de bûn, bi derketina netewe-dewletê dest bi qanûneke raserî takekes kirin. Vê pêvajoyê rê li ber takekesî/ê vekir da ku bi dewletê re têkiliyekê bi xwe saz bike, ji ber ku ew bû sedem ku her kes ji rastiya xwe ya civakî (aîdiyet) serbixwe tevbigere.

Saziyên wekî artêş, dadgeh, polîs, dibistan û nexweşxane ku “hebbûna” netewe-dewletê temsîl dikin, bûn muxatabên nû yên takekesan. Ev têkiliya di navbera dewlet û takekes de bû sedem ku takekes ji civaka xwe serbixwe bibe û bibe kesayet. Ji aliyekê ve, takekesan bi “hêz û amûra xwe ya îdeolojîk” re têkilî danîn⁵ û ji aliyekê din ve jî, di çarçova qanûneke ku li ser bingeha dewlet, maf û peywiran de hatî diyarkirin, têkilî danîn. Nerazîbûna ji hêza partîyan bandor li ser encama têkiliya di navbera wan de kir. Vê têkiliya asîmetrîk gav bi gav takekes ji taybetmendiyên wî yên civakî vejetand û ew kir kesek lihevhatî yê civaka nû. Bi gotineke din, ew kire “hemweliyatîyekî” netewe-dewletê. Di heman demê de, wî dest bi danûstendin û têkoşînekê kir ku li ser bingeha maf û peywiran, di navbera kes û dewletê de her dem ji nû ve were avakirin.

Di netewe-dewletan de, civaka nû wekî civakek homojen a wewlatiyan hate famkirin. Homojenkirina civakî wekî pêdiviyek “bajarî” hate qebûlkirin; Ji ber ku “bajarî” ji lihevhatinekê bêtir, ji holê-rakirina cudahiyan, bi têkbirina adet û kevneşopiyên herêmî dihat famkirin.

Rola pergala perwerdehiya neteweyî di damezrandina mekanîzmaya “demjimêrî” ya netewe-dewletê de pir zêde ye ku mirov jê kêm neke. Ji ber ku pergala perwerdehiyê wekî hêmanek girîng a projeya navendîparêziya netewe-dewletê hate pênasekirin û avakirin. Wezîrê Perwerdehî yê Fransî wîha digot; “Vêga ez dizanim li Fransayê li hemî dibistanê seretayî yên pola çaremin ci diqewi-

4 Mardin, 355

5 Louis Althuserr, İdeoloji ve devletin ideolojik aygitları, (İstanbul: İthaki, 2003).

me.”⁶ Ew gotina wezîrî ûfadeya wê hêzê ye ku “şaristanî” pêşkêşî netewe-dewletê dikir. Netewe-dewletên nûjen dibistanê dêrê veguhandin saziyên ku fonksiyonêni siyasî, aborî û civakî ferz dikirin. Dibistan wekî dezgehekê ji nû ve hate sêwirandin ji bo ku hemweliyên guh didin dewletê, hêza kedê bibin sûkê û li şûna rahijmendêni bawermendêni dêrê kesêni ku bi civakê re lihevhatî ne mezin bike. Ji bo vê armancê, hewl hat dayîn ku dibistan ji bandora dibistanêni Cîzvîtan bêne paqikirin û hemî nîşanêni ku dêr û dîn bînin bîra mirovî bêñ jêbirin.⁷

Netewe-dewletê perwerdehiya ku ji nû ve avakiriye wekî navgînek ji bo gihîştina armancêni xwe destnîşan kir. Ew pergala perwerdehiyê bi kar tîne da ku rêziknameya civakî ya dewletê ji nû ve saz bike, di çarçoveya armancû bingehêni bîrdozî yên ku ew destnîşan dike. Ev nêzikatiya amrazî ya perwerdehiyê di pênaseya perwerdehiyê de ji xuya dike. Bo mînak, perwerdehî wekî bidestxistin û pêşvexistina hejmareke jêhatîbûna laşî, fîkrî û exlaqî ye ku ji hêla civaka siyasî ve ji wan kesan tê xwestin ku hêj ji jiyana civakî re ne amade ne.⁸

Forma netewe-dewletê ya di komarê de û bi taybetî jî di mînaka komarîparêziya Fransî de hatî şenberkiran, li ser bingeha civakîbûna kesan disekine ku wan di çarçoveya qanûna nû ya hemwelatîbûnê de bîne ser bingeha fonksiyonêni civakî. Hemî saziyên netewe-dewletê ji ji bo vê armancê hatine sêwirandin. Dibistana komarî ya Fransî mînaka herî baş a vê sêwiranê ye. Ji ber ku dibistana komarî ya Fransî kesan ji hemî têkiliyên etnîkî, olî, civakî, çandî û wekhev paqij dike. Dibistana komarî, sedema yekta ya hebûna perwerdehiyê (û dibistanê) wekî pêdiviya sêwirana civaka nû dibîne ji bo stendina zanîn, jêhatîbûn û berpirsiyariyên pêkanîna karûbarêni civakî. Dibistana komarî, ku wekî dibistana klasîk jî tê pênasekirin, li ser bingeha armancêni safî yên derveyî - hemwelatîbûn û kedê encamê digire.⁹

Damezrînerên Komara Tîriyeyê, ku dibistan di damezrandina nû ya civakî de wekî “navgîniya herî bi bandor” didîtin,¹⁰ perwerdehî di sazkirina civaka nû ya Komarê de wekî amûrek girîng ava

6 Mardin, 355.

7 Kürsat Bumin, Batı'da devlet ve çocuk, (İstanbul: Çizgi kitabevi)

8 Durkheim, 1956: 71 vgz. Hüseyin Şirin, Eğitimin Siyasal İşlevleri ve Türkiye'deki Sivil Toplum Örgütlerinin Bu İşlevlere İlişkin Görüşlerinin Analizi, (Yayınlanmamış Doktora Tezi. Gazi Üniversitesi. Ankara, 2008), 2

9 Alain Touraine, Eşitlik ve farklılıklarımızla birlikte yaşayabilecek miyiz? (İstanbul: Yapı Kredi Yayınları. 2002), 355-357

10 Saygı Öztürk, İsmet Paşa'nın Kürt Raporu, (İstanbul: Doğan Kitap, 2007).

kirin. Çawa ku di xîtabata Ataturk da ya bo mamesteyan tê dîtin, fikir û bendewariya ku “nifşa nû dê bibe berhemê mamesteyan” di damezrînerên Komarê de pir eşkere ye. Bi taybetî di salêن pêşîn ên Komarê de, tê dîtin ku bertekêن li dijî reforman ev pêdivî û bendewarî zêde kiriye. Encamêن ku di vî warî de bi dibistanê re hatin wergirtin damezrînerên Komarê dilşad kirine. Di serdana “Elazig Kiz Olgunlaşma Enstitusu” (Enstituya Kamilbûna Keçan ya Elazixê) de, xwendekareke jin a ji Dêrsimê bi Tirkî diaxive û destê İsmet Înonu maç kiriye, Înonu ji nişka ve bi heyecan rabûye ser xwe û gotiye, “Aha ev e!”.¹¹ Ev gotina Inonu dikare wekî mînakek bête dayîn ku hêviyêne damezrînerên Komarê yên di derbarê perwerdehiyê de nîşan dide. Dîsa, Ataturk di vekirina Fakulteya Hiqûqê ya Zanîngeha Enqereyê de gotiye “Fakulteya Hiqûqê dê mueyîdeyê Komarê be.” di vî warî de pir watedar e.

Ji ber ku perwerdehî amûrekî bibandor e, ew fam di nav siyasetmedaran de gelek bi qiymet e. Helbet xwendingeh derfeta kontrol û çawderîyê dide sîyasetmedaran. Ew jî roleke gîran dide perwerdahîyê. Bi gotina Bourdieu¹² ji bo aqlê modern ê Frensayê xwendingeh mîna makîneyeke cehenemê tê fahmkirin ku dikare her tiştî biguhere û bike forma ku têن xwestin.

Bi rîya perwerdehîyê înşakirina neteweyê ihtiyac û îcadeke netewe-dewletê ye. Gelo wê ci imkan daye ku bi sazgehekê bi hezaran cureyêne mirovan diqelibin qalibekî/neteweyekê? Ew mejî/fikir çawa çê bûye? Kîjan bawerî yan zanistê destûr daye? İnsan çawa dibe “input” ku netewe-dewlet dikare hemû welatîyênen xwe bike neteweyek? Ev xebat li ser bersivê van pirsan disekine. Di mînaka Fransayê de, wek mînakeke serkeftî, bi perwerdehîyê fransîkirina gundîyan dibe mijara niqaşê. Di mînaka Tirkîyeyê de jî mînakeke sernekeftî tê nîqaşkirin. Gelo di sîstema perwerdehîya tirkî de kurd çawa kurd man? Wan bi ci awayî xwe parastin û bi kîjan stratejiyan? Gelo nasnameya kurdan li bin bandora perwerdehîya tirkan de çawa ji nû şekil girt?

Çarçoveya Teorîk a Xebatê

Di lîteratûra modern de derbarê taybetmendîyênen kontrol û çavdêriyâ saziyêne modern gelek nivîs hene. Bi taybetî Foucault, Weber û yên din bi têgehêne xwe yên panaptîcon, “qefesa hêsin” behsa van

11 Siddika Avar, Dağ Çiçeklerim. (Ankara: Öğretmen Yayınları, 1986), 124

12 Ali Kaya, Pierre Bourdieu'nun Pratik Kuramının Kılıdı: Alan Kavramı. Ocak ve Zanaat, (İstanbul: İletişim Yayınları, 2007)

taybetmendîyan dikan. Bi rastî sazîyên modern xwedî taybetmendîyen kontrol û çawderî ne. Li gor nêrînên kesên mina Foucault, Weber û gelek zanyaran îmkana derketine derveyî sazgehêن modern tune ye. Mîrov têne dikarin di nav sîstemê de şerî bikin, lê fîrar ne mimkûn e. Gelo bi rastî jî îmkânên derketinê ji kontrol û çavdêriya saziyêن modern tune ye? Di vê xebate de bi têgehêن kirde (subject) û qadê (field)¹³ îmkana fîrarê hatîye lêkolînkirin. Li gor Bourdieu qad (field) mîna lîstikekê ye û her kirde (subject) qasê sermayeya xwe ji vê lîstikê qezanca xwe digire yan di lîstikê de serkeftî dibe. Kirdê bi stratejiyêن xwe ji bo bidestxistina armancêن xwe yên taybet dixebite. Wek li jor hatîye gotin, eger dorpêça têkûz/tam hebe li gor armancêن xwe xebat nabe, lê eger dorpêç kêm be li gor armancêن xwe xebat mimkûn dibe.

Kirde li bin dorpêça kêm de li gor sermayeyêن xwe yên wekî sermayeya aborî, sermayeya civakî: têkiliyêن civakî, pêbawerî, sermayeya çandî: diploma an jî sertîfika, zanîn û sermayeya sembolîk: rûmet û prestij, qezanca xwe zêde dikan yan jî xwe diparêzin. Kirde bi stratejiyêن xwe yên mîna stratejiyêن bajarî, aborî, û siyasî, jinûve hilberîna feodalan û stratejiyêن çandî li binê dorpêça kêm dilîzin.

Amûrêن Înşaya Neteweya Fransî/Tirkî

Fransa ku iro xwedîya pergaleke siyasî, cîwakî, aborî û çandî ye, di nevbera salêن 1790 û 1890 de înşa bûye. Ev sedsal gelek taybet e. Jiyana Fransayê bi bandora gelek sedeman seranser hatîye guhartin û Fransayeke nû û fransîyeke nû hatîye meydanê. Di wê pêvajoyê de çêkirina réyan, avakirina bazarêن nû, besdarbûna gundîyan bo siyasetê, koça ber bi bajaran, girtina mîran bo leşkeriyê û avakirina xwendingehan, di Fransaya nû de bi hev re rolekî giran lîstîne.¹⁴ Eynî amûr li Tirkîyeyê jî ji bo înşaya neteweya Tirk hatîye şixulandin.

Di çêkirina nasnameya fransîya nû de *rê* amûrek gelek muhîm bû ji bo komara Fransayê. Di wan deman de nifûsa fransîyan zêdetir li derveyê bajarî, li gund û nav çiyayan bû. Têgihiştina mirovan gelekî kêm bû. Dîsa gîhiştina dewletê bo wan deran jî pir kêm bû. Helbet ew ji bo komara nû ya Fransayê problemeke mezin bû. Lewra komara Fransayê cara yekem kêşeya *rê* û têgihiştinê çareser kir. Erdînîgarîya Fransaya dijwar bi réya erdî û réyên asinan seranser bi hev

13 Kaya, 2007

14 Eguene Weber, Köylülerden Fransızlara-Fransa kırsalının modernleşmesi, 1870-1914, (Ankara: Heretik).

ve hat girêdan. Bi vê rîyê mirovên ku nedikarîn ji gundêñ xwe der-bikevin, gihiştin her cihî, berê xwe dan bazaran û dewletê jî bi asanî xwe gihad her axa welatî. Bi vî şeklî dewleta Fransayê her gava axa welatî girt binê hukmê xwe. Tirkîyeyê jî gelek giranî daye rê û têgiştinê. Lê li gor Fransayê gelêk kêm û dereng ew kêse çareser kirîye. Pêşin bi rîyên hesinî dest pê kirîye, paşê bi destê Bankaya Dinyayê (World Bank) di dema Şerê Cehanê yê Duyem de dest pê kirîye. Îro jî cihêñ ku hê rê negihiştinê hene. Ew jî nişan dide ku Tirkîye gelek dereng û kêm li ser kurdan hukmê xwe tehkîm kirîye.

Di înşaya nasnameya nû ya fransî de yek ji amûrêñ bibandor jî bazarêñ nû ne. Berê gundîyan berêñ xwe tenê ji bo malbatêñ xwe çêdikirin. Berêñ ku zêde diman bi gundîyan trampa dikirin. Bi gotineka din li Fransayê, bi taybetî li gundan aborîyeke “otarşî” hebû. Xebata aborîyê jî bi qasê ihtiyaca malê bû. Li gundan pere gelek kêm bû. Jixwe ji bo aborîya otarşîk jî pere ne lazim e. Guhartina beran bi trampayê ye. Pişti çekirina rîyan tekîlîya gundîyan bi cihêñ din û bajaran zêde bû. Ëdî gundîyan bazar keşf kir û bazar jî bi berêñ gundîyan roj bi roj dewlemend bû. Di vê pêvajoyê de gundî mecbûr man bo tekîlîya bi dewletê, bac dan û zimanê bazarê hîn bûn. Gundî marûzê bandora dewlet û bazarê bûn ku bi vî şîklî ziman û çanda Fransî ya nû gihişt gundan. Wekî Fransayê li Tirkîyeyê jî hem bazarêñ nû derketine holê, hem jî bazar guherîye. Kurd bi beşdarbûna bazarêñ nû hînî tirkî bûne, dewlet nas kirîne, lê li hela din kurdan tekîlîya xwe û bazarêñ berê jî berdewam kirîye. Salêñ damezrandina Komara Tirkîyeyê û heta salêñ nêzîk bi “sektora qaçaxtî” wek çalakîyeke aborî ew tekîlî dewam kirîye. Bi vê tekîlîyê ve *derîyê derive* vekirî ma. Ji vî derî jî gelêk *mesajên qecax* jî derketin holê.

Di wê pevajoyê de tiştekî balkeş jî tevlîbûna gundîyan bo siyasetê bû. Wek li jorê hatîye gotin tekîlîya gundîyan a bi dewlet û bazarê hinek mesûlîyet jî li ser milêñ gundîyan bar kir. Bac û xeracêñ dewlet û bazarê gundî pir acîz kirin. Ew tişt ji bo gundîyan tiştekî nû bû û hayê wan ji wan tiştan tûne bû. Helbet diyarkirina mesûlîyetan bi destêñ siyasetmedaran bû. Gundî jî ji bo guhartina van baran û kêmkirina bacan tevlî siyasetê bûn. Helbet siyaset bi naskirin û iteatkirina dewletê mumkûn e û siyasetmedar divê xwedîyê hinek amûrêñ wekî fransîya Parîsê û çanda wan be. Helbet siyasetmedarêñ gundîyan çend bibin fransî, bi gotineke din xwe jî gundîtîyê çend xelas bikin ew qas di siyasetê de dibin xwedîyê prestijê. Di dawîyê de bi rîya siyasetê gundî entegreyî Fransa nû dibin. Li Tirkîyeyê kurd rasterast tevlî siyasetê nebûn. Bi temsilkarêñ xwe yêñ mîna şêx, axa, mîr û eşrafen xwe ketin nav siyasetê ku zêdeyî wan di ser-

hildanêñ kurdan de rol girtibûn û hatibûn sirgûnkirin. Her çend vê cûrê temsîlê rasterast tevlîbûna kurdan bi siyasetê dereng hêlabe jî, bandora dewletê ya ku bi ser siyasetê re digihîje mîrovan kêm kir û kurdan xwe ji hînbûna tirkî û qebûlkirina siyasetên dewletê parast.

Bajarêñ Fransaya nû di pêvajoya însakirina nasnameya fransî ya nû de xwedîyê roleke giran bûn û ew jî di vê pevajoyê de gelek pêşve çûn. Îmkanêñ aborî, civakî, çandî yên din roj bi roj bala gundîyan kişand. Ew jî bû sedemekî koça ber bi bajaran ve. Berê zahfê nifûsa Fransayê li gundan û derveyê bajaran bû. Lê bi koça ber bi bajaran ve êdî nifûsa bajaran her roj zêdetir bû. Gundî ketin nava pergala bajaran ku bi destê komara Fransayê hatibûn avakirin. Bi vî şiklî gundî ketin pêvajoyeke bajarîbûnê. Bajarîbûn jî bi xwe amûreke komara Fransayê bû û gundîyan bi qasê bajarîbûna xwe ji gundîtiyê xwe dûr xistin. Ew dûrxîstin, terkkirina ziman, lehçe û devokan bû. Ziman êdî fransîya bilind a Parîsê bû. Li hêla din terkkirina gundîti, terkkirina çanda xwe bû. Bajarîbûn li Tirkîye li gor Fransayê gelêk dereng bû. Nifûsa Tirkîye heta salêñ nezîk jî zêdetir li gundan bû. Wê ferqê jî tesîra nasnameya tirkî ku bi rêya bajaran digihe milet, gelek kêm kir. Li hêla din jî li bajarêñ kurdan zimanê yekem kurdî bû.

Sedsala li jorê hatîye gotin ji bo Fransayê sedsala şerî bû. Di vê sedsalê de Fransa ket nava çend şeran. Helbet ew ji bo Komara Fransayê, ji bo însakirina nasnameya nû, bû derfeteke mezin. Bi leşkerîya mecburî ji her hêla Fransayê leşker hatîne wergirtin û di artêşa Fransayê de perwerde bûn. Di wê dema şeran de Fransa ku ji qewmên cuda cuda hatîye meydanê, li dora *welatê xwe Fransayê* kom bû û piştgirîyeke navxweyî pêk hat. Zêdeyê leşkerên artêşa Fransayê di serî de fermanêñ serbazanê xwe gelek kêm fehm dikirin, lê paşî artêşa Fransayê ji bo fransîya Parîsê bû xwendingehék. Her leşkerî di dema leşkerîya xwe de taybetmendîyên nasnameya nû wergirtin. Leşkerîya mecbûrî li Tirkîyeyê jî hatîye tetbîqkirin. Lê ew tetbîqat bi hêsanî nebûye. Salêñ berê li nav kurdan qaçaxêñ eskeriyê pir bûn. Lê dîsa jî piranîya kurdan ketîye bine siha sîlehê. Ji Kurdêñ ku çûne eskeriyê kêm kesan tirkî baş hîn bûne. Mîna fransîyan bi hezkirina welat venegerîne. Dîsa di nav kurdan de hîkayetên zor û zehmetîyê gelek in. Bi gotineke din leşkerîya mecbûrî nebûye faktoreke însaya nasnameya tirkî ji bo kurdan.

Beriya Komarê, li Fransayê xwendingeh gelek kêm bûn û yên heyî jî bi pereyan bûn. Bernameya xwendingehan ji hêla perwerdeyî ve jî pir kêm bû. Xwendekaran tenê xwendin, nivîsandin hîn dibûn û hinek derbarê bawerîya xiristîyanî de dibûn xwedî agahdar.

Zêdeyê wan jixwe xwendingehê dêran bûn. Çûyina wan zor bû û barek danabû ser milên malbatan. Ji ber vê gelek malbat ji wê kevneşopîya xwendingehê sar bûbûn. Lê Komara Fransa mîna her warî, di warê perwerdehîyê de jî tekel/monopol/yekdestîya xwe tesîs kir. Bi rêya wezaretê perwerdehîya netewî li her cihî, li bajar, navçe û gundan xwendingehê xwe ava kirin.

Amûrê Nasnameya Nû: Xwendingehê Komara Fransayê

Xwendingeh rêxistineke terîqata Cîzvîtan bû. Terîqetê ji bo perwerdehîya murîdên xwe ew sazgeh li her cihê ku civat lê heye, ava kirîbû. Armanca xwendingehê Cîzvîtan perwerde û zêdekirina hemdînên xwe bû¹⁵. Bi gotineke din xwendingeh mîrateke Cîzvîtan bû. Dema ku komarê di her warî de desthildarıya xwe ya yekdest demezirand, perwerde jî girt bin destê xwe. Dewletê li gor armanca xwe ji nû ve şikil da mîrata perwerdehîya Cîzvîtan (Bumîn, 2013). Èdî xwendingeh ne ji bo gihadina dîndaran, lê ji bo çekirina hemwelatîyan bû. Ew sîyaset paşê di warê perwerdehîyê de, bi navê *perwerdehîya hemwelatî* bû perwerdahîya sereke. Niha di hemû pergelên perwerdehîyê de ew cûrê perwerde heye û li gor dewlatan di navbera pênc û duwazde salan de mecburî û bêpere ye.

Xwendina bêperê ya mecburî di demeke kurt de li her derê Fransayê belav bû. Slogana komarperwer “ji bo her gundekî xwendingehhek” bû. Ew rêxistin mîna mîsyonerekî nasnameya nû ya Fransî ava kir. Edî bi vê rîyê komara Fransayê xwe gihad hemû gundîyan ku namzetên nasnameya fransî bûn. Xwendingeha komara Fransayê bi feydeyên xwendingehê prestîj û meşrûbûna perwerdehîya komarê zêde kir. Bi diplomaya xwendingehan gundîyan koça ber bi bajaran kir û karên bajarî hîn bûn. Di kargehêن dewletî û taybet de gundîyên berê yanî fransîyên nû bûn xwedîyên karên bajêr. Helbet armancêن xwendingehan ew qas nebûn. Medenîbûn, paqîjî, exlaq û bawerîya pêşverû jî armancêن din ên xwendingehan bûn.

Stratejiyên Kirdeyan li Qada Perwerdeyê

Wek li jorê hatîye gotin komarperwer xwendingehê, pergala perwerdahîyê mîna makîneya veguherînê difikirîn. Lê tê dîtin ku wê rêxistinê nekarîye hemû hemwelatîyan dorpêç bike. Kirde dikarin derkevin derveyî sazgehêن dewletê. Derbarê vê mijarê de gelek mînak hene ku kirde ji çarçoveya perwerdeya modern derdikevin: Medreseyên Kurdan, li Morîtanya Mahdara, pergela perwerdeyê ya

15 Ali İsra Güngör, Cizvitler, (İstanbul: İlgi Kültür Sanat Yayınları, 2016).

Amishan, Medreseyî Aşâîr a li Îranê, Xwendingehêن Hemwelatiyan a Brezîlya û li Ewropa û li Emerîkayê Xwendingeha Malê.¹⁶

Stratejiyên kirdeyan li nava xwendingehê modern de jî têñ dîtin. Eger çanda xwendingeh û çanda xwendekaran hevdu bigire xwendekar pir li binê bandora xwendingehê namîne. Nêzîkiya çandî ya xwendekaran li hemberî bandora xwendingehê, wan diparêze. Eger xwendingeh ji bo xwendekaran xwedîyê wateyekê nebe berxweda-na xwendekaran derdikeve ortê. Bi stratejîyen Kurdan yên li xwendingehê Tirkan re jî ev baştir tê femkirin.¹⁷

Wateya xwendingehê “guherbar” e, bi gotineke din wateya xwendingehê li gor armanca damêzirandinan nine. Xwendekar li gor ceribandina xwe jî ji nû ve xwendingehê me’ne dikin. Hinek xwendekarên kurd ji bo iqbalâ xwe diçin xwendingehê, ji bo hinekan xwendingeh cihê keyfê ye, hinek jî ji bo armancê malbata xwe, mesela ji bo ku bibe parêzgerê malê yan jî dixwaze bibe xwedanê meslegêن biprestij, mîna muhendîsî û hwd.. Ji ber wan armancan xwendingeh li ser xwendekaran ewqas zêde bandorê nake. Ji ber ku her xwendekar xwedîyê armanceke taybet e.

Hevaltî dînamîkeke kirdebûnê ye. Xwedekar li hemberî xwendingehê bi tenê nîne. Hevaltî stratejîyeke piştgirîyê ye. Xwendekarêن kurd bi rêya hevaltîyê derketine derveyî dînyaya xwendingehê. Bi hevalên xwe bi kurdî diaxivin û bi van re çanda xwe dijîn. Li xwendegehêن tirkan de ji bo xwe dînyayeke din ava dikin. Bi vê rîyê xwe ji bandorêن xwendingehê hinekê diparêzin. Ji hêla din çanda fermî ya xwendingehê mîna “andîmîz, heykelên mezin ên tirkan, û ên din” xwedekaran te’cîz dikin û wan hîşyar dikin û kurditîyê tînin bîra wan.

Mîsyonerên herî mezin ên xwendingehan mamoste ne. Xwendekar bi rêya sinifandina mamosteyan “pîrozî” ya kevneşopîya wan diherimîne. Xwendekarêن kurd mamosteyan wek obje/figûrekî idêolojîk û wek mamosteyêن baş û mamosteyêن xirab sinifandine. Bi vî şîklî wan li hemberî zanîna meşrû ku ji mamosteyan tê, xwe mi-hafaza kirîne. Eger mamoste ji alîyê xwedekaran pîroz bê hesibandin, hemû zanînêñ qirêj û şaş ku mamoste hîn dikin, têñ qebûlkirin. Xwedekaran zanîn jî wekî mamosteyan hesibandine, zanînêñ rast û zanînêñ şaş ji aliyê wan ve hatîye sinifandin. Bi vî şîklî jî bandora mamostayan şikandine.

Di pêvajoya perwerdahîyê de nasname bi însakirina “emên

16 Nurettin Beltekin, Okul ve öteki yurttaşlar, (İstanbul: Vate)

17 Beltekin, 2014

fermî” tê çêkirin. Di “ema fermî” ya perwerdahîya Kemalîstan de “tirkbûn, laîkbûn, rojavanîst, hemdemî” heye. Lê di “em”ê kurdan de ew taybetmendî tüne ne. Ji ber wê xwendekaran bi işaretên ku “we û me” ji hev cuda dikan, “ema fermî” dîtiye û alternatîfa xwe danandine. Înşaya nasnameya kurdî û ji bo xweparastina bandorên xwendingeh “dîtirî (otherness)” faktoreke giring e. Xwendekarê kurd bi vê dîtirîya acizker ya xwendingehê tirkan ji nû ve nasnameya xwe ya kurd înşa kirîne.

Encam

Perwerde pergaleke bibandor e. Di pêvajoya modernbûnê de, li her derê dinyayê hatîye şixulandin. Lê her wekî li jorê hate gotin, ew mîna makîneya cehennemê her tiştî li gor xwe nikare biguherîne. Ji bo guhartinê şert û mercen taybet pêwîst in. Çawa di minaka Fransayê de hatîye dîtin, di demeke kin û nisbeten civateke girtî de mimkûn e. Di civateke vekirî (open society) de pir zor e ku bandorên wisa bêne dîtin.

Li hêla din kesayetên ku xwendingehê hewl daye wan biguherîne, di pêwendiyêng ligel xwendingeh û zanînê de bireserên pasîf nînin, berevajiyê vê yekê wan kesan xwendingeh wek kirde tecrûbe kirine. Me’ne û erkên xwendingehê ji terefê komarê ve di asta makro de, ji bo armancêni siyâsi, aborî û civakî hatine dîyarkirin. Xwendekaran di asta mikro de bi pêwendiya “rûbirû” ya ligel xwendingeh û zanînê, ew me’ne û erk ji nû ve dîyar kirine.

Xwendekaran ji bo armancêni xwe yên taybet, me’ne û erkên xwendingehê ji nû ve pênase kirine. Wan li nava xwendingehê û li hemberî wê bi saya hinek stratejiyan hebûna xwe parastine û destkeftiyêng xwendingehê ji bo armancêni xwe yên taybet bi kar anîne.

Helbet demeke dirêj mayîna di nav perwerdeyê de bê bandor nîne. Xwendekar li binê bandora perwerdeyê de dimîne, çunkî feydeyê perwerdeyê dibine yan jî iqna dibe ji hinek alîyan ve. Ew bandor di vesazkirina nasnameya kurdî de jî xwe nişan dide. Kurdênu ku li xwendingehê dewletê perwerde bûyî dîsa kurd in lê mîna dê û bavêni xwe nînin.

Çavkanî

Althuserr, L. İdeoloji ve devletin ideolojik aygıtları. (Çev. Alt Tümerterkin). İstanbul: İthaki Yayınları, 2003.

Avar, S. Dağ Çiçeklerim. Ankara: Öğretmen Yayınları, 1986.

- Beltekin, N. Okul ve öteki yurttaşlar. İstanbul: Vate, 2014.
- Bumin, K. Batı'da devlet ve çocuk. Çizgi Kitabevi, 2013.
- Güngör, A. İ. Cizvitler. İlgi Kültür Sanat Yayınları, 2016.
- Kaya, A. Pierre Bourdieu'nun Pratik Kuramının Kılıcı: Alan Kavramı. Ocak ve Zanaat. Der: G.Çeşin, E.Göker, A. Arlı, Ü.Tatlıcan. İstanbul: İletişim Yayınları, 2007.
- Mardin, Ş. Türk Modernleşmesi. İstanbul: İletişim Yayınları, 2008.
- Öztürk, S. İsmet Paşa'nın Kürt Raporu. İstanbul: Doğan Kitap., 2007.
- Şirin, H. Eğitimin Siyasal İşlevleri ve Türkiye'deki Sivil Toplum Örgütlerinin Bu İşlevlere İlişkin Görüşlerinin Analizi. Yayımlanmamış Doktora Tezi. Gazi Üniversitesi. Ankara, 2008.
- Touraine, A. Eşitlik ve farklılıklarımızla birlikte yaşayabileceğiz miyiz? İstanbul: Yapı Kredi Yayınları, 2002.
- Weber, E. Köylülerden Fransızlara-Fransa kırsalının modernleşmesi, 1870-1914.
- Ç. Sümer (Çev.) Ankara: Heretik, 2017.

NÎQAŞÊN KURDAN YÊN LI SER ALFABE Û NETEWESAZÎYÊ

Mikail BÜLBÜL^{1*}

*“Yekbûna kurdan bi yekîti-
ya zimanê kurdî çêdibe.
Yekîtiya zimanî jî bi yekîti-
ya herfan dest pê dike.”*
(Celadet A. Bedirxan)

Destpêk

Di pêvajoyên tevgerên neteweyî da endezyarîyên civakî pir dihêن kirin û di van pêvajoyan da li gorî hinek texeyulan, civak ji nû ve dihê avakirin. Di dema van nîqaşên endezyarîya civakî da jî, di gelek civakan da alfabe û nîqaşen li ser revîzyon yan jî guhertina alfabeyê wekî navgîneka ji bo avakirina civakê hatîye dîtin.

Nîqaşen ku li ser alfabe û guhertina wê dihên kirin, piştî heyama ku tevgerên neteweyî wekî pêlekê tesîr li Osmanîyan û gelên di bin banê wan da dijîyan kir, bû yek ji wan qadan ku neteweperwerî rengê xwe dideyê. Gelek gelên ku di bin banê Osmanîyan da dijîyan jî, piştî ku bi sedan salan alfabebla erebî bi kar dianîn, di vê heyama ku neteweperwerî belav dibû, dest bi nîqaşen revîzekirin ango guhertina alfabeyê kirin. Bi tesîra belavbûna fikira neteweperwerîyê kurdan jî li ser revîzyon û guhertina alfabeyê nîqaş kirine. Nîqaşen ku kurdan kirine bêtir piştî Meşrutîyeta Duyan (1908) in. Armanca vê gotarê bi kurtahî tesbîtkirin û ravekirina helwest, fikir û refleksen kurdan in, di van nîqaşen wan yên derbarê alfabeyê da.

Avakirina Neteweyê û Navgîn

Çawa ku dihê zanîn armanca tevgerên neteweyî, avakirina nasnameyên kolektif e. Nasnameyeka kolektif jî ji bo ku ava bibe pêwîstî bi navgînekê heye ku nirxên hevbeş ava bike û wan belav bike. Yek ji van navgînan belkî ya herî xurt jî ziman e. Nîqaşen li ser alfabeyê jî gelek caran di vê konteksê da çêbûne. Piştî ku Şoreşa Fransizan çêbû û giringîya gelî bêtir derket pêş û hat famkirin ku gelek tişt bi gelî ra dikare biçin serî, endezyarîyen ku vê nasnameya

1* Dr, zimannas. Weqfa Mezopotamyayê. E-mail: mikailbulbul47@gmail.com

kolektîf li ser gelî ava bike jî zêde bûne. Ji ber ku nasnameyeka kolectîf eger gel hebûya dikarîbû ava bibûya. Şoreşa Fransizan nîşan dabû ku mirov divê bi gelî ra hereket bike. Edî gel bûbû zemîna gelek tiştan ku yek ji wan jî fikira neteweperwerîyê bû. Loma divê mirovan bi gelî ra hereket bikira. “*Beyî ku mirov xwendin û nivîsandinê nîşanî mirovan bide jî ne mimkun bû ku bi gelî ra hereket bike. Ji bo ku gel bibe xwende jî mecbûrî bû ku navgînên xwendin û nivîsandinê bihatina hêşankirin.*”² Loma mirov dikare bibêje ku ziman û bi zimanî ve girêdayî alfabe, ji ber ku navgînên gihîştina gelî ne, divê navgînên guncav û hêsan bûna.

Di wan deman da ku fikira neteweyî dest pê dike û bi wê fikirê jî dîzaynek nû li ser civakê dihê ferzkirin, têgihek heye ku pir dihê bikaranîn û ew jî “yekîtiya neteweyî” ye. Lewra ji bo yekîtiya neteweyî nirxên hevbeş lazim in û ji bo ku nirxên hevbeş ava bibin jî pêdivî bi navgînega hevbeş heye. Celadet Alî Bedirxanê ku alfabeya latînî ya ku em îro bi kar tînin çê kirîye, dema qala yekîtiya neteweyî ya kurdan dike (1932) ku wê çawa çê bibe, dibêje; “*Yekbûna kurdan jî bi yekîtiya zimanê kurdî çêdibe. Yekîtiya zimanî jî bi yekîtiya herfan dest pê dike*”³. Yanî dibêje yekîtiya kurdan bi yekîtiya alfabebe mimkun e. Li vir em dibînin ku dîzayn û endezyarîya civakî çawa di ser zimanî ra, bi zimanî ve girêdayî û di ser alfabeyê ra dihê texayulkirin.

Dema em li pratîka nîqaşen li ser hêşankirin, revîzekirin yan jî terkkirina alfabeyê ya kurdan dinêrin em dibînin ku fikira bingehîn jî ev yek e. Yanî ji bo ku gel ji cehaletê xelas bibe û pêşketin çê bibe û ew nasnameya ku em dibêjin kolektîf e ava bibe, divê xwendegeh vebin, gel hînî xwendin û nivîsinê bibe û ji bo vê jî navgînega hêsan lazim e ku ew jî alfabeyeka guncav e. Leibniz ji bo rol û giringîya alfabeyê dibêje: “*Tu alfabeyeka xweşik bidî min, ez dê zimanekî xweşik û bi qasî wê xweşikbûnê jî neteweyeka xweşik ji te ra çê bikim.*”⁴

Ne tenê di pratîka kurdan da, di pratîka gelek miletên din da jî gelek mînakên nîqaşen alfabeyê hene. Dema em li arnawidên di bin banê Osmanîyan da dijîyan binêrin jî em dibînin ku piştî hestêwan ên neteweyî bi pêş dikevin nîqaşa alfabeyê kirine.⁵ Arnawid ji bo ku

2 Gülmез, Nurettin, “*Tanzimattan Cumhuriyete Harfler Üzerine Tartışmalar*”, weşanên Alfa Aktüel, İstanbul, 2006, r. 38. veg.. Celal Sahir, “Lisanımız” Serveti Fünun, 27 Ağustos 1325, no:953, r. 261.

3 Bedirxan, Celadet Alî, “*Bi Hinceta Pîroznamekê*”, Hawar, h. 3 r. 489.

4 Tansel F. Abdullah veg.. Gülmез, Nurettin, hb, r. 4.

5 Budak, Ali, “*Münif Paşa Batılılaşma Sürecinde Çok Yönlü Bir Osmanlı Aydımı*”, Bilge Kültür Sanat, İstanbul, 2012, r. 599

yenîtiya neteweyî nîqaş bikin kongreyekê çedikin û herî zêde li ser yenîtiya alfabeteyê nîqaşan dikan. Tiştê balkêş ew e ku di vê kongreyê da dirûşmeyekê diqîrin û dibêjin “*Bijî alfabe*”⁶. Yanî ji bo yenîtiya neteweyî çê bikin dicivin û kongreyekê çê dikan û dirûşmeya, “*Bijî alfabe*” diqîrin. Ev heman mekanîzmaya fikirî ye ku dîzayna civakî di ser alfabeteyê ra dihê texayulkirin. Jixwe arnawid ji bo vê kongreya bi armanca yenîtiya neteweyî çê dikan (1908), *kongreya alfabeteyê* jî dibêjin.⁷ Arnawidan di nav xwe da ji sî salî zêdetir nîqaş kîrin û bi vî awayî karîn derbasî herfîn latînî bibin.⁸

Piştî Meşrûtîyeta Duyan çawa ku tevgera Tirkitîyê ku temsîla wê Îttîhad û Teraqîyê dike hêdî hêdî xurt dibe, rewşenbîrên kurd yên wê demê jî dikevin nav hinek hewildanan. Di 1910an da Kurt Neşrî Maarîf ava dibe û armanca wê belavkirina zanînê ya li Kurdistanê ye. Jixwe dibistanekê jî li Stenbolê ava dikan.⁹ Em dizanin ku di wan deman da, hinek ferheng, rêziman û kîtabên hînkîrinê dihêن amade-kîrin ku ew jî wekî nîşanên neteweperwerîyê dihêن qebûlkîrin. Wekî mînak Muhammed Mîhrî ferheng û gramera kurdî amade kiribû.¹⁰

Dema em li nîqaşen kurdan dinêrin gelek caran hatîye gotin ku herfîn erebî pir zehmet in, zarok pir dereng hîn dîbin û sebeba ce-haleta nav me, ev e. Yanî sebeba paşdemayîna me kîmbûna rîjeya xwendin û nîvîsandinê ye û ew jî ji ber wê ye ku em alfabeteyaka baş û guncav bi kar naynin. Ji ber ku alfabeteyâ hevbeş erebî bû.

Li nav kurdan bi awayekî cidî nîqaşen derbarê alfabeteyê da, di kovara Rojî Kurd (1913) da hatine kîrin. Abdullah Cevdet di nîvîsa xwe ya “Xîtabek” (Bir Hitab) da qala rewşa kurdan û meseleya alfabeteyê dike û ji bo çareserîya rewşa kurdan ya xerab wiha dibêje: “A ewil divê rîjeya xwendin û nîvîsinê bi kîmanî bibe ji sedî cil. Ya duyan, qebûlkîrinâ herfan e ku zarokekî heft-heşt salî herî zêde di mehekê da hîni xwendin û nîvîsandinê û rastxwendina tiştîn dixwîne bike û terkkîrinâ wan herfan e ku heta niha me ew bi kar dianîn.”¹¹ Mirov dikare bibêje ku Abdullah Cevdet yek ji wan kesêñ ewil e ku

6 Can, Bülent Bilmez, Toplumsal Tarih, sayı 179, Kasım 2009, r. 28.

7 Can, Bülent Bilmez, hb, r. 23

8 Dönmez, Cengiz, “*Atatürk ve Harf İnkılabi*”, Türkiye’de Cumhuriyet Politikaları Sempozyumu, Ankara, 2010, r. 6.

9 Malmîsanij, “*Yüzyılımızın Başlarında Kürt Milliyetçiliği ve Dr. Abdullah Cevdet*”, Jina Nû ,Yayınları. 1986, Uppsala r. 41-42.

10 Badıllı, Kemal, “*Türkçe İzahî Kürtçe Grameri*”, veg.. r. 6. Mukaddime-tüI irfan, İstanbul, h. 1336, s. 4, 51.

11 Cevdet, Abdullah, “*Bir Hitab*”, Rojî Kurd, Weşanîn Enstituya Kurdî Ya Stenbolê, Stenbol, 2013, h. 1, r. 99

alîyê wî yê neteweperwerîyê pir xurt e û berovajî gelek rewşenbîrên kurdan ku dixwestin di bin banê Osmanîyan da bijîn, wî demekê daxwaza Kurdistaneka serbixwe kirîye.¹² Jixwe di heman nivîsa ku nîqaşen li ser alfabetê dide destpêkirin “*Em di serdemekê da ne ku netewe derdikevin pêş û ava dibin*”¹³ dibêje. Di kovara Yekbûnê da ku 1913an da li Stenbolê derdiket, ji bo ku rêjeya xwendin û nivîsinê qet nebe bibe ji sedî 40-50, banga “*Vegerin çiyayêن Kurdistanê yên bilind, ji zarokên gelî ra rêberî û mamostetîyê bikin*”¹⁴ dihat kirin. Dîsa Xelîl Xeyalî ku yek ji neteweperwerên kurd yên wê demê ye, di 1913an da di nivîsa bi navê “Ziman” da dibêje, deh tişt hene ku kurd lazim e bikin. Di wê nivîsê da du xalêñ ewilî ev in: “1. *Ji bo xwendin û nivîsandinê herf 2. Ser terzek nû alîfbayek*”¹⁵. Di 1914an da mebûsên Hakkâriyê Munîp û Mehmet Hamza ji meclîsê dixwazin ku ji bo xwendin û nivîsandinê butçeyek bihê dayîn, lewra rêje ji bo ku ji deh hezaran yek bibe ji hezarî yek.¹⁶ Mesûdê Suleymanî di Rojî Kurd da dibêje: “*Ji bo hînkirina zarokan ya sî û sê herfan zêdeyî du sed şikilên bêhereke lazim e ku ev jî eşkere ye ku hem mamoste hem jî xwendekar çiqasî zahmetîyê dikşînin. Ev îsbat dike ku cehaleta imûmî ji ku dihê.*”¹⁷

Di nîqaşen li ser alfabetê da fikira ku erebî zimanekî samî ye û kurdî û tirkî ne di malbata zimanê erebî da ne û ji ber vêya jî alfabetaya erebî ne guncav e, gelek caran hatîye gotin. Di kovara Jînê (1918) da ku rewşenbîrên kurdan li Stenbolê derdixistin û di vê kovarê da fikir û refleksen xurt yên neteweperwerîya kurdî pir in, ûlanek heye ku dibêje: “*Em ci bikin, zimanekî arî di şiklê alfabeteyka samî da tenê ewqas bifêde ye. Îbretê jê bistînin.*”¹⁸ Balkêş e ku ev ûlan di gelek hejmaran da hatîye dubarekirin. Bi rastî gelek mînakên bi vî rengî di nav kurdan da peyda dibin.

Dema em bala xwe didin destpêka nîqaşen li ser alfabetê, bi giştî meylek heye ku di alfabetê da revîzyonê dixwazin, lê terkirina alfabetaya erebî naxwazin. Di vî warî da hinek refleksen kurdan hene

12 Malmîsanij, hb, r. 76.

13 Cevdet, Abdullah, hb, r. 99.

14 Malmîsanij, hb, r. 58.

15 M. X., “Ziman”, Rojî Kurd, h. 3. r. 186-187.

16 Malmîsanij, “Yüzyılımızın Başlarında Kürt Milliyetçiliği ve Dr. Abdullah Cevdet”, Jina Nû ,Yayınları. 1986, Uppsala r. 56.

17 Mesûd, Suleymanyeli, “Hurûfumuz ve Teshîl-î Kira’atî” Rojî Kurd, h. 1, r. 112-113.

18 Jîn (1918-1918), *Kovara Kurdî- Tirkî*, wer. M. Emîn Bozarslan, Weşanxana Deng, Upsala, 1985 c. 4, h. 20, r. 850.

û yet ji van refleksan ew e ku herfêن erebî wekî *herfêن îslamî* û *herfêن Qûranê dihêن* dîtin. Mentiqa vê yekê jî ew bû ku Qûran ji ber ku bi erebî hatibû nivîsîn, tercîha herfêن latînî ne rast bû. Ji ber ku Quran pîroz bû, herfêن pê hatibûn nivîsîn jî pîroz dihatin dîtin. Di nava kurdan da dema bikaranîna herfêن latînî dihê nîqaşkirin Qûran wekî mînak dihê dayîn. Di dema destpêka komara tirkân da jî li ser guhertina alfabetê şîrove hatibûn kirin ku digotin, *herfêن Qûranê bi herfêن latînî ku yên xirîstîyanan in, hatine guhertin.*¹⁹ Di Rojî Kurd da di daxuyanîya li ser navê “Cemîyeta Belavkirina Ilim û Serastkirina Herfan” da piştî ku dihê gotin sebeba cehaleta me herf in, divêbihê seraskirin, bikaranîna alfabetê latînî wekî “*qut-kirina têkilîya miletên İslâmî ya bi erebî* û -Xwedê neke- *xerakirin* û *tunekirina İslâmîyetê*”²⁰ dihat dîtin. Em dikarin bibêjin ku di van nîqaşen navborî da bi giştî, guhertina alfabetê wekî redîya çand û civaka berê dihê dîtin û ji ber vê jî meyla revîzekirinê li pêş e. Em heman bertekan di nîqaşen arnawidan ên li ser alfabetê da jî dikarin bibînin. Ji ber ku mislimanên arnawid heman refleks nîşan didan û li hember bikaranîna alfabetê latînî derdiketin.²¹

Çawa ku alîyekî din yê meseleya alfabetê heye ku guhertina wê taybetîyeka dîzayneka nû ya civakê di xwe da dihewîne û ew fikira dîzaynê wekî ku me li jor jî qal kir piştî Meşrûtiyeta Duyan bêtir bi saîqên neteweper bû, qedexekirina wê jî dikare wekî dijstratejîyeka vê stratejîya dîzaynê bilî dîtin. Yanî ji ber ku alfabe dibû yek ji dîyarkeren tevgeren neteweperwer, gelek caran wekî stratejîyekê qedexekirina bikaranîna alfabetekê ya ji hêla hêzekê ve, dihat manneya astengkirina tevgereka neteweyî. Wekî mînak dema arnawidan alfabetekîa nû çêkir ew ji alîyê Abdulhamîd ve dihê qedexekirin.²² Weşanên kurdî jî dîsa dihên qedexekirin û wekî talûke dihê dîtin. Di vê fermanê da ligel qedexekirina alfabetê arnawidî behsa qedexekirina lugateka kurdî jî dihê kirin. Ya balkêş ew e ku ew lugat em dizanîn ku hedîyeyek taybet ji bo Abdulhamîd bû ku ji alîyê Yusuf Zîyaeddîn Paşayê Qeymeqamê Mûtîkî ve hatibû nivîsîn û navê wê jî El-Hedîye El-Hamîdîye Fî'l Lugat El-Kurdîye (1894) bû.

19 Altun, Mustafa, “*Alfabeye Değişiminin Tarihsel Gelişimi Üzerine Bir Değerlendirme*”, Cumhuriyetimizin 81. Yılına Armağan, Sakarya Üniversitesi Rektörlüğü Atatürk İlkeleri ve İnkılap Tarihi Araştırma ve Uygulama Merkezi Müsürü, 2004, r. 61.

20 Rojî Kurd, “*Roji Kurd Mecmu'ası Müdîriyyet-i 'Aliyyesine*”, h. 2, r. 144-147.

21 Can, Bülent Bilmez, Toplumsal Tarih, sayı 179, kasım 2009, r. 30.

22 BOA: Başbakanlık Osmanlı Arşivi, BOA. Y.PRK.MF., 5/32, Dîrok: 29/Z /1325 (H), 02.02.1908 (M).

Eger em bala xwe bidin pratîka kurdan ya li axa Sovyetê em dikarin gelek nimûneyan li ser vê dijstratejîyê bibînin ku bi rêya alfabetê hatine kirin. Lazim e mirov vêya bibêje ku pratîka kurdan ku bi guhertina alfabetê bi encam bûye, pratîka nav sovyetê ye. Kurdên Ermenistanê di adara 1930î da bi rojnameya *Riya Teze* dest bi bikaranîna alfabeleya latînî kirine²³. Piştî ku demekê Sovyetê bikaranîna alfabeleya latînî teşwîq kir û li ser dewletên Asyaya navîn ferz kir, di dawîya salên 1930î da ku neteweperwerîya slavî xurt bûbû, alfabeleya latînî qedexe kir. Rîya Teze ku bi tîpêñ latînî derdiket bi hinceta, *alfabeleya latînî* ku Emperyalizm wê bi kar tîne²⁴ *dihê* girtin. Sovyetê alfabeleya latînî qedexe kir û ya kîrîlî li ser gelên Sovyetê ferz kir. Rûsan êdî bi alfabeleyaka hevbeş, ku ew jî kîrîlî bû, dixwestin tîpîlojîyeka sovyetîk çê bikin.²⁵ Bi vî awayî kurd mecbûr man ku derbasî alfabeleya kîrîlî bibin. Sovyetê alfabeleya kîrîlî li ser tirkêñ Asyaya Navîn jî ferz kir û ji bo ku di nav tirkêñ Asyaya Navîn da têkilî çê nebe û yekîtiyâa tirkan pêk neyê, ji bo alfabeleya her dewleteka tirk alfabeleyaka kîrîlî ya cuda çêkirin ku di her alfabeleyê da heşt-deh herf cuda bûn.²⁶ Dema Sovyetê yek ji encamên guhertina herfên erebî bi latînî jî kêmkirina hêza cemaatên dînî ye. Wekî ku me got çawa çêkirina alfabeleyaka nû dikare bibe stratejîyek, qedexekirin jî dikare wekî dijstratejî bihê dîtin. Gelek nimûneyen vê yekê li cografyayê din jî peyda bûne. Wekî mînak piştî ku di sala 1941ê Xirvatîstanê, bi alîkarîya Nazîyan dewletbûna xwe ilan kir bi hefteyekê, Xirvatian bikaranîna alfabeleya kîrîlî li sirban qedexe kir.²⁷ Partîya wan ya bi navê Ustasheyê wekî nazîyan neteweperest bû, dixwest ziman û miletekî safî çê bike. Çîn hîn jî niha li herêma Sincan-Uygurê herfên erebî teşwîq dike.²⁸ Bikaranîna alfabeleyaka nû çiqasî derî li jîyaneka nû vedike ewqas jî dikare redîya çand û jîyaneka nû be. Mirov dikare bibêje ku kurdan guhertina alfabetê wekî redîya mîrasa çandî û sîyasî ya berê dîtine. Di vê meseleyê da belkî tu gotin wekî ya Vekîl

23 Şamil, Hejarê, "Diaspora Kürtleri, Sovyet Kürtleri hakkında tarihi ve Güncel İnceleme", Pêri Yayınları, İstanbul, 2005, r. 210.

24 Şamil, Hejarê, hb. r. 210.

25 Nogayeva, Ainur, "Orta Asya'da Alfabe Tartışması", <http://www.fikirdebirlik.org/yazi.asp?yazi=201302005>

26 Demirci, Ümit Özgür, "Türk Dünyasında Latin Alfabesine Geçiş Süreci (Geçmişten Günümüze)" *Türk Yurdu Dergisi*, h. 287 2011, r. 225-229.

27 Azarkan, Ezeli, "Slovenya, Hırvatistan ve Bosna'nın Bağımsızlık Mücadeleleri ve Yugoslavyanın Dağılışı" Cilt 8, h. 2, 2011, r. 68 veg.. Taşar vd, 1996:54-58.

28 Hasanova, Vafa, Turan Stratejik Araştırmalar Merkezi Dergisi, Sayı 13, 2012, r. 8.

Hacîlî ku ji bo rewşa Azerbaycanê dibeje ne balkêş û di cî da ye. Hacîlî ji bo rewşa Azerbaycanê ku di sedsalekê da sê alfabe guhertin, dibêje ku kevirên goran êşê didin mirovan, ji ber ku hinek bi erebî hinek bi kîrîlî hinek jî bi latinî hatine nivîsîn û ew mîna temsîlkarêñ sê miletan in.²⁹

Îro jî meseleya nîqaşen li ser alfabetê bêtir jî ji bo kurdan gelekî aktûel e. Wekî mînak li Kurdistana İraqê di van salêñ dawî da li ser revîzyon û guhertina alfabetê nîqaş çêbûn û alfabetaya xwe revîze kirin. Qismek ji rewşenbîran dixwazin derbasî alfabetaya latînî bibin lê bertekêñ hişk dihêñ nîşandayîn. Herwiha em dizanin ku Bexda jî naxwaze kurdêñ Kurdistana İraqê derbasî herfêñ latînî bibin.

Encam

1. Di nav kurdan da bêtir kesêñ ku xwestine dîzayneka nû bidin civakê li ser alfabetê nîqaş kirine. Di van nîqaşan da rêya dîzaynê, bi perwerdeyê mimkun hatîye dîtin û meseleya alfabetê jî di vê çerçoveyê da hatîye nîqaşkirin. Yanî eger herfêñ guncav hebin guhertina civakê jî wê hêsanter pêk bihê, fikireka bingehîn e.
2. Di nava kurdan da dema li ser paşdemayîna civakê nîqaş hatîye kirin, alfabe yek ji sebebêñ paşdemayînê û gelek caran jî wekî sebeba bingehîn hatîye dîtin.
3. Em dikarin bibêjin ku kurdan nîqaşen li ser guhertina alfabetê wekî redîya mîrasa çandî û siyasî ya berê dîtine û bertek nîşan dane. Mesele berteka, eger em dest ji alfabetaya erebî berdin em dê dûrî alema Îslamê bibin, di nava kurdan da pir dihê dîtin.
4. Di nav kurdan da di destpêka van nîqaşan da meyla xurt ew e ku alfabe ji binî da neyê guhertin lê revîzyon bihê kirin. Ji bo vê jî, nivîsîna cuda ya herfan wekî çare dîtine û bi vî rengî jî alfabetê nû çê kirine.
5. Pratîka ewilî ya ciddî ya guhertina alfabetê û bikaranîna alfabetaya latîna ya kurdan li nav axa Sovyetê çê bûye. Belkî ji ber ku rejîm sosyalist e û mafêñ gelan yên neteweyî û heqê xwetayînkirina qedera xwe hatîye dayîn, bertekêñ cidî çenebûne. Piştî ku slavîzm bi pêş dikeve û kîrîlî li ser gelan dihê ferzkirin, kurd dest ji latînî ber didin û kîrîlî bi kar tînin.

29 Hacili, Vekîl, 1999:4, veg.. Ayça Ergun, "Azerbaycan'da Bir Ulusal Kimlik Mücadelesi Olarak Alfabe Değişiklikleri", Bilig, sayı, 54, r. 152-3.

Çavkanî

Jîn (1918-1918), *Kovara Kurdî- Tirkî*, wer. M. Emîn Bozarslan, Weşanxana Deng, Upsala, 1985

Gülmez, Nurettin, “*Tanzimattan Cumhûriyete Harfler Üzerine Tartışmalar*”, weşanên Alfa Aktüel, İstanbul, 2006

Bedirxan, Celadet Alî, “*Bi Hinceta Pîroznamekê*”, Hawar, h. 3

Altun, Mustafa, “*Alfabeye Değişiminin Tarihsel Gelişimi Üzerine Bir Değerlendirme*”, Cumhûriyetimizin 81. Yılına Armağan, Sakarya Üniversitesi Rektörlüğü Atatürk İlkeleri ve İnkılap Tarihi Araşturma ve Uygulama Merkezi Müsürlüğü, 2004

Malmîsanij, “*Yüzyılımızın Başlarında Kürt Millîyetçiliği ve Dr. Abdullah Cevdet*”, Jina Nû Yayınları, 1986, Uppsala

Badıllı, Kemal, “*Türkçe İzahî Kürtçe Grameri*”, Ankara Basım ve Ciltevi, Ankara, 1965

Jîn (1918-1918), *Kovara Kurdî- Tirkî*, wer. M. Emîn Bozarslan, Weşanxana Deng, Upsala, 1985

Can, Bülent Bilmez, Toplumsal Tarih, sayı 179, Kasım 2009

Budak, Ali, “*Münif Paşa Batılılaşma Sürecinde Çok Yönlü Bir Osmanlı Aydımı*”, Bilge Kültür Sanat, İstanbul, 2012

Cevdet, Abdullah, “*Bir Hitab*”, Rojî Kurd (1913), Weşanên Enstituya Kurdî Ya Stenbolê, Stenbol, 2013, h. 1

Dönmez, Cengiz, “*Atatürk ve Harf İnkılabi*”, Türkiye’de Cumhuriyet Politikaları Sempozyumu, Ankara, 2010

M.X., “*Ziman*”, Rojî Kurd (1913), Weşanên Enstituya Kurdî Ya Stenbolê, Stenbol, 2013, h.

h. 3.

Mesûd, Suleymanyeli, Rojî Kurd (1913), Weşanên Enstituya Kurdî Ya Stenbolê, Stenbol, 2013, h. 1

Ergun, Ayça, “*Azerbaycan’daki Bir Ulusal Kimlik Mücadelesi Olarak Alfabe Değişiklikleri*”, Bılıg, sayı 54

Şamil, Hejarê, “*Diaspora Kürtleri, Sovyet Kürtleri hakkında tarihi ve Güncel İnceleme*”, Pêrî Yayınları, İstanbul, 2005

Demirci, Ümit Özgür, “*Türk Dünyasında Latin Alfabetesine Geçiş Süreci (Geçmişten Günümüze)*” *Türk Yurdu Dergisi*, sayı 287, 2011

Nogayeva, Ainur, “*Orta Asya’da Alfabe Tartışması*”, <http://www.fikirdebirlilik.org/yazi.asp?yazi=201302005>

Azarkan, Ezeli, “*Slovenya, Hırvatistan ve Bosna’nın Bağımsızlık Mücadeleleri ve Yugoslavyanın Dağılışı*”

Hasanova, Vafa, Turan Stratejik Araştırmalar Merkezi Dergisi,

Sayı 13, 2012

Rojî Kurd (1913), “*Rojî Kurd Mecmuası Yüce Müdürlüğüne*”,
Weşanê Enstituya Kurdî Ya Stenbolê, Stenbol, 2013, h. 2

BOA: Başbakanlık Osmanlı Arşivi, BOA. Y.PRK.MF., 5/32,
Dîrok: 29/Z /1325 (H), 02.02.1908 (M).

DU KELAMBÊJÎN JIN YÊN YARSAN: MAMA CELALE Û REMZBAR

Sevda ORAK REŞİTOĞLU¹

Destpêk

Edebiyata yarsanî di nav edebiyata kurdî de dibe ku ya herî kevn be. Her çiqas kûr û dewlemend be jî, xebateke zêde li ser nehatiye kirin. Yek ji sedemên vê ew e ku yarsan di nav xwe de, xwedî çandeke veşartî ne. Kesên ku mensûbî vê çandê ne, nexwestine çanda wan li derive belav bibe. Ev jî ji ber vê sedemê pêk tê ku tirseke wan a mezin hebûye li hemberî kesên ku ne yarsan in, yanî em dikarin bibêjin ku li hemberî misilmanan. Ji ber van sedeman, ev çand di nav xwe de veşartî maye heta ku oryantalîstên curbicur ên wek Comte de Gobineau û Vladimir Minorsky hatine û bi wan hesiyane. Comte de Gobineau yarsan li derive wek Ehl-î Heqq dane nasîn. Ji xeynî van oryantalîstan, van salêن dawî nivîskarêن wek Mohammed Mokri, Martin van Bruinessen, M. Reza Hamzeh'ee û Shahab Vali derketine ku li ser çand, bawerî, jiyana civakî û doktrînên yarsanan xebitîne. Mirov dikare bibêje ku di nav van nivîskaran de kesên ku li ser kelamên yarsanan xebitîne Mohammed Mokrî û Shahab Vali ne. Her wiha Hamzeh'ee jî bi awayekî berfireh li ser sosyolojiya yarsanan xebitiye.

1. Nêrîneke Kurt li Ser Yarsaniyê

Tê zanîn ku di nav kurdan de ji xeynî îslamê dînên wek yarsanî û êzdîtiyê jî hene. Ev her sê dîn li gorî bîr û baweriya bawermendên xwe ji gelek aliyan ve ji hev pir cuda ne. Ji ber ku mijara me jinêن yarsan e, ji bo têgihîştina bîr û baweriya wan em ê bi kurtasî behsa yarsanîyê bikin.

Yarsanî yek ji dînên kêmâr ên kurdan e ku bi piranî li rojhilate Kurdistanê belav bûye. Li gorî kategoriya dînan mirov dikare bibêje ku ev dînekî serbixwe ye, lewre her çiqas wek gel nêzî misilmanan

¹ Li Zanîngeha Mardin Artukluyê vekoler e.

jiyabin jî çand û baweriya wan ji ya Îslamê pir cuda ye. Yarsanan hem dînê xwe hem jî çanda xwe bi awayekî veşartî jiyane da ku li derive belav nebe. Weku ji kelaman ango ji gotinên pîroz jî diyar dibe, yarsan xwedî dîrok û çandeke pir kevn in, lê belê li ser çand û dîroka wan agahiyeye zelal tuneye, lewre yarsanan kelamên xwe heta serdema Sultan Sehak (ss. 15mîn) qeyd nekirine. Li gorî yarsanan di serdema Sultan Sehak de yarsanîyê şîklê xwe yê herî dawî girtiye, kelam û gotinên wan ji aliyê Pîr Mûsiyê nivîsevanê Sultan ve hatine tomarkirin.

Li gorî ku Shahab Vali destnîşan dike, kevneşopiya yarsanan yek ji wan doktrînen mîstîk e ku li ser veşartîbûnê ava bûne.² Baweriyê yarsanan yên wek “cewherê îlahî, dûnadûn, tecellî, ferîştenasî” û hwd bingeha doktrîna wan ava dike.

Cewherê îlahî: Yek ji mijarêن girîng ên metn û doktrînen yarsanan têgeha “zât” e. Ev têgeh di kelamên yarsanan de heye û her kesê pîroz li gorî vê baweriyê, xwedî xwezaya xwe ye. Ji vê têgehê diyar dibe ku «bûyîn» di kozmolojiya yarsanan de aliyekî îlahî ye.³ Li gorî Shahab Vali, ev têgeh di kelamên yarsanan de di heman demê de bi navê “*ferr/xwarne*” jî tê nîşandan. Her wiha “*ferr/xwarne*” ku tê wateya lutfa îlahî di dîmê zerduştî de jî ji bo şahêن keyanî an jî ji bo çend lehengên mîtolojîk tê bikaranîn.⁴ Lutfa îlahî (*ferr/xwarne*) dikare bi şekl û sembolên cihê xuya bibe. Li gorî Vali li cem yarsanan *ferr/xwarne* bi ronahiya îlahî xuya dibe, çawa ku di dema bûyîna Sultan Sehak de teyrekê ew anije.⁵

Dûnadûn: Dûnadûn yek ji baweriyêن girîng e li cem yarsanan ku li gorî wan mirin “kirasguhertîn” e. Ango pişîfî mirina kesekî, ew car din di bedena kesekî din de xuya dibe. Li gorî vê baweriyê her kes, ji bo temamkirina mafê jiyanê ku jê re tê dayîn, 1001 carê kiras diguherîne. Wexta ku ev çerx temam dibe, li gorî karênu ku di wan bedenan de kiriye û jiyanâku berdewam kiriye, ji çerxa *dûnadûnê* derdikeve û yan digihîje Nûra bêdawî yan jî digihîje Tariya bêdawî. Weku Vali jî vê pênaseyê piştrast dike, li gorî vê doktrîna yarsanan ruh ne tenê dikare têkeve laşê mirovan, di heman demê de dikare têkeve yê heywanan jî, her wiha yê giya û tiştêن bêtevger jî. Bi vê nêrînê, bi mirina laşekî fîzîkî, vejîneke nû di laşekî din de pêk tê û

2 Vali, Shahab, *Les Yârsâns, Aspects Mythologiques- Aspects Doctrinaux*, Editions universitaires européens, Saarbrücken, 2011, r. 16

3 h.b., r. 31

4 h.b.

5 h.b., r. 33

têkiliyek din rê dide ku bide dû tecrûbe û peresîna wî.⁶

Tecelliî (Teofanî): Li gorî têgeha tecelliyyê, hebûneke xwedayî yan jî xwedayek, dikare di mekanekî de, di objeyekê de, di hebûnekê de yan jî di însanan de carinan bi temamî carinan jî ne bi temamî xuya bibe. Dikare bi însanan re têkeve têkiliyê yan jî fermanan bide wan.⁷ Li gorî baweriya yarsanan Xwedê di bedena van kesayetan de tecellî kiriye: Behlûl, Şah Fezl Velî, Baba Serhengê Dewdanî, Şah Xoşîn, Baba Nawis, Sultan Sehak.

Ferîştenasî: Ferîştenasî li cem yarsanan yek ji sîstemên perestînê ye. Weku Vladimir Minorsky diyar dike, li gorî kevneşopiya yarsanan, civaka yarsanan ji Heft Ferîşteyên Sereke pêk hatiye, ji avabûna cîhanê û vir de, her wiha di her serdema xwenîşandanê de yekî ji wan xwe nîşan daye, ango di heft dewran de xwenîşandana îlahî pêk hatiye.⁸

Li gorî Hamzeh'ee, yarsan ji wî Xwedayî bawer dikin ku karibe li ser rûyê erdê tecellî bike. Li gorî vê baweriyyê, bi heft tecelliyan gelek tecellîyên biçûk jî pêk hatine.⁹

Di ferîştenasiyê de komên wek "Heften" û "Heftewane" hene. "Heften" ji şes ferîşteyên sereke û Xwedê pêk tê ku beriya tecelliya îlahî xuya bûne. "Heftewane" koma duyemîn a ferîşteyên yarsanan e. Wisa tê zanîn ku ev *Heftewaneya* serdema Sultan Sehak avakarê heft şaxan e ku dûre ew ê bibe yazdeh. *Heftewane* xwedî cihekî girîng e ji bo yarsanan û li gorî baweriya wan *Heftenê* alîkariya *Heftewaneyê* kiriye. Prensîba bingehîn a vê sîstemê ew e ku wexta yek ji wan wenda dibe yekî din dikeve şûna wî. Heke şes ferîşte di heman demê de di serdemekê de xuya bibin, ev tê wê wateyê ku serdemeye nû ya Dîrokê dest pê dike.¹⁰

Li gorî kevneşopiya yarsanan, heft ferîşteyên sereke hene: Pîr Binyamîn, Dawud Dewdanî, Pîr Mûsî, Mistefa Dawidan, Xatûn Dayrak (Remzbar), Baba Yadîgar. Yarsan wisa bawer dikin ku yê heftemîn Sultan Sehak e, lewre koma van ferîşteyan wek *Heften* tê

6 b.b., r. 37

7 Sinanoglu, Mustafa, "Tecelliî", Islam Ansiklopedisi, cilt. 40, 2011, rr. 243-245

8 Minorsky, Vladimir, "The Sect of the Ahl-i Hakk", in *Iranica, Twenty Articles*, Publication of the University of Tehran, vol. 775, 1964 r. 251

9 Hamzeh'ee, M. Reza, *Yaresan (Ehl-i Hak)*, çev. Ergin Öpenguin, Avesta Yayınları, İstanbul, 2008, r. 162

10 During, Jean, "Notes Sur L'Angéologie Ahl-e Haqq", dans *Syncrétismes et Hérésies Dans l'Orient Seldjoukide et Ottoman (XIVe-XVIIIe Siecles)*, Actes du Colloque du Collège de France, octobre 2001, Sous la direction de Gilles Veinstein, Peeters, 2005, Paris, r. 134

zanîn.

2. Rola Jinan Di Sîstema Dînî ya Yarsanî De

Edebiyata yarsanan li ser kelaman ava bûye. Kelam gotinêñ pîroz ên Xwedê, ferîste û pîran in, her wiha yên ku *kelam* dibêjin jî wek “yên xwedî kelam” têne zanîn. Li gorî Ziba Mir-Hosseini diyar dike, *kelam* bi awayekî îlahî derketine û “gotinêñ pîroz” in ku nîfş bi nîfş bi awayekî devkî belav bûne.¹¹ Her wiha, Mir-Hosseini dîsa diyar dike ku mirov di van “gotinêñ pîroz” de dikare dîrok, kok û sedemêñ ayînêñ veşartî bibîne, bi kurtasî mirov dikare *sedema bûyînê* bibîne.¹²

Jinêñ yarsanî ji ber baweriya xwe, li gorî jinêñ misilman xwedî jiyanekî azadtir in. Dikarin *kelaman* bibêjin, li tenbûrê bidin û biçin *Cemê*. Lê her çiqas biçin *Cemê* jî nikarin li wir *kelaman* bibêjin. Weku me diyar kir, li gorî baweriya yarsanan jiyanâ mirovan li ser *dûnadûnê* ava bûye, yanî piştî mirina kesekî, ruh dikare di bedena yekî din de xuya bibe. Ji ber vê baweriyyê, ruh heke ji bedena mîrekî derketibe dikare têkeve bedena jinekê, berevajê vê jî mimkun e. Ev taybetiya *dûnadûnê* dihêle ku jin û mîr di baweriya yarsanan de wekhev bêne dîtin. Her wiha ji ber ku zayenda berê ya kesekî nayê zanîn, dikare bê gotin ku li cem yarsanan girîngiya zayendê tuneye. Di kevneşopiya yarsanan de her çiqas me behsa wekheviya jin û mîran kiribe jî helbet hin îstîsna hene. Jinêñ yarsan di xwendina kelaman de azad in, lê belê li ayînêñ dînî, ango li *Cemxaneyê* nikarin tevlî *Cemê* bibin. Lê li dijî vê, xwarina ku li *Cemê* tê belavkirin, ji bo her kesî wekhev tê parvekirin, jin jî tê de.

Cemxane cihê îbadetê ye û cihekî pîroz e ji bo yarsanan. Teví jinan, her kes dikare biçe *Cemê* û baweriya xwe pêk bîne. Lê belê cihê rûniştinê li gorî jin û mîran, heta li gorî zarok û xortan hatiye veqetandin. Yanî her kes nikare li gorî serê xwe biçe û li derekê rûne. Bi taybetî jî jin û mîr nikarin li ba hev rûnin. Li gorî yarsanan mîr li cihê pêşî rûdinin, zarok û jin jî li pişt wan rûdinin. Yanî ne mimkun e ku jin û zarok di rêza mîran de rûnin. Cihê rûniştina li *Cemê*, di kelaman de jî derbas dibe û Sultan Sehak di kelameke xwe de diyar dike ku li *Cemxaneyê* cihê jin û zarokan li pişt e, xort û mîr jî li pêşiyê rûdinin:

11 Mir-Hosseini, Ziba, “Inner Truth Outer History: The Two Worlds of the Ahl-i Haqq of Kurdistan”, in *International Journal of Middle East Studies*, Vol. 26, no. 2, (May, 1994), Cambridge University Press, 2014, r.268

12 Mir-Hosseini, Ziba, “Redefining the Truth: Ahl-i Haqq and the Islamic Republic of Iran”, in *British Journal of Middle Eastern Studies*, Vol. 21, no., 2 (1994), published by: Taylor&Francis, Ltd., 2014, r. 213

Sultan meremû:
Cemxane ve piştin cemxane ve piştin
Perî jinana cemxane ve piştin
Zaro jinê nowa be yek hemnişîn
Lamî û nêraniş bo ne pişt giştin¹³

(Sultan dibêje:
Cemxane li pişt e Cemxane li pişt e
Ji bo jinan Cemxane li pişt e
Zarok û jin bi hev re rûdinin
Li pişt xort û mérän rûdinin)

Sultan Sehak di kelameke xwe ya din de jî cih daye *Cemê* û rêza rûniştina zarok, xort, jin û mérän nîşan kiriye. Sultan Sehak diyar kiriye ku divê her kes li gorî rûbaza *Cemê* rûne û divê jin û mér tevlî hev nebin û bi hev re rûnenin. Her wiha behsa belavkirina xwarina *Cemê* jî dike. Li gorî Sultan divê xwarin ewil ji bo mérän bê dayîn, piştî wan ji bo xortan û piştî xortan jî divê ji bo jin û zarokan bê dayîn. Lê belê divê em li vir diyar bikin ku her xwarin wekhev tê parkirin, yanî ji bo mér û xortan ci qas bê dayîn, ji bo jin û zarokan jî ew qas xwarin tê dayîn:

Sultan meremû:
Ha lamî û nêran ha lamî û nêran
Ne piştî qapiyê Cem ha lamî û nêran
Usa nîş Cemî pey wîşan gîran
Beşêsan domay mirdanî didan
Domay î du Cem im car pey jinan
Perî şan berşû yekreng beş diran
Zaro û mird ew yek têkel nekiran¹⁴

(Sultan dibêje:
Xort û mér xort û mér
Li pişt deriyê Cem xort û mér
Wisa rûnin li Cemê cihê xwe bigrin
Piştî mérän xwarinê bidin xortan
Piştî van her duyan bidin jinan

13 Hoseynî, S. M., Dîwana Gewre, Entesaratê Baqê Nêy, Kermanşah, 1382/2003,
r. 27

14 b.b.

*Beşa her kesî wekhev bidin wan
Nekin têkilhev zarok û mérän)*

Li ser adabê *Cem*, Xanê Elmas di kelameke xwe de behsa cihê Xwedê û ferîsteyan dike. Li gorî ku diyar dike, gava ku mirov besdarî *Cemê* dibe, Cism (Beden) derdikevin huzûra Sultan û şes ferîsteyên wî. Xanê Elmas van her şes ferîsteyan wek taybet û muhterem pênase dike. Weku diyar dike, çar koşeyên *Cemê* ji bo ferîsteyan hatine vegetandin, ev her çar ferîşte li *Cemê* xuya nabin, lê cihê wan diyar e û her kesê ku diçe *Cemê* vî tiştî dizane. Her wiha wisa diyar dike heke kesek karibe yekê ji wan bibîne, tu qudrafa wî namîne ku li wir rûne. Cihê jor ê *Cemê* wek cihê Sultan, koşeya rastê wek cihê Binyamîn diyar dike û wisa dide nîşan ku Binyamîn her gav duayan dike. Cihê Dawud diyar dike û dibêje Dawud her dem digihîje hawara gelê xwe. Cihê Pîr Mûsî diyar dike û dibêje ku ew xwediyyê tûmaran e, ji ber ku Pîr Mûsî wek nivîsevanê Sultan tê dîtin û her tiştî qeyd dike. Koşeya çepê wek ya Mistefa diyar dike û li gorî baweriya yarsanan Mistefa Azraîl e, ji ber vê Xanê Elmas wî wek bi kîn û qar pênase dike. Taybetiya dînê yarsan ew e ku li *Cemê* cihê sembolîk ê jinekî jî heye û ew cih yê Remzbar e. Remzbar jî li wir wek ferîşte cihê xwe digre û her dem li wir hazır e. Xanê Elmas wexta ku cihê Remzbar ê li *Cemê* diyar dike, dibêje gel ji bo karêñ xwe divê ji wê rica bikin.¹⁵

Di çanda yarsanan de her kes dikare li tenbûrê bide, yanî ji kesên kal heta ciwan û zarokan, her wiha jin jî dikarin li tenbûrê bidin. Heta di nav tenbûrvanên jin de yên pir mezin jî hebûne, wekî mînak Reyhan Xanim Loristanî tenbûrvanek girîng bûye û yek ji nêzîkên Şah Xoşîn bûye. Dayê Xezan Sergetî di serî de sunnî bûye lê piştre bûye yarsan û tenbûrvanek mezin. Her wiha Nêrgiz Xanim Şah-rizûrî jî berê sunnî bûye û piştî ku bûye yarsan ew jî bûye tenbûrvaneke mezin. Xatûn Zer Banû Derziyanî jî hem tenbûrvan û hem jî xwedî kelam bû.

Yek ji mijarêن girîng jî “jinêن bakîre” ne di baweriya yarsanan de. Li gorî yarsanan her serdemê jinek bakîre hebûye wek Meryem, lê bi qasî em dibînin tenê dayîkên Xwedê û ferîsteyên wek Sultan Sehak, Şah Xoşîn bûne û van jinan zarokên xwe yan ji devêñ xwe anîne yan jî bi awayêñ din ku ji bo anîna zarokan ne xwezayî ne. Li gorî ku Martin van Bruinessen diyar dike, di van serdeman de jina bakîre her dem eyñî jin e, lê zarokê ku tê dinyayê her dem zarokekî

15 Xan Elmas, *Dîwân*, nusxeya çapnebûyî ya Seyîd Xelîl ‘Alînejad, rr. 10-12

din e. Carinan Xwedê bi xwe ye carinan jî yek ji ferîsteyên Wî ye.¹⁶

Li gorî doktrîna yarsanan, girîngiya mîrêن xwedî kelam û kelamên wan ji aliyê pîrozbûnê ve çi qas zêde be, ya jinan jî ew qas zêde ye. Ji ber vê jî kelamên jinêن yarsanan nehatine piştguhkîrin û ew jî wek pîroz hatine qebûlkîrin. Jinêن yarsan bi piranî kelamên xwe bi zaravayê goranî gotine. Ji xeynî zaravayê goranî, Nêrgiz Xanîma Şehrezûrî kelamên xwe bi soranî gotine.

Kelamên jinêن xwedî kelam hem bi awayekî monolog hatine gotin ku hest û fîkrêن xwe gotine, hem jî wek diyalog hatine gotin ku wek bi yekî re diaxivin. Her wiha di nav van kelaman de yên pir dirêj jî hene, yên ku ji du beytan pêk tê jî hene. Mijara van kelaman bi piranî bawerî ye ku em dikarin tê de bûyerêن wek dûnâdûn, tecellî, hezkirina Xwedê bibînin. Wekî din em dikarin xweza, dîrok, hestêن derûnî û jiyanê jî bibînin di van kelaman de. Mixabin tunebûna berhemêن li ser jiyanâ jinêن yarsanî, nahêle em agahiyêن berfireh bidin. Em ê bi saya kelaman karibin li ser jiyan û baweriya jinêن yarsanî xwedî fikrekê bibin.

Du jinêن pîroz dê cih bigrin di vê beşê de ku her du jî bi awayekî bakîre bardar bûne û rastî gelek gotinê xirab hatine ji aliyê derdora xwe ve, ji ber ku li gorî baweriya însanan piştî Meryem tu kes nikare bi awayekî bakîre bardar bibe. Serpêhatiya wan a anîna zarokê xwe û jiyanâ wan dê ligel kelamên wan bêne pêşkêşkirin.

2.1. Celale Xatûn Loristanî (Mama Celale)

Li gorî kevneşopiya yarsanan Mama Celale di sedsala 11mîn a P.Z. de li Loristanê hatiye dinyayê û dûnê xwe li wir guhertiye. Mama Celale keça Mîrza Emanollah e û diya Şah Xoşîn e. Wexta ku Şah Xoşîn tîne dinyayê bi awayekî bakîre tîne. Gora Mama Celale ya sembolîk îro li nêzîkê bajarê Xoremabada Loristanê ye. Mama Celale wek jineke mezin a xwedî kelam tê zanîn.¹⁷

Li gorî baweriya yarsanan di serdema Şah Xoşîn de, Xwedê wek tecelliya nû dikeve bedena Celale û Celale Xatûn bi vê tecelliya nûranî, bardar dibe. Celale Xatûn ji aliyê bavê xwe ve tê sûcdarkîrin, lewre bavê wê wisa difikire ku keça wî zîna kiriye. Wexta ku eşîreta wan koç dike, wê li serê ciyê dihêlin û naxwazin tev xwe bibin.

16 van Bruinessen, Martin, *Kürtlîk, Türkîlik, Alevîlik - Etnik ve Dinsel Kimlik Mücadeleleri*, İletişim Yayınları, İstanbul, 2008, r. 177

17 Safîzadeh, S., *Daneşnameyê Namaveranê Yarsan, Ehval ve Asarê Meşahîr, Tarîx, Ketab ha ve Estelahaê Erfanî*, Enteşaratê Hîrmand, Tehran, 1376/1997, 63

Celale li ser wî çiyayî tenê dimîne û ditirse, ji ber vê jî dest bi girînê dike. Wê demê Kaka Reyayê ku yek ji ferîsteyên wê demê ye û li bennda zuhûrkirina Şah Xoşîn e, gîrîn û qêrîna Celale dibihîze, işareta Xwedê dibîne û diçe cem wê. Jê re behsa hatina xwe dike ku dibêje dengê wê ji dûr ve bihistiye. Her wiha behsa barê wê jî dike û wî barâ wek Xaliq bi nav dike. Dibêje barê wê ew qas mezin e ku çiyayê Gawê jî nikare hilgire:¹⁸

Kaka Reya meremû:
Çe mile Gawe serim bird ew diyar
Dîm gewre kenaçe mendin çê hawar
Çemiş yekî bî esrîniş hezar
Bariş Xaliq bî Gawiş nemîbird bar¹⁹

*(Kaka Reya dibêje:
Min serê xwe ji Gawê dirêj kir ber diyaran ve
Min keçek gewre dît ku dike hawar
Çavê wê bi hezaran hêstir tijî bû
Barê wê Xaliq bû ga jî nikarîbû hilgire)*

Piştî hatina Kaka Reya ji bo hawara Celale, Şah Xoşîn tê dinyayê lê belê Celale Xatûn hê jî ditirse, lewre dibêje ku dê zarokê wê hê jî wek xeyrî meşrû bê dîtin. Di vê kelama xwe ya bi diyalog de Celale Xatûn, Kaka Reya wek siwarê zana pênase dike û jê re behsa hatina hukmê Xwedê dike û dibêje ku xelqê Loristanê vî tiştî nizane, zarokê wê wek piç dibînin. Her wiha ev kelamên ku di navbera Celale Xatûn, Kaka Reda û Şah Xoşîn de derbas dabin, kelamên diyalog in, lewre her yek ji yekî din re tiştekî dibêje:

Celale meremû:
Ey Kaka Reya siwarê dana
Î hukme ama ci heft asîmana
Xelqî Loristan we zoliş mizana²⁰

*(Celale dibêje:
Ey Kake Reya siwarê zana
Ev hukm hat ji heft asîmanan*

18 *Defterî Perdiwerî, nusxeya xetî ya ‘Elîmîr Derwîşî*, rr. 3-4

19 *b.b.*, r. 13

20 *b.b.*

Wî wek pîç dizanin xelqê Loristan)

Wexta ku Celale Xatûn ji xelqê ditirse, Kaka Reya wek bersiv jê re dibêje ku divê zarokê xwe wek pîç nebîne, ew tecellî ye, tecelliyyê Xwedê ye:

Kaka Rêya meremû:
Siwaranîm siwaranê Serawend²¹
Delîranîm delîranê Xwedawend
Kur batinan çeneman negîran gezend
Celale bikr e Xoşîniş ferzend²²

(*Kaka Reya dibêje:*
Siwar in siwarê Serawend
Egîd in egîdê Xwedê
Yên ku batinê wan kor bin nikarin zerar bidin me
Celale bakîre ye Xoşîn zarokê wê ye)

2.2. Remzbar angó Xatûn Dayrak

Li gorî kevneşopiya yarsanan Xatûn Dayrak di sedsala 15mîn de jiyaye û li Helwanê hatiye dinyayê. Keça Huseyn Beg Celd e. Yek ji figurên herî mezin e ji bo yarsanan, lewre diya sembolîk a Sultan Sehak e û kurê xwe bi awayekî bakîre aniye dinyayê. Li gorî kevneşopiya yarsanan Remzbar yek ji ferîşteyên *Heften* e. Remz wateya sirrê dide, yanî navê Remzbar ji vir tê, yê ku sirr wek bar girtiye ser milên xwe. Li vir em dixwazin du aliyê Remzbarê nîşan bidin. 1) Remzbara wek diya Sultan Sehak, 2) Remzbara wek Ferîste.

2.2.1. Remzbara Wek Diya Sultan Sehak

Remzbar wek diya Sultan Sehak xwedî kesayetiyeke mezin e. Li gorî kevneşopiya yarsanan jidayîkbûna Sultan Sehak ji aliyê Baba Nawis ve tê işaretkirin. Piştî ku Baba Nawis xwe dikşîne xeybê, Pîr Binyamîn, Pîr Mûsî, Dawud û Mistefa Dawudan diçin herêma Hewramanê û li gundê Berzenciya Şehrezûr, li benda hatina Sultan dimînin. Li wî gundi, diçin li mala Şêx Îsî bi cih dibin û jê re dibêjin ku divê bi Dayraka keça Huseyn Beg Celd re bizewice. Şêx Îsî qebûl nake, lewre hem pir kal bûye hem jî gelek zarokên wî yên mezin hene. Dawiya dawî qebûl dike lê vê carê bavê Dayrak, Huseyn Beg,

21 "Serawend" li Kurdistanê navê cihekî ye.

22 *Defterî Perdiwerî, nusxeya xetî ya 'Elîmîr Derwîşî*, rr. 13-14

qebûl nake, lewre naxwaze keça wî bi kalekî re bizewice. Bi israran, dawiya dawî her du alî jî qebûl dikan û wan dizewicînin. Piştî demekê Dayrak bardar dibe. Eywet ducanîbûna Dayrak di kelameke xwe de diyar dike û şahiya xuyabûna Sultan bi xwezayê girê dide. Li gorî ku nîşan dike, wexta ku Sultan dikeve zikê Dayrak, dengê birûskê tê ji çiyayan û digihîje guhê ferîsteyan. Her wiha ferîste jî şabûna xwe tînin zimên û ji bo pêşwaziya Sultan ji çiyayan dadikevin:

Eywet meremû:
Sedayê re'd û berqî weharan ama ne kêwan
Ce betnê Dayrak peyabî Sultan
Quriştê hewrê weharan pîçan ne kêşan
Ya wa ve guşê Çwar Tene Yarî ne bûsan
Dawud vatis Mistefa derya muradiman
Melekan će ser meçerû we kêwan we rewan²³

(Eywet dibêje:
Dengê birûska biharê hat ji çiyayan
Sultan di hundirê Dayrak de peyda bû
Qûrînê eurê biharê pêça her derê
Gibaşt guhê Çar Tene Yarî
Dawud got Mistefa va ye miradê me
Melek ji çiyayan dadikevin xwarê)

Nasêñ Huseyn Beg ên ku li hemberî vê zewacê bûn ji Huseyn Beg re li ser Dayrak tiştên nexweş dibêjin, lewre li gorî wan ne mimkun e ku zarokek ji vî kalî çêbibe û li gorî wan ev zarok ji kesekî din e. Li ser vê Huseyn Beg ji keça xwe pir aciz dibe û tiştên nexweş jê re dibêje, heta wisa nîşan dike ku heqê wê û wan derwêşan kuştin e ji bo ku ji xelqê re bibin îbret. Her wiha sirra keça xwe jî tîne zimên û ji ber vê jî aciz dibe, lewre Remzbar her dem behsa sirrekê dike lê belê vê sirra xwe eşkere nake. Her wiha bavê wê dîsa jê bawer nake û li gorî wî wekî Meryem kesek din tuneye li vê cîhanê. Huseyn Beg van tiştan di kelama xwe de wiha tîne zimên:

Sezat kuştin e çenî derwîşan
Ta bewî be lawme pêy xelkî Sîrwan
Tu her remzê Yarî marî we zuwan

23 Hoseynî, S. M., Dîwana Gewre, Enteşaratê Bâghê Ney, Kermanşah, 1382/2003,
r. 10

Bicîge Meryem kesî weku to naman vê cihan²⁴

(*Heqê te kuştin e tevî wan derwêşan
Heta ku ji xelqê Sîrwan²⁵ re bibe ibret
Tu her dem sirra Yar tînî zimên
Ji xeynî Meryem kesek wekî te tuneye li vê cîhanê*)

Ji ber ku Dayrak dizane ev sirra Yar e, wexta ku bavê wê jê hêrs dibe, Dayrak her dem vê sîrrê tîne bîra wî lê belê sirra xwe tu caran eşkere nake. Ji ber wê jî bavê wê aciz dibe ku her dem dibêje ev sirrek e û ji ber vî tiştî qet şerm nake. Li gorî wê, divê xelq şerm bike ku li ser wê tiştêne xweş dibêjin. Wiha berdewam dike ku Xwedayê ku heft asîman xuliqandine ev sirr daye derwêşen xwe, ji ber vê jî ew derwêş bêguneh in:

Dayrak meremû:
Xelkan bikerdî dî heyâ u şerman
Herfî bêcayî mawerdî we zuwan
Min wîm sirrim, sir minin remzim nizanan
Şermêm nîya mirdantan biyan biwînan
Wu Xwuwaye xelqîş kirdin hewt asûman
Ça esrarî Heq we ladê derwêşan nîya gunaşan²⁶

(Dayrak dibêje:
Ey xelq bikin heyâ u şerm
We tiştek ecêb anî zimên
Ez bixwe sirr im, sir ez im kes nizane
Ez şerm nakim, bila mérén wê bê u bibîne
Vê Xwedayê ku vê heft asûmanê xuliqandiye
Heq sirra xwe daye derwêşan ew bê guneh im)

Her wiha ev sirr di serdema Sultan Sehak de di *Dîwana Gewre* de jî hatiye behskirin. Di kelama ewil a *Dîwana Gewre* de rewşa Remzbar hatiye nîşandan. Di kevneşopiya yarsanan de teyrekî spî hatiye ser pêşka Xatûn Dayrak û ew teyr nîşaneyâ hatina Sultan Sehak bûye. Di vê kelamê de ev bûyer hatiye nîşandan û her wiha wisa hatiye gotin ku Baba Rukneddîn an jî Pîr Mûsî ev sirr zanîbû:

24 h.b., r. 9

25 Sîrwan li Hewramanê navê robareke pîroz e.

26 Hoseynî, S. M., Dîwana Gewre, r. 9

Baq ew temaşa baq ew temaşa
 Xulaman bidê baq ew temaşa
 Şah we Şehbazan çé towit wist ra
 Xatûne Dayrak damanîş kîşa
 Yaran cenî hem şîn ew bûsanî
 Xatûne Dayrak çâ ka biyanî
 Şahbazê sifîd nîşt ew dawanî
 Baba Rukneddîn vê sirre zanî²⁷

*(Li bostanê temaşe kin
 Xulam li bostanê temaşe kin
 Şah Şehbazên xwe ji te re şand
 Xatûna Dayrak pêşka xwe kişand
 Yaran bi hev re biçin wê bostanê
 Niha werin ba Xatûna Dayrak
 Şahbazê Spî li ser wê pêşikê rûnişt
 Baba Rukneddîn dizanîbû vê sirrê)*

2.2.2. Remzbara wek Ferîste

Remzbar wek ferîste xwedî cihekî girîng e, weku me di serenava ferîsteyan de nîşan da ew jî di nav “Heften” de cih digire. Ji ber ku wekhevi heye di nav jin û mîrêñ yarsanan de, qedr û qîmet û pîroziya Remzbar jî wek ferîsteyêñ din e û kelamêñ wî jî pîroz in di civakê de. Remzbar di kelamêñ xwe de behsa Xwedê, ferîste, cem û rê û rîbazêñ yarsaniyê dike. Yanî mirov dikare di nav kelamêñ wê de bîr û baweriya yarsanan bibîne.

Li gorî kevneşöpiya yarsanan, Sultan Sehak wek Xwedê tê hesibandin û diya wî Remzbar jî wî wek Xwedayê li ser rûyê erdê dibîne. Remzbar di vê kelama xwe de hawara xwe digihîne Pîr Mûsî, ku zarokê di zikê wê de wek quşurek tê dîtin. Her wiha Remzbar avakirina dinyayê û demsalan a bi destê zarokê xwe, ango bi destê Sultan Sehak tîne zimêñ di vê kelama xwe de. Li gorî ku di kelama xwe de diyar dike, her ferîste sembola demsalekê ye, yanî her demsal ji cewherê ferîsteyekê pêk hatiye. Ji xeynî vê bi taybetî behsa Binyamîn, Dawud, Pîr Mûsî û Mistefa dike ku ev her çar ferîsteyêñ herî girîng in. Dibêje ew çar melek in lê belê cewherê wan hezar in û wisa diyar dike ku bihar ji Dawud, havîn ji Binyamîn, payîz ji Pîr Mûsî û zivis-tan jî ji Mistefa çêbûye. Her wiha weku diyar dike ax ji Binyamîn, ba ji nefesa Dawud, av ji Pîr Mûsî û agir ji Mistefa çêbûye:

27 h.b., r. 13

Remzbar meremû:
 Xulaman nî bar
 Mûsî xulaman quşûr biyen nî bar
 Ça ga emriş kird azîzê salar
 Çerîş Mistefa ni ew qehr û qehhar
 Sîneş bî we sac gêre kurêy nar
 Ta ke kureşan nekenû ne şar
 Ta ke mirdanim germîşan bi ew kar
 Çwar behriş sazena ni î maye çwar
 Umman û muhîte qulzûm û Xunxar
 Binyam û Dawud Mûsî û Qehhar
 Çwar in melek mayeşan hezar
 Ne yek ferzenenî fesliman her çwar
 Mayeş ne Dawud ser cuşen behar
 Tawişte Binyamîn badrîz Defterdar
 Mayeş Mistefa zimistanê Yar
 Kak ni Binyamîn bîyen mayedar
 Bad ne Yar Dawud nefes teyar
 Avin je mayê Mûsî Defterdar
 Ateş Mistefa mayeşen ve Yar
 Şerareyê aftav ne çerxê seyyar²⁸

*(Remzbar dibêje:
 Xulam li vê barê
 Ey Mûsî xelq li vê barê qisûrek dibîne
 Ezizê salar ferman da
 Mistefa bi qehr û qehhar geriya
 Sîneyê wî dibe wek kureyê nar
 Heta ku wê kureyê bibe şehr
 Bila ew bi karê xwe re mijûl bin
 Heta ku vê çar deryayê bi cewherê vê her çaran ava bikin
 Umman û Muhîte Qulzûm û Xunxar
 Binyam û Dawud û Mûsî û Qehhar
 Çar melek in lê cewherê wan hezar e
 Çar demsal bi destê yek zarokê min ava bûye
 Ev şahiya biharê ji mayaya Dawud e
 Havîn Binyamîn e payîz Defterdar
 Zivistan ji mayaya Mistefa ye
 Cewherê axê ji Binyamîn pêk hat*

28 Hoseynî, S. M., Dîwana Gewre, rr. 16-17

*Mayaya bayî nefesa pak a Dawud e
 Av ji mayaya Mûsî Defterdar e
 Agir ji mayaya Mistefa ye
 Çîrûska rojê ya çerxa ku dizivire)*

Remzbar di kelameke xwe de behsa hatina xwe dike, her wiha behsa Sultan Sehak jî dike ka dema çêbûye ci bêhnfirehiyek mezin pê re peyda bûye. Lewre weku me li jor behs kir, nasên wê li ser wê tiştên nexwêş gotine, lê bi hatina Sultan, her tişt kifş bûye. Li gorî wê li mala Şêx Îsî, Sultan alikariya wê kiriye lewre nasên wê jê bawer nedikirin û li gorî wan zarokê di zikê wê de ji kesekî din e. Ji ber vê, Remzbar li vir behsa vê dike ku wexta Sultan çêbûye alikariyek mezin pê kiriye, lewre her tişt êdî eşkere bûye. Her wiha behsa şabûna xwezayê jî dike bi hatina Sultan ku gul û kulîlk bi bêhna xwe ya xweş şabûna xwe nîşanî hatina Sultan dane. Remzbar behsa *dûnên* xwe jî dike di vê kelamê de ku dibêje hê di serdema keviran de hebûye û vî tiştê balkêş jî dibêje ku kevir ji wê ye û ew bixwe ji kevir jî pîrtir e. Di vê kelamê de behsa navê dê û bavê xwe, serdem bi serdem behsa guherînên xwe û bi wan guherînan jî behsa navê xwe dike:

Rezbar meremû:
 Amayim çé herîr amayim çé herîr
 Azîz vî remzit amayim çé herîr
 Dadam Zer Xatûn babûmin Emîr
 Pa yanû Îsî to man bî destgîr
 Ça gul û bostan kirdman ebîr
 Îna mîewanî guwayê ezel nûr
 Na hecer jiyam namim bî Mûşîr
 Hecer ne eze ez ne hecer pîr²⁹
 Namim Damiya bî na Deycûr twîr
 Ça Serendîlit³⁰ bî namim Zermîr
 Ez pakim kird xak kîşam ne qelbîr
 Xizmet û pakîn usa bî dilgîr
 Kirdîn xizmet we xakê zerd besîr

29 Di hin kelaman de wisa tê nîşandan ku kevir ji Remzbar çêbûye. bnr: *Hoseynî*, S. M., Dîwana Gewre, r. 309

30 Serendîl (Serendîb) li Hîndîstanê navê çiyayekî bû wan çaxan li gorî baweriya yarsanan. Her wiha li gorî yarsanan mirovê ewil ji axa wî çiyayî û li wî çiyayî hatiye afirandin.

Ça Serendîl da niyaman tekbîr
Hem bîm we ferzendê beşer beşîr³¹

(Rezbar dibêje:
Ez ji hevrîsimê hatim
Ezîz bi vê sîrrê ji hevrîsimê hatim
Diya min Zer Xatun bavê min Emîr e
Li mala Îsî te alîkariya min kir
Gul û bostan bêhnek xweş da
Nîha nûrê ezelî wekî mêvan hatiye
Di serdema keviran de navê min Mûşîr bû
Kevir ji min e ez ji kevir pîrtir im
Di dema Deycûr de navê min Damiya bû
Di serdema Serendîl de navê min Zermîr bû
Min ax paqij kir û seridand
Xizmet û paqijkirin ji dil hat
Me wisa kir ku dê axa zer piştre karibe bibîne
Piştre li ser Serendîl min tekbîr anî
Piştî ji bo hatina zarokê beşer min mîzgînî da)

Di berdewama kelama jor de Remzbar behsa xwe dike ka çawa *dûnê* xwe guheriye. Ji Sultan re dibêje ka çawa di serdema Hz. Elî de, Fatima bint Esed bû, di Kerbelayê de çawa bû, piştre di serdema Şah Xoşîn de, li Loristanê çawa wek Mama Celale zuhûr kiriye û di vê serdemê de li mala Şêx Îsî çawa bûye Dayrak Remzbar. Pîr Malikê Goran (sedsala 14-15mîn) jî di kelameke xwe de behsa Remzbar dike û dibêje ku di serdema Elî û Muhammed de, Remzbar wek Fatima hatibû dinyayê, her wiha behsa ferîsteyên din ên wek Binyamîn, Dawud û Pîr Mûsî jî dike ka berê bi ci navan li dinyayê xuya bûne:

Seravê du dere seravê du dere
Bargeyê Şam vestin seravê du dere
Selman Binyam e Dawud Qember e
Pîr Mûsî wezîr Kake Cabir e
Seyîd Mistefa tîriş xeter e
Fatime Remzbar sirriş perwere³²

31 Hoseynî, S. M., Dîwana Gewre, rr. 306-307

32 Safizadeh, S., Daneşnameyê Namaveranê Yarsan, rr. 145-146

*(Di nav ava du çeman de
 Koşka Şahê min niştecih bû di nav ava du çeman de
 Selman Binyamîn bû Dawud Qember bû
 Pîr Mûsî Kake Cabir bû
 Tîrê Seyîd Mistefa xeter bû
 Fatime Remzbar bû, wê sirr mezin kir)*

Di vê kelama xwe de Remzbar behsa girîngiya Yar, kirasguher-tinê û çar ferîsteyên sereke dike. Ji Yaran re dibêje “xwediyê hûş” ango “hişyarbûn” û ji wan re behsa girîngiya *dûnadûnê* dike, yanî dibêje lixwekirina cilên nû bingeha «yarbûn»ê ye. Her wiha diyar dike ku her çar koşeyê alemê, ji çar melekên sereke pêk hatiye û şertê yaran jî bi piyên wan melekan ve hatiye girêdan. Weku diyar dike, dinya li ser van her çar melekan hatiye avakirin û ev her çar, pêşeng in. Yênu ku di rêya Heq de êşê dikşînin ev her çar melek dibil wek dermanekî ji bo wan. Her wiha vê jî diyar dike ka çi qas êşê bikşînin jî, çi qas xwe ji bo Xwedê têxin înzîwayê jî, cihê ku herî dawî karibin biçin, cihê wan her çar melekan e:

Remzbar meremû:
 Hûş Yaran hûş
 Mirdane ezel hûş Yaran hûş
 Me'rîfet muhrin çe perdeyî sirpus
 Binayê Yarin cameyê nû we nû iş
 Çahar qurneyê cîhan mewû we çahar cese
 Şerti win we payê çahar cese bese
 Çahar ten çahar lenger hem cîhangîr e
 Hem serqitar e hem ew Yar Pîr e
 Hem xatircem'î riyazetkişan e
 Ye ser menzilgah ye hedgaşan e³³

*(Remzbar dibêje:
 Hûş Yaran hûş
 Ey yên ku ji ezel hatine hûş Yaran hûş
 Me'rîfet li pişt perdeya sîrrê hatiye mohrkirin
 Lixwekirina cilên nû bingeha Yar e
 Çar koşeyên cîhanê ji wan her çar ferîsteyan e
 Şertê we bi piyên wan her çaran hatiye girêdan
 Çar ten bi çar hesinan dinyayê girtine*

33 *Serencam Beyanul Heq*, nusxeyê Qadir Tehmasibî, r. 45

*Hem pêşeng in hem jî Yar Pîr in
 Dilê wan bi riyazetkişandinê rihet e
 Menzilgeha herî dawî cihê wan her çaran e)*

Cem ji bo yarsanan pêkanîna baweriyê ye. Cemxane jî ew cih e ku lê dicivin. Remzbar di vê kelama xwe de behsa *Cemê* dike, weku dibêje wext û saet wadeyê kerem e û li *Cemê*, wext wextê qebûlkirina Çilane ye. Weku dibêje wê rojê kî ji dîn dûr bikeve ew ê şermezar bibe û dê xelata wî jî kêm be. Yênu ku şertên yarsaniyê bi cih tînin *kîrdar* dikin û dûre roja din xelata xwe jî distînin:

Remzbar meremû:
 Yaran kerem e
 Ça wext û saet wadeyê kerem e
 Guwahî erkanê Çilan e we Cem e
 Pîr we Padişam perwane we şem e
 Her Yarî ew roj çe dîn wareme
 Ferda şermesâr xelatiş xem e
 Yarê şert şûn kîrdar³⁴ mikalûn
 Xirmeniş westin ferda memalûn³⁵

*(Remzbar dibêje:
 Yaran kerem e
 Wext û saetê wadeyê kerem e
 Li Cem wextê qebûlkirina erkanê Çilan e
 Pîr perwane ye Padişah mûm e
 Yarê ku wê rojê ji dîn dûr bikeve
 Sibê şermezar e xelata wî kêm e
 Yarê ku şertê kîrdariyê diçînin
 Sibê xelata xwe distîne ji wê çandiniyê)*

Remzbar di vê kelama xwe de behsa yarsanan dike ku li gorî wê gelê yarsan ji axê hatiye pakkirin, ango seridandin. Behsa jiyana nû jî dike û dibêje cihê ku dê yarsan biçin cihekî xweş e. Yanî axireta baqî wek mala wan dibîne. Her wiha li ser rêya Heq jî disekine ku ev rê rêya rastiyê ye:

³⁴ “kîrdar” di hemû karan de nayê bikaranîn. Peyveke teknîk e. Li cem yarsanan ji bo pêkanîna şertan, şerjêkirina qurbanan, pêkanînana çar rastiyân de, hwd. tê bikaranîn.

³⁵ Serencam Beyanul Heq, rr. 52-53

Remzbar meremû:
Vala vêtane³⁶

Guruyê Yar ve xak vala vêtane
Eşqê Heq ce ser şêt vêtane
Çe menzilgatan kam ca cêtane
Rayê Heq rasiyen rasî rêtane
Ye qebzê iqrar şertê Şatan e
Baqî axîret menzilgatane
Ye damî bela ye belatan e
Şadî pay sitûn kuyê telatan e³⁷

*(Remzbar dibêje:
Hatiye seridandin
Koma yar ji axê hatiye seridandin
Eşqa Heq di serê dînan de ye
Tiştên xweş li menzilan e
Rêya Heq rastî ye rastî rêya we ye
Meqbûza we iqrarê şertê Padişaha we ye
Axîreta baqî menzila we ye
Ev dapika belayî belayê we ye
Rizgariya we li bin sitûna çiyayê zêrîn e)*

Di dema Sultan Sehak de, ji bo civaka ku îro em wek yarsan dizanîn, sîstemeke civakî hatiye avakirin ji aliyê Sultan ve û ev sîstem îro jî berdewam dike. Li gorî vê sîstemê, kesên ku yarsan in yan jî dûre dîbin yarsan, divê bibin xwediye delîl û pîrekî. Ev delîl û pîr dikare ji emrên cihê bê hilbijartın. Ji bo pêkanîna vê rîbazê, Sultan Sehak bixwe jî ji bo xwe hem delîl hem jî pîrekî hildibijêre. Bi hilbijartina wî, Pîr Binyamîn dibe pîrê Sultan. Ji ber vê Remzbar jî Pîr Binyamîn wek pêşengekî dibîne, li gorî wê, Pîr Binyamîn ji erd heta behran, pêşengê her tiştî ye heta Şah bixwe jî serê xwe teslîmî Pîr Binyamîn dike. Remzbar dîsa behsa şert û iqrarê dike û dibêje ku Pîr Binyamîn ev şert û iqrara yarsanan bi cih ankiye:

Remzbar meremû:
Ha Pîr Binyamîn î tu serqitar î
Pîrê serqitar çê ber ta bar î
Wekîl Wesî îxtiyardar î

36 “Vala vêtane” gotineke yarsanan e, wateya wê pakbûn, seridandin e.

37 Serencam Beyanul Heq, r. 30

We îqrarî Şah viş ser pêyet siperden
We îqrar heddit we hedgah bardin
Her çi biwaçî reda û rasiyen
Binayiyê dîdeyê Heqşinasiyen³⁸

(*Remzbar dibêje:*
Ha Pîr Binyamîn tu pêşengê kerwanê yi
Pîrê pêşeng i ji erd heta behran
Wekilê her tiştî yi
Şah bixwe jî serê xwe teslîmî te kir
Te îqrar bi cih anî
Her çi bêjî alîkarî û rastî ye
Heqşinasê dîtinê yi)

Li gorî yarsanan, Remzbar ji her kesî re şefaat dike. Pîr Mûsî diçe ba gunehkaran û Deftera xwe vedike. Remzbar li wir ji bo ku şefaat bike bangî Şah dike û jê rica dike ku perdeyê negre:

Remzbar meremû:
Defter kirdewe
Pîr Mûsî Wezîr Defter kirdewe
Şî ew serkanî rûy we derdewe
Ya Şah murwetin mekerit perdewe³⁹

(*Remzbar dibêje:*
Defter vekir
Pîr Mûsî Wezîr Defter vekir
Çû li ba kesên ku rûyê wan bi êş e
Ya Şah murwet ke negre perdeyê)

Remzbar di gelek kelamên xwe de behsa Sultan Sehak dike û wî wek Xwedê nîşan dike. Remzbar, Sultan wek hêzekê dibîne, ji ber vê jî her çi ferman bike bê guman û bê pirsgirêk qebûl dike. Wisa diyar dike ku her dem hişê wê bi Sultan û bi kirinêñ wî mijûl e û riya ku Sultan nîşan dide, qebûl dike û di wê riyê de diçe. Her wiha di kelamê de behsa *Heften* û *Heftewan* jî tê kirin û Remzbar wisa diyar dike ku *Heftewan* ji nûra Şahbaz hatiye afirandin, ango ji nûra Sultan:

38 *Serencam Beyanul Heq*, rr. 60-61

39 *Serencam Beyanul Heq*, r. 97

Remzbar meremû:

Bî ew quweyê dil bî ew quweyê dil
 Azîz emrê to bî ew quweyê dil
 Her çi fermanin qebûl im qebûl
 Ve ême ferzin î rage û usûl
 Ew yadim meyû weşyanim şî'ûr
 Medî guwahî ez ve bê kudûr
 Çe lewhe yaqut ateşe qatil
 Zuhûr day çe nûr dîwanê kamil
 Heftewan çe nûre Şahbaze adil
 Pey şertê mirdan to kirdî hasil
 Perî destgîrî Yaranê fazil
 Ew hem meylit kird azîzê adil
 Ew hem meylit kird azîz we muhebbet
 Hem ew Heft pûre destgîrim pê şert
 Çe Perdîwer da niyanit sohbet
 Awerdî Binyam pey destgîrî şert
 Heftewan her heft to dadî xelat
 Heftad sefî Yar vît kirdî xulqet
 Ser dan çe rahê to Heftad sefî Yar
 Sela çe vîtin Padişahê ber û bar
 Neh sed neh sedê Pîran bî gerd⁴⁰
 Çû gahê rejiyan gerd pey iqrarê şert
 Gerdîn xulaman bîwen bîwenan
 Rû malan çe şertê sikkeyê Heftewan
 Her çi royê ezel ta aman vî gah
 Zatê heft mezher negînin çî gah
 Her çi ew dema ta axirzeman
 Destgîr Heftewan bigirdîş daman⁴¹

(Remzbar dibêje:

*Bi quweta dil bi quweta dil
 Ezîz emrê te bi quweta dil
 Her çi ferman dikî qebûl im qebûl
 Ev rê û usûl ferz e ji bo me
 Hate bîra min û şuûra min çû
 Bê guman ez vê qebûl dikim*

40 Li gorî yarsanan di dema Şah Xoşîn de, ji 900 mûrîdan 900 mûrîdên Şah Xoşîn hebûn.

41 Hoseynî, S. M., Dîwana Gewre, rr. 452-453

*Ji lewhaya yaqût atêş e qatil
 Dîwanê kamil ji nûr zuhûr da
 Heftewan ji nûrê Şahbazê adil e
 Ji bo şertê gel te kir hasil
 Ji bo alîkariya Yaranê fazil
 Te meyl kir ezîzê adil
 Te meyl kir û bi muhebbet kir
 Ew Heft kur ji bo alîkariya wê şertê Yarî çêbû
 Li Perdiwer sobbet dikirin
 Binyam ji bo alîkariya şert anî
 Hebûna her Heftewan diyariya te ye
 Te afirand Heftê safê Yar
 Heftê safêن Yar serê xwe dan di rêya te de
 Sela ji te ye ey Padışahê ax û avê
 Neh sed neh sedê Pîran kom bû
 Li ser hev rijiyan ji bo şertê iqrar
 Bêdawî bêdawî kom bûn
 Ji bo teyîdkirina Heftewan kom bûn
 Ji roja ezel tiştên ku heta îro hatine
 Xemla her tiştê Zatê heft mezher e
 Ji niha heta axirzemanê
 Heftewan alîkar in bigrin pêşka wan)*

Wek Vali diyar dike di Şahnameya Fîrdewsî û Kurdi⁴² de peywen-diya Sîmûrg û Zal hatiye nîşandan. Wexta ku Zal çêbûye bavê wî Sam ew nexwestiye. Bi daxwaza bavê wî, zilamên wî ew birine ber çiyayê Elburzê, ku ji însanan pir dûr e û pir tav lê dide. Hêlîna Sîmûrg li ser vî çiyayî ye. Wexta ku çêlikên Sîmûrg birçî dibin û Sîmûrg xwe ji çiya berdide jêr zarokekî nûçêbûyî dibîne ku ji bir-çiyan digirî. Xwedê wê demê rehmê dixe dilê Sîmûrg ku wî zarokî bibe xwedî bike. Sîmûrg radihêje wî zarokî dibe hêlîna xwe. Piştî demekê wexta ku zarok êdî mezin dibe bavê wî Sam biryar dide ku biçe kurê xwe bîne. Sîmûrg ji jor dibîne ku Sam û zilamên wî têن, fam dike ku ew ê kurê xwe bibe. Sîmûrg axaftinê hînî Zal dike, levre Zal qet naşibe însanan û nizane biaxive. Wexta ku Sîmûrg wî berdide, jê re dibêje ku ew bi çêlikên xwe re mezin kiriye, rehm, evîn û hezkirin xistiye dilê wî û divê van tiştan ji bîr neke. Her wiha jê re

⁴² Shahab, Vali, “Nêrîneke giştî ya li ser Şahnameya Fîrdewsî û Şahnameya Kurdi”, di *Edebiyata Kurdi ya Gelêrî, Dîrok- Teorî- Rêbaz- Lîteratur- Berawirdî-1* de, amd. Ramazan Pertev, Avesta, İstanbul, 2015, rr. 275-296

dibêje ku textek mezin dê bibe wek hêlînekê jê re û taceke zêrîn dê bibe wek baskên wî.⁴³

Sîmûrg di kevneşopiya yarsanan de xwedî cihekî girîng e. Li gorî baweriya wan Sîmûrg di bedena Remzbar de enkarne bûye û Remzbar jî di vê kelama xwe de vî tiştî diyar dike û xwe wek Sîmûrg nîşan dide. Çawa ku Sîmûrg alîkariya Zal kiriye ew jî xwe wek alîkara Rustem nîşan dide:

Remzbar meremû:

Ew sayê şemî ew sayê şemî
Bargeyê Şam westin ew sayê şemî
Çenî Sê Tene biyam derhemî
Sîmurg beyanî ce rayê Rustemê⁴⁴

(Remzbar dibêje:

*Li bin siya mûmê li bin siya mûmê
Koşkê Şah niştecih bû li bin siya mûmê
Ligel Sê Beden (Sê Ten) tevlihev bûm
Wek Sîmurg ji bo Rustem)*

Encam

Jinê yarsan ji ber bîr û baweriyêن xwe yên cuda, yên ji jinê ne-teweyêن nêzîk, xwedî jiyanekê azaddir in. Cudahiya zayendê tuneye di navbera jin û mîran de, ji ber vê jî ew hem dikarin kelaman bêjin, hem jî dikarin li tenbûrê bidin û kelamên wan jî bi qasî yên mîran bi qîmet û pîroz in.

Ji ber ku li ser jinê yarsan ji aliyê rola wan a civakî ve zêde xebat nehatine kirin, em dikarin jiyana wan di kelamên wan de bibînin û ev kelam jî bi piranî li ser bîr û baweriya wan in.

Di vê xebatê de du jinê girîng ên yarsan ligel kelamên wan hatîne lêkolînkirin: Mama Celale û Remzbar. Ji ber ku her du jî bi awayekî bakîre bardar bûne û dayîkêñ sembolîk ên xwedayêñ serdema xwe ne, balkêş in û hêjayî lêkolînê ne. Jinê bardar ên bi awayekî bakîre di nav civakê de nayêñ qebûlkirin, heta ku sirra van her du jinan hatîye zanîn zehmetiya ku kişandine ligel kelamên wan hatîye vekolan.

43 Vali, *Les Yârsâns, Aspect Mythologiques-Aspects Doctrinaux*, rr. 393-394

44 Safizadeh, S., *Daneşnameyê Namaveranê Yarsan*, r. 123

Çavkanî

- van Bruinessen, Martin, *Kürtlük, Türklük, Alevilik - Etnik ve Dinsel Kimlik Müca-deleleri*, İletişim Yayıncıları, İstanbul, 2008
- Defterî Perdîwerî, nusxeya xetî ya ‘Elîmîr Derwîşî*
- During, Jean, “Notes Sur L’Angéologie Ahl-e Haqq”, dans *Syncrétismes et Hérésies Dans l’Orient Seldjoukide et Ottoman (XIVe-XVIIIe Siecles)*, Actes du Colloque du College de France, octobre 2001, Sous la direction de Gilles Veinstein, Peeters, 2005
- Hamzeh’ee, M. Reza, *Yaresan (Ehl-i Hak)*, çev. Ergin Öpengin, Avesta Yay., İstanbul, 2008
- Hoseynî, S. M., Dîwana Gewre, Enteşaratê Bâghê Ney, Kermanşah, 1382/2003
- Minorsky, Vladimir, “The Sect of the Ahl-i Hakk”, in *Iranica, Twenty Articles*, Publication of the University of Tehran, vol. 775, 1964
- Mir-Hosseini, Ziba, “Inner Truth Outer History: The Two Worlds of the Ahl-i Haqq of Kurdistan”, in *International Journal of Middle East Studies*, Vol. 26, no. 2, (May, 1994), Cambridge University Press, 2014
- Mir-Hosseini, Ziba, “Redefining the Truth: Ahl-i Haqq and the Islamic Republic of Iran”, in *British Journal of Middle Eastern Studies*, Vol. 21, no., 2 (1994), published by: Taylor&Francis, Ltd., 2014
- Safîzadeh, S., *Daneşnameyê Namaveranê Yarsan, Ehval ve Asarê Meşahîr, Tarîx, Ketab ha ve Estelahaê Erfanî*, Enteşaratê Hîrmand, Tehran, 1376/1997
- Serencam Beyanul Heq, nusxeyê Qadir Tehmasibî
- Sinanoğlu, Mustafa, “Tecellî”, İslam Ansiklopedisi, cilt. 40, 2011
- Vali, Shahab, *Les Yârsâns, Aspects Mythologiques- Aspects Doctrinaux*, Editions universitaires européens, Saarbrücken, 2011
- Vali, Shahab, “Nêrîneke giştî ya li scr Şahnameya Fîrdewsî û Şahnameya Kurdfî”, di *Edebiyata Kurdî ya Gelêrî, Dîrok- Teorî- Rêbaz- Lîteratur- Berawirdî-1* de, amd. Ramazan Pertev, Avesta, İstanbul, 2015
- Xan Elmas, *Dîwân*, nusxeya çapnebûyî ya Seyîd Xelîl ‘Alinejad

AKADEMIYA ÎSMAİL BEŞİKÇİ

2019 PAYİZ

